

# *BERHEM*

**Dr.Ebdilmecît Şêxo**

**Dîyarî**

**Ji giyanê nemir....**

**Rêzanzanê mezin....**

**Reşîte Hemo re.**

**Berg: Hunermend Aslan Memo**

**Çapa yekê 2015 .**

**Efrîn.**

## **28 çepkegul li ser gorna nemir**

### **M.M.Berzanî bin**

Di sereta de ez jî mîna her Kurdekî bi boneya bîranîna 28 saliya şehîdbûna serokê nemir M.Mistefa Berznî serê xwe li ber gorna wî bi xemgînî, bi serbilindî û bi şehnazî ditewînim.

Weke diyar e, di dîrokê de gelek miletên cîhanê nasnamên xwe yên netewî bi kesayetî û qehremanên xwe yên navdar tînan nasîn, herweha jî gelê me jî di sedsala bîstan de li seranserî cîhanê bi navê serokê nemir, têkoşerê gewre M.M.Berzanî hatiye naskirin.

Serok Berzanî dîrok e, serok Berzanî şoreş e, serok Berzanî raman e, helbest e, çêrok e, serok Berzanî çemek mezin di nav pirêzeyên hestên niştimanî yên gelê Kurdistan de ye, serok Berzanî zimanê gelê Kurd û hemû netewên din li Kurdistanê û kawayê sedsala bîstan e.

Lewra jî nivîsîn û axivtin li ser vî lehengî nemir di kurtebîranîne de gelek dijwar e, lê ez dixwazim di vî bîranîna pîroz de çend gotinên Prof.Qenatê Kurd û xanima wî dermafê nemir Berzanî de hûnim zimên.

Gava ez li LÊNÎNGRADA berê di salên 1978-1988 an de xwendekar bûm, nemir Q. Kurdo ji min re got: Gava ez li LÊNÎNGRADÊ xwendekar bûm, mamostên min ji min dipirsîn, tu çi mîlet î ?, min digote wan, ez Kurd im, ewan li min vedigerandin û digotine min, yanê tu Berzanî yî. Yekser ji şabûnên mezin re, stêr bi çavên min diketin, dilê min di sîngê min de mîna çûkan sema dikir, min digote xanima xwe ya Rus Nadêjda, binêre! Binêre! Çawa mîletê me bi navê vî şêrî hatiya bihîstin! Çawa vî dilêrî navê me, navê gelê Kurd xistiye dîrokê, vêca çawa ezê xwe niha serbilind nebînim !!

Dîsan Q.Kurd gote min: Gava nemir Berzanî hate Mosko, ez û xanima xwe çûn cem wî, em bûne mîvanên wî, me gelek axftin kir, ewî rewşa hevalên xwe û ya xwe li Sovyetistanê ji me re digot, me li çavên wî temeşe dikir, me wêneya Kurdistanê, çem û şaxên Kurdistanê tê de didîtin, me hîn di wê hîngê de bawer dikir, eger serokekî me, qehremanekî me weha mezin hebe, divê em qet ne xemxwar bin, dê gelê me rojekê azad be. Dîsan nemir Qenatê Kurd gote min: Min dixwast hinekî henekan bikim û min yekser ji cênêralê mezin pirsî, tu zanî goraniyan bêjî? Ew kenîya, û gote min: Na ! Min dîsan ji wî pirsî li tu zanî semayê bikî? Dîsan nemir Berzanî nermik kenîya, û gote min: Na! Lê min bi wî re got: Dêmek tu ne Kurd î. Dîsan Berzanî bi giyanêke zor sivik kenîya û heneka min bi xûn sivikî pejrand, Qenat hîn digot: Min hemû riweştên rêbertiyê û mezinahiyê di serok Berzanî de dîtin. û hêviyên min bi rizgariya gelê Kurd gelek xurt bûn.

Dîroka me ya nûjen diçespîne, ku serokê nemir bi lehengî û bi pîdarî li hember dijminên xwe têkoşîn dikir û

ramanên wî ne tenê li Kurdistana Îraqê nirxbuha bûn, lê ronahiya rêbaza wî ya netewî li seranserê Kurdistanê ta niha cihê rêzdarîyê ye. Lewra jî ew dibe sîmbola tevgera azadîxwaza her çar beşên Kurdistanê .

Bi vê boneya mêjoyî,ez silavên welatparêzî ji pêşmerge serok, rêzdar Mesud Berzanî, û ji hemû Kurdistaniyên dilsoz re dişînim û dibêjim hemûyan, hûn hemû dilşad û serfiraz bin û bi rizgariya Kurdistanê bextewar bin.

Almaniya 2006. Malperên Pena Kurd û Pena Kurd.

**Armanca Turkiya niha ne PKK ye,  
lê rûxandina hukumeta  
herêma KURDISTANÊ YE**

Cîhana serdem bi hemû aliyên xwe ve pêşda diçe, gelek awa û alvên kevneşopî di jîna me de hatine gornekirin, yan eger ez bi zimanê zanistî bêjim: Ewanan niha di rûpelên dîrokê de cihên xwe istandine. Zimanê siyasetê jî mîna hemû rudawên din hatiye guhertin, gelek dengên dêmokrat û rizgarîxwez bi aştiyane li dijî rêcîmên dîktetur û dewletên ne dêmokrat bilind dibin. Ango cîhana me nûjentir dibe, lê xûya ye dewletek mîna Turkiyê hîn li dervayî hev kêşîya yasayên pêşketina civaka cîhanê de gavên xwe yê siyasî li hundir Turkiyê, li Kurdistanê Turkiyê, li dervayî Turkiye, bê pîvanên hişmendî û bê rêzgirtin ji sinciya siyasî re davêje.

Turkiyê beşek mezin ji welatê me dagîr kiriye ewê gelek raperîn û şoreşên Kurdî bi hovane aşbetal kirine û rûya xwe ya siyasî di dîrokê de pir reş kiriye. Di sala 1973 an de dîsan Toranperestên Turkiyê bi mebesta parastina hemwelatîyên Turk li girava Qubirsê, beşek ji wê giravê dagîr kir û ji xwe re dewletek li wir ava kiriye û ewê carek din rûya xwe di mêjoya Rojhilata Navîn de û li qada cîhanê hîn reştir kiriye.

Mîna min li jor gotiye: Di bin sîbera niweya siyasî ya nû li cîhanê gelên Îraqê û Kurdistanê rêcîma Bexdadê di Nîsana, 2004 an de bi alîkariya hêzên hevpeyman

hilweşandin. Dagîrkerên Kurdistanê û dijminên demokratîyê bi vê bayê nû re serxweş bûn, ewanan ji wê rojê de û ta roja îro pir bi awayên ne mirovane û têrorane dixwazin dîwarên gelek bilind li pêş pêşveçûna Îraqê û Kurdistanê dînin. Turkiyê herdem bi zelalî li dijî Kurdistanê û demokratîkirina Îraqê, mîna segek har xwe dide xûya kirin. Di vê mehê de dîsan dewleta Turkiyê gefgurên mezin li dijî hukumeta herêma Kurdistanê ragîhandin, û ewa dibêje: Emê girîleyên PKK ji holê rakin û emê hemwelatîyên xwe Turkmanan li Kerkukê ji zordariyê biparêzin ...

Lê mebesta rastîn ya dewleta Turkiyê têkbirina hukumeta Kurdistanê û dagîrkirina dilê Kurdistanê (Kerkokê) ye. Hukumeta Turkiyê ji pêkanîna biryara 140 î ji destura Îraqê derbarê kêşeya Kerkukê pir ditirse; ewa baş dizane ku eger ev biryara 140 î pêk were, yanê di warê siyasî de jî Kerkuk dikeve çarçewa Kurdistana Îraqê û di pişt re hukumeta Kurdistana Îraqê dê ji Turkiyê û ji pir welatên Rojhilata Navîn dewlemendtir û hêztir bibe. Turkiyê vê rastiya pîroz jî dizane ku hukumeta herêma Kurdistanê dê di pêşerojê de piştvaniya gelê xwe li beşên din jî bike û ji bo wan beşan jî têkoşanên xwe ji bo zadiyê gelê Kurd li her sê beşên mayîn jî berdewam bike.

Lewra jî ne Turkiyê, ne Îranê û ne Sûriyê dixwazin dewletek Kurdî xurt li Îraqê were damezrandin.

Cîhana siyasî rind dizane ku çiqas serokê nemir M.M. Berzanî rêz li dewlet û gelên cîran dikir û ewî herdem ji bo çareserkirina astengan li hindir Îraqê û li dervayî Îraqê bi şeweyên aştîyane amede bû. Serokê herêma Kurdistanê, pêşmerge serok, rêzdar Mesud

Berzanî jî bi hişmendiyeke bilind û pir bi mêrane bersiva dewletaTürkiyê daye, ewî bi bersiva xwe, vîna gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê derbiriye. Gelê Kurd li welatê Kurdistanê tucarî hêrişî gelên din yan dewletên din ne kiriye, ewî herdem berevaniya xwe kiriye, herdem bi qehermanî li dijî hêrişên dagîrkeran rawestiye û ew hîn jî di bin siya pêşengên Kurdistanê û bi rêbertiya serok Mesud Berzanî amede ye ku li dijî hemû gefgur û hêrişên nijadperestan raweste. Di vê derbarê de "Baregeha navbendî ya hêzên berevaniya gelî û Kurdistanî" di 13.04.2007 an de helwesta xwe ya netewî bi berpirsiyerke bilind daye xûyakirin û gotiye: "Em rêdanê nadin ku gelê me li Kurdistana Îraqê û hemû desketinên netewî ziyane bibînin û emê bi hemî hêzên xwe wan ji hêrişên leşgerên Turkan biparêzin."

Lê piştî rûxandina rêcîma dîktetur li Îraqê û damezrandina dewleta fêderal li Kurdistanê û Îraqê heyama siyasî bi rengekî din e, li gor yasa û desturên dewletên fêderal; herdu herêmên fêderal neçar in bervaniyên hevûdu li dijî hêrişên derve bikin. Ango berevaniya Kerkukê niha ne tenê ji erkên gelê Kurd de, lê gelê Ereb jî divê li gor desturê û li gor berjewndiyên xwe yê samanî berevaniya Kerkuka Kurdistanî û ya Îraqî bike. Lewra jî em dibînin ku çawa serokê perlemanê Îraqê birêz Mehmud Meşhedanî bi vê wateyê ji raya giştî re dibêje: "Emê li helwestên serok M. Berzanî xudî derkevin û ewî hîn jî gotiye: Ew destên ku xwe dirêjî karên navxweyî yê Îraqê bikin, dê ew destenan bên jêkirin." Û herweha jî serokê Encumena Wezîrên Îraqê rêzdar Norî El malikî jî ragîhand, "Em xwe tevî karên cîranan nakin û bila cîran jî xwe tevî karên me nekin."

Ez pir texmîn dikim ku Turkiyê di gefgurên xwe de derewan dike, erê ewa hêzên leşgerî ber bi sînora Kurdistanê ve dilivîne, lê ewa dixwaze bi van tektîkên xwe tirsê têxe dilên Kurdan, hukumeta Îraqê û hukumeta Kurdistanê, û helwestên hukumeta Îraqê li hember biryara 140 î sist bike. Ez hîn nikanim bawer bikim ku Turkiyê nizane, ewa dê di şerê xwe de li dijî Kurdan û Îraqê bisernakeve, ji bilî vê rastiye jî, faktoreke din giring heye, ewa jî ev e; Koma Netewên Yekgirtî, Yekitiya Ewropî, hêzên hevpeyman yên navnetewî, hemû rêxstinên mafên mirovan li cîhanê li dijî destdirêjên Turkiyê ne, û rûya Turkiyê ya berê reş, dê hîn di nav qada navnetewî de tarîtir bibe û dê Turkiyê gelek berjewendiyên xwe yên din winda bike.

Di her hal de divê dewleta Turkiyê yasayên pêşketina civakan baş têbigêhe û xwe ji nexweşiyên zordestiyê û hêrişên berberyane rizgar bike û bila ewa xwe bi pêşvebirina doza dêmokratiyê li Turkiyê û li Kurdistanê Turkiye xerîk bike, asteya aboriya xwe bilind bike û civaka xwe ji belengaziyê rizgar bike. Li aliyê din; divê hêzên Turk yên dêmokrat û aştxwez, kesayetiyên ronakbîr û dêmokratîxwaz jî li dijî destlata xwe ya ne dêmokrat û şerxwez rawestin û divê ewanan mîna pir hêz û partiyên Ereben Îraqê destên xwe bidin hêzên Kurdistanê û bi hemû alav û awayên aştiyane, dêmokratiyê ji Turkiyê û azadiya netewî ji Kurdistanê re pêkbînin, eva tenê rêyên pêşketina Turkiyê û Kurdistanê ye.

Maye ez di vê çarçûvê hîn bêjim: Bersiva gelê Kurd ya herî xurtir ew e, ku hêzên gelê Kurdistanê, hemû' saziyên ronakbîrî, kesayetiyên serbixwe bi yekdem gefgurên Turanîstên gewr şermezar bikin û bi yekdem

piştvaniya helwesta serokê Kurdistanê, têkoşerê mezin,  
berêz Mesud Berzanî bikin, çimkî rêzdar Mesud Berzanî  
dengê 40 milyon Kurd e, dengê rizgarbûna Kurdistanê  
ye.

Tutlingên, 15.04.2007 Malpera welatî.net û pena Kurd .

.....

## **Bi giştî siyaseta Turkiyê ya derve**

### **Kurtelêkolîn**

Piştî cenga cîhanê ya yekê (1914-1918) Mistefa Kemal Atatürk komara Turkiyê di sala 1923 an de damezrand, ewî berxwedaye ku Turkiyê ji nasname, şarastaniya îslamî bidûrxîne û siyaseta Turkiyê ji welatên Ewropî ve nîzîk bike. M.K. Atatürk xwest rêbaz û dêmokratiya welatên Ewropî bişopîne, lewra jî ewî karmendiya Şêxê Îslamê, dadgehên olî li Turkiyê ji holê rakirin. Di sala 1928 an de ewî tîpên Erebi li şûna tîpên latînî di zimanê Turkî de bi karanîn, dîsan ewî fermana wergerandina pirtûka Quranê ji zimanê Erebi li ser zimanê Turkî derxist. Herweha jî M.K. Atatürk kumên Osmanî û Çerkesan bi kumên Ewropiyan guherîn.

Turkiyê dewletek ji dewletên pêşîn bû, ku avakirina dewlata Îsraîl pejirand, ewa di sala 1952 de dibe endamê "Hevpeymanî Ertlesî" û di sala 1955 an de ewa dibe endamê "Hevpeymanî Bexdadê", di sala 1959 an de Turkiyê daxwaza endametiya xwe di hundir "Bazara Ewropî ya hevbeş" de kir, her dîsan jî di sala 1987 an de wê ji dewletên Ewropî xwest ku di nav wan de bibe endamê fermî, lê dewletên Ewropî daxwaza wê bi pêk ne anîn, lê ewanan bi Turkiyê re ne gotin jî, em endametiya te napejrînin

Tevî ku em dibînin ku M.K. Atatürk û paşê destlatdarên din li Turkiyê çiqas berxweda bûn, xwe nîzîkî dewletên Ewropî bikin, tevî ku pêwendiyên dewletên ewropî bi Turkiyê re hebûn û hîn jî hene, lê ji

ber ku Turkiyê dewleteke îslamî ye; dewletên Rojava herdem bi çavên gumankirî li nasnama wê ya nûh temaşe dikirin û hîn jî dikin. Lê ji sedemên herî girîng ku "Yekitiya dewletên Ewropî" endametiya Turkiyê di nav xwe de napejrin, di van xalên jêrîn de diyar diyar dibin.

1-Rewşa aborî ya Turkiyê: Hejmara hemwelatîyên komara Turkiyê niha pirtirî 64 milyonan e,

li gor texmînan hejmara rûniştvanan dê di sala 2020 î de bibe 100 milyon. Pîrbûna hejmara wan li nik dewletên Ewropî cihê metirsiyê ye, ewanan dizanin ku Turkiyê di warê darayî de li şûn e, ewa hîn di sala 1998 an de % 400 di warê diravî de bi binketibû û di sala 1997 an de bi 80 milyar Dolr dêndarbû.

Ji ber vê jî, dewletên Ewropî ditrsin ku rewşa aborî û pîrbûna hemwelatîyên Turkiyê zîyanê bigînin rewşa aborî û rewşa rûniştvanên welatên wan. Wek nimûne, niha pirtirî du milyonan ji hemwelatîyên Turkiyê tenê li Almanistanê dijîn, Almaniya û dewletên din ditrsin ku hejmara wan hîn pirtir bibe û astengên aborî û rûniştvanî li nik wan jî peyda bibin .

2-Cidabûna asta şaristaniyê di navbera dewletên Ewropî û Turkiyê de. 3- Ewropa baş dizane ku %98 ji hemwelatîyên Turkiyê Musliman in. Lewra jî di hevdiîna partiyên dêmokrat yê xaçperst, roja 4.03. sala 1997 an de daxûnyîyek hate weşandin; di wê daxûyaniyê de weha hatibû: " Pejrandina endametiya Turkiyê di "Yekitiya ewropî "de ne ji nîzîk û ne jî ji dur de gengaz e, pirojeya Ewropa pirojeyeke bajarvanî ye û cidabûneke şaristanî di navbera Turkiyê û Ewropa de heye, lê em bi xurtî piştvaniya hevkarîyê bi Turkiyê re dikin ." 4-Turkiyê û

Yonanistan ne lihev in;mafê Yonanistanê mîna endamekî di "Yekitiya Ewropî "de heye ku "Vîto" li dijî wergirtin û pejrاندina endamên nûh di "Yekitiya Ewropî "de bi pêkbîne. Herweha jîYonanistan gelek caran di "Yekitiya Ewropî" de dikane alîkariyê ji bo Turkiyê rawestîne.Tevî ku Emêrîka pir caran dixwaze zorê bibe serYonanistanê ku ewa helwesta xwe di "Yekitiya Ewropî" de li dijî Turkiyê biguhêre, lê ta niha ewa hîn nikane akamên xwe rasterast li Yonanistanê bike.5-Di Turkiyê de dêmokratî gelek kê m e.6-Kêşa Kurdî li Kurdistanê ne hatiye çareserkirin.6- Cenêral û Leşgerên dewleta Turkiyê destên xwe davêjin nav jiyana siyasî.

Piştî ku dawiya şerê sar û rûxwendina Sovyetistanê hat û piştî şerê kendavê siyaseta derve yaTurkiyê hate guhartin, ewa bervê xwe dide van herêmên mezin; Belkan, Kafkasê, Asiya Navîn û dixwaze roleke giring di van herêman de bilîze. Lê di siyaseta Turkiyê ya derve de du rêbazên sereke û cuda henin;1- Rêbazek rêzanî, kevneşopî-Ataturkî ye. Nûnerên vê rêbazê dibêjin: Turkiyê komarek Ewropî ye û divê ewa were ewropîkirin.lê tevî vê nirîna jorîn jî, dîsan hin serokên partiyên vê rêbazê henin, mîna Mesud Yalmaz, serokê"Partiya Niştimana Dayik" û Tanso Tişîler seroka "Partiya Riya Serast" li ser rêbaza straticiya ola Îslamî dipeyvin, weke nimûne: Tanso Tişîler di 16.09.1996 an de gotiye: " Eger Turkiyê dixweze bibe pirek di navbera Rojhilat û Rojava de, pêwîst e Turkiyê bizanibe ku Rojhilat lingeke wê ye." 2-Rêbaza ola Îslamî ye, berê partiya "Refah"bi seroketiya Nicimdîn Erbakan nûnertiya vê rêbazê dikir, lê Cênêralên Turkiyê ewa di bin wî navî de ji holê rakirin yan qedexekirin û niha partiya

"Elfedîle" bi rêbertiya Ordegan ketiya dewsa partiya "Refahê".Nûnerên vê rêbaza Îslamî weha rast dibînin ku dewleta Turkiyê pêwîst e hêdî, hêdî xwe ji bin bandor û dezgehên welatên Rojava rizgar bike.

Di ber van herdu rêbazên bingeîn re hin partiyên ne sereke henin, dixwazin sudan ji herdu rêbazên sereke bibînin, lê diyar e ewanan ta niha bê hêz û karîger in. Divê em li vir vê rastiye jî bêjin ku çiqas cidabûn di navbera van rêk û rêçikên jorîn de henin, lê ewanan hemû di baweriyekê de ne ku pêwîst e Turkiyê di herêmê de rola seroketiye li şûn dewletên Ereb û Îranê bilîze.

Sedemên aloziyan di navbera Turkiyê û Yonanistanê de çi ne?

Di dîroka berê û ya niha de tete diyarkirin ku sedemên ne lehevîye di navbera herdu dewletên dirawsê de pir in; mêjoyî, şaristanî, siyasî û erdnîgarî ne. Turgut Ozal hîn di dema xwe de, di salên nodî de carekê gotibû: Em parola "Osmaniyên Nûh" ji sernûve radikin.Lê li hember parola Turkiyê, Yonanistanê jî parola "Mîgiya Loaldiya"(Ramana Gewre)"rakir. Paşê "Partiya Yonanî ya Sosyalîst"(PASOK) careke din destlatdariya Yonanistanê kir, wê jî parola "Hêlînî " hilda jor, lewra jî hevdişayetî di navbera "Osmanperestan" û "Ramana Gewre" de ango "Hêlînîperest de "ji nû ve bi xurtî hate vejandin.

Pişti ku "Yekitiya Yogislaviya" jî têkçû, pîrsgirêkên netewî, olî li Bosne û Hirsik, Kerwatiya, Mekîdoniya, Albanistanê û li Kosovo peyda bûn. Di vir de Yonanistan mîna "Erteoksênbawermend" dibêje: Rola "Erteoksîye" di rêzaniya derve de ji bo wê pir roleke sereke dikane bilîze ji ber vê jî, ewî hevpeymanên siyasî –ortdoksî bi

Rosiya, Bolgariya, Serbiya li dijî pêla Îslamperestan li Turkiyê girêdan.

Li aliyeke din jî, berjewendiyên Turkeyê, MuslimanênKerwatiya, Bosne, Albaniya, Mekîdoniya û Bulgaristanê rastî hev hatine.Hîn bi rexberî vê yekê jî, Turkiyê, Yonanistanê tawanbar dike û dibêje: Ku ewa Turkên ku li Rojavayê Tiraqîya dijîn(120 hezar bûn) ji aliyeke netewî û olî de diçewsîne.

Turkiyê û Yonanistanê li ser "Derya Îçe" jî, ji zû de li hev nakin, di vê derbarê de gelek hevpeymanên navdewletî hatin lidarxistin, li gor wan hevpeymanan; sînorên deryayî ji bo herdu welatan, Turkiyê û Yonanistanê hatin destnîşankirin. Ji wan hevpeymanên giring jî ev bûn; "Hevpeymana Lozanê" di sala 1923 an de, "Peymanek" di navbera Îtaliya û Turkiyê di sala 1932 an de, "Peymana Parîsê" di navbera Îtaliya û Yonanistanê di sala 1947 an de .

Her weha jî Yonanistan baregehên leşgerî li (12) giravên " Deriya Îçe" avakirine, Turkiyê bi tundî li dijî van baregehên radiweste, li aliyeke din Yonaistan dibêje: Ku Turkiyê baregeha balefiran ya leşgerî li nîzîkî "Derya Îçe" berfereh dike.

Di sala 1976 an de peymanek li Siwêsrâ hate ragîhandin. Li gor wê peymanê pêwîst e Turkiyê û Yonanistan "Zêrê Reş" ji giravên "Derya Îçe" dernexînin, lê Yonanistan ji xwe re mafêke rewa dibîne ku sudê ji giravên xwe bibîne, lewra jî Yonanistanê "Neft" ji giravên wê deryayê derdixist.

Di sala 1982 an de yasayek giştî derbarê "Deriya Îçe" ronî dît, lê Turkiyê nexwast û hîn jî naxweze wê yasaya giştî bipejrîne û bi ser vê de jî, ewa gefûguran dide Yonanistanê û jê re dibêje: Eger tu destlatadariya xwe li ser "Deriya Îçe" pirtûrî 12 Mîlan bikî, emê leşgerên xwe bişînin hemû giravên vê Deryayê.

Perlemana Yonanistanê di meha Gulanê, sala 1995 an de biryar istandibû ku hemû giravên "Deriya Îçe" têxe bin destlatdariya xwe, vê biryarê hîn alozî û astengî di navbera herdu dewletan de kûrtir kir.

Hîn astengiyeke din pir mezin û dijwar di navbera herdu dewletan de heye; ewa jî kêşa Qubrisê ye.

Girava Qubrisê ji sala 1517 an de di çarçewa "Împiratora Osmaniyan" de bû, li gor peymanana Birêtaniya û "Dewleta Osmanî" di sal 1887 an de, girava Qubrisê dikeve bin destlatdariya Birêtaniya, û li gor hevpeymanên "Sîverê", (1920) û lozanê (1923) mafê Turkiyê di Qubrisê de nema dimîne .

Di sala 1960 î de Qubrisê serxwebûna xwe istand, lê li Qubrisê % 20 Turk in .

Di sala 1974 an de Turkiyê ji %38 ji rûberê Qubris dagîrkir, ew beşê dagîrkişî jî bi samanên xwe yê xweristî pir dewlemend e. Di sala 1983 an de Qubrisa dagîrkişî xwe mîna komareke serbixwe ragîhand, lê ta niha eva komara ji aliyên dewletên cîhanê de bi awakî fermî ne hatiye pênasîn .Bi ser vê de jî "Yektiya Ewropî" Qubris mîna berendemekê di nav xwe de pejirand. Ev gavavêtina jî ji bo Yonanistanê serkewtineke mezin bû, lewra jî Turkiyê tirseke mezin dide Yonanistanê û ji wê û

ji cîhanê re dibêje: Eger Qubris di " Yekitiya Ewropî " de bibe endameke fermî, emê beşê Qubrisê ya dagîrkirî têxin çarçewa dewletaTurkiyê.Herweha jî Turkiyê gefgurên din dide Qubrisê û dibêje: Eger ewa rakêtên Rûsiya li ser erdên xwe bi cîh bike, dê Turkiyê hêrişeke leşgerî bibe ser Qubrisê.Bi vî rengî dewleta Turkiyê ya Ataturk û Îslamperest siyaseta xwe ya derve li gor berjewendiyên xwe û bê rêzlêgirtin ji gelên dirawsê re berdewam dike.

## **Pêwendiyên Turkiyê bi Emêrîka re**

Piştî şerê cîhanê yê duhem têkeliyên Turkiyê bi Emêrîka re hîn bi hêztirbû, Emêrîka dixwast roleke giring û stratîcî bideTurkiyê, ji ber ku Emêrîka dixwast bi alîkariya Turkiyê bi tundî li dijî Soveytistana berê raweste û destên wê yên dirêj li Rojhilata Navîn jî kurtir bike.Ji bo pêkanîna vê armancê, Emêrîka pir baregehên leşgerî li ser xaka Turkiya û Kurdistanê ava kirin û li hember vê yekê, Turkiyê kanîbû gelek alîkariyê di warên çek û diravî de ji Emêrîka bistîne.

Di dema ku Turkiyê beşek ji Qubrisê di sala 1974 an de dagîrkir, ta radeyeke pêwendiyên herdu welatan bersarî bûn.Lê piştî ku şoreşa Îslamî bi seroketiya A.E.Xomênî li dijî Şahê Îranê Muhemed Riza Behlewî di sala 1979 de bi serket û piştî ku Afganistan ji aliyê Sovyetistanê de hate dagîrkirin, di navbera Emêrîka û Turkiyê de peymanek berevanî û aborî di sala 1980 î de hate morkirin. Lewra jî têkeliyên van herdu dewletan li

gor berjewendiyên hevbeş bi hev re hîn xurtir bûn. Turkiyê li bin siya vê peymanê du alî jî gelek alîkarî (darayî, leşgerî) ji Emêrîka dîsan wergirtin.

Gava ku cengê sar bi dawî hat, Sovyetistan û welatên sosyalîst ji binî de hatin felşandin, mirov bawer dikir ku rola Turkiyê di stratîciya Emêrîka de lawaz bibe, lê weke ji me re tête xûyankirin ku ev texmîna ne pir rast e. Ji ber ku hîn baş tête zanîn ku çawa Turkiyê kane rola kilîtekê yan pirekê di navbera Asiya û Ewropa de bilîze, ewa dikane akamên xwe li Belkan, Asiya Navîn, Kafkasê û Rojhilata Navîn bike û li dijî neyarên Emêrîka raweste. Herweha jî giringiya Turkiyê ji Emêrîka re hîn pirtir dib, çimkî ewa dizane ku "Neft û Gaz" li welatên ber "Deriya Qezwînê" gelek hatine dîtin û ew dewletan jî têkeliyên xwe dîrokî, netewî, çandî bi Turkiyê re henin. Li aliyê din jî, Emêrîka hêvî dike û belkî bawer dike ku evan welatan li ser şopa dêmokratiya Turkiyê u ne ya Îrana radîkal biçin. Li hember berjewendiyên Emêrîka, Turkiyê jî berxwe dide ku Emêrîka zorê bide ser dewletên Ewropî, ta ku ewanan wê di nav xwe de mîna endam bipejrînin. Li gor nirîna me jî, çareserkirina kêşaya Kurdî û bînpêkirina mafên mirovan li Turkiyê niha ji Emêrîka re ne derd e û ew jî nabin sedemên têkçûna têkeliyên Emêrîka bi Turkiyê re.

## **Siyaseta Turkiyê**

### **li hember dewletên Îslamî û cîhana Erebi**

Weke tete zanîn gelê Ereb jî mîna pir gelên din li dora 400 salan di çarçewa Împiratora Osmanî de dijîya, gelê Ereb di vê baweriyê de ye ku (Dewleta Osmanî) di bin bandor û parola ola Îslamî de welatê Ereban dagîrkiribû. Li aliyê din jî, Turk dibêjin: Ereb û hin dewletên Ewropî koledar, pîlanên xwe li dijî me çêkirin û dewleta me hilweşandin, ji ber vê jî di destpêkê de têkeliyên van dewlatan bi hev re pir xerap bûn û gelşiyêke mezin di nav wan de hebû. Mîna me berê jî nivîsîbû; Turkiyê dewleta Îslamî ya yekem bû ku damezrandina dewleta Îsraîl rewa dît û ewa pejirand, têkeliyên dîplomasî hîn di sala 1950 î de bi wê re girêdan û ewa bûye endamê gelek hevpeymanên navdewletî li dijî welatên Erebi û Îslamî.

Di encama van hevtêkeliyên xurt de, gava ku du dewletên Erebi; Misirê û Sûriyê xwe ji yektiyekê re amede dikirin, Turkiyê hîn di sala 1957 an de li dijî yekitiya herdu dewletan rawestiya û ewê hêzên xwe yên leşgerî şandin ser sênora dewleta Sûriyê û ewê xwest Sûriyê bi vê yekê bitirsîne û lingên wê li berhev xîne. Herwisa jî Turkiyê rêk dabû Emêrika ku ewa hêzên xwe yên leşgerî ji baregeha leşgerî "Incerlik" bişîne Libnanê û ewa (Turkiyê ) di sala 1958 an de, di " Netewên Yekgirtî " de li dijî azadiya Firansa nirîna xwe derbirî û ta niha jî Turkiyê naxweze bêje ku wê hîn di sala 1939 an de herêma Îskenderonê bi erêkirina Firensa dagîr kiriye .

Di dema ku komara Turkiyê avabû, ewê giringiyeke mezin hîn ne dida dewletên Erebi û cîhana Îslamî ta ku tîkeliyên Erênî bi wan re çê bike. Lê piştî ku guhertinên siyasî li fêz û gurepana cîhanê de hatin holê. Turkiyê ji wê hîngê de berxwe dide danûstandinên beranberîbûn û hevteraziya bi welatên îslamperest re li gor sudên xwe bihûne. Tevî ku Turkiyê di sala 1976 an de dibe endamê "Rêxistina Kongira Îslamî, lê dîsan tîkeliyên wê bi dewletên Erebi û Îslamî re ta niha erneyênî ne, ango helwestên wê hêlkandî ne û ne cîwest in. Di vê derbarê de Turgut Ozal carekê ragîhandibû; "Belkî em kanibin aşitiyê bibin navçeyên Erebi û Îslamî, em emede ne hemû pirojeyan li wir bi pêk hûnin, ew pirojeyan dikanin wan herêman di warê aborî de bi pêş xînin, wek nimûne em dikanin avê ji çemên xwe bigînin "Girava Erebi" û wirzeyên çandinî li wir dewlemend bikin ..."

Lê Turkiyê, siyaseta xwe li hember cîhana Erebi û Îslamî di salên nûdî de li ser van bingehan danîye;1-Kutabûna şerê sar û rûxandina Yekitiya Soveyt.2-Şerê kendavê yê duhem.3-Diyalogên Ereban bi Îsraîl re û hêdî pir dewletên Erebi jî wê dipejirînin û dijmantiya wê nakin.4-Xurtbûna şepêla Îslamî li Turkiyê.5-Turkiyê pêwendiyên xwe di warên bazirganî, pirojeyên aborî û yên din kêrhatî bi dewletên Kendavê, Mexribî, Misir û Urdinê baş kirine. Lê divê em bêjin jî, pêwendiyên wê bi Sûriyê û Îraqa berê re ji bo pirsê avê, ango ji bo çemên Feratê û Dicle ne rind bûn û dê di duhatî de jî ne rind bin. Ji bo parvekirina ava van herdu çeman çar hevpeymanên navdewletî jî lidarketine.1-Hevpeymanî Firansî –Birêtanî di 13.12.1920 î de.2-Hevpeymanî Lozanê di 24.07.1923 an de .3- Hevpeymanî dostane û

dirawsêyeyî di navbera Firansa (Sûriyê) û Turkiyê, li Ankerê di 30.05.1926 an de ji bo parastina çema Qiwêqê li Helebê. 4- Hevpeymanana Helebê di navbera Turkiyê, Firansa û Birêtaniya di 3.05.1930 î de.

Di sala 1966 an de li Hêlsinkî biryar hatibû istandin, li gor wê, divê cidabûn di navbera van herdu rudawên xweristî de tune be: 1- Cihderê avê ji ku dibê, bila bibe.2-Av di kuderê re diherike bila biherike .

Turkiyê û Sûriyê, Turkiyê û Îraqê ji bo çareserkirina kêşa parvekirina ava herdu çeman gelek caran bi hev re hevdiîn çêkirin û di sala 1982 an de her sê dewlet bi hev re rûniştin, lê ta niha jî ew bi hev re ne gihane hevpeymaneke cîwest, yanê Sûriyê û Îraqê hîn nizanin parên wan di avê de çiqas in, lê divê em bêjin jî, Turkiyê di sala 1987 an de soz daye Sûriyê ku ewê bi kêmasî di her saniyekê de 500 M. av ji çema Feratê bi ser Sûriyê de biherikîne

Turkiyê dixweze hîn pirojeyên berbestên avê, ji bo berjewendiyên xwe li dewletên herêmê bi kar- hûne;

1- Turkiyê "Pirojeya Ava Boriyên Aştiyê" di sala 1987 an de ragîhand, armanca Turkiyê ji vê pirojeyê ew bû;ku ewa avê ji çemên Sihan û Çîhanê bide welatên Rojhilata Navîn, Turkiyê dixwast ji pişt vê pirojeyê di her salekê de li dor du Milyar Dolar qezenc bike.Lê dewletên Erebî ev piroje ji ber van sedemên jêrîn nepejirand.1-Dewletên Erebî ditirsiyan ku mafê bikaranînê avê herdem li gor daxwaza Turkiyê be, û ew ji xwe re avê mîna çekekê bi karhûne.2-Kirîna avê ji Turkiyê ji bo weletên Ereban pir buha bû.

2-"Pirojeya Xabê;" ev pirojeya ji 22 berbestên avê û ji 19 wargehên ênergiya cêlanê (kehrebê ) pêkhatiye. Ji berbestên herî giring, berbesta Atatürk e, ewa di sala 1992 an de li ber çemê Feratê hatiye avakirin. Mîna têtê nivîsîn; ewa bi pîrbûna avê xwe li cihanê ya 15 ê ye. Di encamê de mirov kane bi sanahî bêje, ku niyaza Turkiyê ji van pirojeyên jorîn ev e; ku ewa bi riya avê, dewletên Ereban di warê çandinî bi dest xwe ve hûne û bi ser de jî dixwest û dixwaze avê xwe bi çekan û zêrê reş biguhêre.

Kêşa herêma Îskenderunê: Firansa û Turkiyê di 20.10.1921 ê de bi hev re peymanek li darxistin, li gor wê peymanê sînorek di navbera Turkiyê û Sûriyê hate çespendin û dîsan li gor wê peymanê, sistêmeke rêvebiriyê û taybet li herêma Îskenderunê bi cih hat. Ev sistêma li gor berjewendiyên Turkiyê bû, Turkiyê kanîbû, zimanê Turkî li vê herêmê jî bike zimanê fermî, ewê hejmara hemwelatîyên xwe (Turk) li vê herêma Erebi pirtir kir. Lewra jî gava ku Turkiyê di sala 1938 an de bi alîkariya Firansa hîlbijartin li herêmê kir, dengên kêmetewa Turkan di encumena bilind de, ya ku ji bo rêvebiriya herêmê hatibû hîlbijartin, pirtir bûn. ( Yên Turkan 22 nûner û yên Ereben Surî 18 nûner bûn ).

Turkiyê bi vê destdirêjkirinê tenê qayil nebû, ewê di wê salê de jî hêrişek leşgerî bire ser herêma Îskenderunê, lê Firansa li dijberî Turkiyê û hêrişên wê ranewestiya. Bi ser vê de jî, di 23.06.1939 an de Firansa ji bo qazancên xwe yên koledarî, herêma Îskenderunê raberî Turkiyê kir. Bi vî awayî beşek ji axa Ereben Sûriyê jî mîna Kurdistanê di bin nîrê komara Turkiyê de maye.

Di nirîna me de, ne Sûriyê û ne jî dewletên din Erebi, dagîrkirina herêma Îskenderunê ji xwe re kirine qisawet, Sûriyê car caran wê herêmê tîna bîra xwe û li ser wê di civatên navdewletî de dipeyve û dibêje: Em dixwazin herêma Îskenderunê bi riya " Netewên Yekgirtî " dîsan li me vegere..Lê diyar e ta roja îro tu kes guhên xwe nade van daxwaz û bergerînên qels û sistexavî.

### **Kêşeya Musilê û Başûrê Kurdistanê**

Di dîroka nûjen de diyar e li gor hevpeymanan "Sayiks -Pîko " di sala 1916 an de û piştî şerê cîhanê yê yekem, dewletên koledar dewletên Ereban û du beş ji Kurdistanê ji "Împiratora Osmanî" dagîr kirin. Firansa Rojavayê Kurdistanê di çarçewa Sûriyê de zep kir û Birêtaniya wîleyeta Musilê( bajarê Musilê û Başûrê Kurdistanê) ji ber dewlemendî û stratîciya wê ya ciyografî, di çarçewa Îraqê de xiste bin nîr û destlatdariya xwe.

Şerê cîhanê kutabû, lê di navbera Turkiyê û Birêtaniya de gelşî li ser wîleyeta Musilê berdewam bû, lewra jî van herdu dewletan xwestin kêşeya wîleyeta Musilê li nik "Koma Netewan"çareser bikin.

Hîn di hevpeymanan "Lozanê" di sala 1923 an de serokê şandeya komara Turkiyê Îsmet İneno gotibû : " Hemû rûniştvanên wîleyeta Musilê Turk û Kurd in, li wir bi van sê zimanan têtin axivtin; Turkî, Kurdî û Erebi. Lê Kurd bi regez û koka xwe ne "Arî "ne, ew bi binyata xwe "Toranî "ne..., û wî hîn gotibû: piraniya rûniştvanên wîleyeta Musilê Turk û Kurd in û eger piraniya hemwelatiyên bajarê Musilê Erebi bin jî, ewa nabe

sedemek ku danîştvanê şarê Musilê çarenûsa wîlayeta Musilê bi giştî çareser bikin, ji ber ku gelê Ereb di wîleyetê de kêmtew e.... , û bi ser de jî ewî nirîna xwe weha vekirî derbiribû; " Turkiyê ne amede ye ku wîleyeta Musilê bide tu hêzên din li cîhanê .

Li gor biryara "Koma Netewan " di sala 1925 an de diviyabû, wîleyeta Musilê di çarçewa dewleta Îraqê de bimîne û di sala 1926 an de, Musil û Başûrê Kurdistanê bi fermî di çarçewa dewleta Îraqê de ma ye .

Lê Turkiyê ta roja îroyên her du çavên xwe di bajarê Musilê û Başûrê Kurdistanê de mane

Wek Nimûne: weke ku rojnama "Hiriyet" di 6 .06. 1994 an de bername û pirojeya serokê Turkiyê Turgot Ozal eşkere dike û dinivîse: Pirojeya Turgot Ozal ew e ku ewa dixwaze Îraqê parve sê dewletên biçûk bike 1- Dewleta Erebî. 2- Dewleta Turkî. 3- Dewleta Kurdî. ; yanê niyaza wî ew bû ku ji bajarên Musilê (Erebî) û parêzgeha Kerkukê (Kurdistanî) komareke Turkmanî ava bike û paşê wê bi dewleta Turkiyê ve girêde. Lê li aliyê din "Partiya Netewa Turkî" dibêje: Divê em wîleyeta Musilê (Musil û Başûrê Kurdistanê ) ya ji aliyê Birêtaniya de hatibû dagîrkin, dîsan wê rizgar bikin û wê têxin çarçewa dewleta Turkiyê. Herweha, Sulêman Dêmêrîl jî di sala 1995 de xwest ku sînor di navbera Îraqê û Turkiyê de serast bibe û dîsan wîleyeta Musilê têxin bin destên xwe .

Piştî şerê Kendavê, Turkiyê di 14.05.1997- 21.06.1997 de hêrişek leşgerî ajot ser Başûrê Kurdistanê.

Dîsan Leşgerên Turkiyê bi buhaneya hebûna wargehên Girîlayên PKK li çiyayên Qendîlê (Başûrê

Kurdistanê) di 21 .02. 2008 an de hêrişek mezin bir ser Başurê Kurdistanê. ArmancênTurkiyê yên nîzîk û rasterast ji vê hêrişê çî bûn?1-Ewê dixwast wireyên gelê Kurd li herêma Kurdistanê ji binî de hilweşîne2-Ewê niyaz dikir ku bingeha avahiya jêrîn birûxîne, ta ku hukumeta Kurdî sernûva bi tijîkirina valahiyan mijûl bike û wê ji xala 140 ji destura Îraqê ya nûh bidûrxîne 3-Turkiyê dixwast şerê birakujiyê di navbera Kurdan de peyda bike. lê dîsan Turkiyê nikanîbû armancên xwe ji ber van sedeman bi chi bihanîna.1- Girêleyên PKK berxwedanên dilawerî û kamêranî li dijî leşgerên Turkiyê kirin .2- Rêberên herêma Kurdistanê azad bi pêşengiya serok Mesud Berzanî biryarek gelek hişmendî ragîhandin û gotin ku rewsa siyasî çawa dibe, bila bibe, lê şerê birakujiyê.Kurdî –Kurdî ne gengaz e.3-Yekbûna helwesta partiyên Kurdistanî li dijberî hêrişa Turkiyê pêwîst e 4-.Pêşmergeh qehreman ji bo berevanî û parastina Kurdistanê xwe amede kirin.5-Gelê Kurd li sê beşên din jî û li dervayî welêt dengê xwe li dijî hêrişa Turkiyê bilind kir.6-"Yekitiya Ewropî" namek ji Turkiyê re şand û ewê tê de nivîsîbû: Eger tu (Turkiyê )leşgerên xwe ji Kurdistanê venekşînî û vê daxwaza me bi pêknînî, dê "Yekitiya Ewropî" li dijî hêrişa Turkiyê hin biryaran bistîne 7-Emerîka jî ji Turkiyê re got: Divê tu di hundir du heftan de leşgerên xwe ji Kurdistanê vegehinî û divê astengî bi awayên siyasî, aştiyane werin çareserkirin, herweha jî gotibû, divê tu giringiyê bidî kêmtetewa Kurd li Turkiyê.8-Serokê giştî yê "Netewên Yekgirtî ", gotibû: Birêtaniya, Firansa, Îtaliya jî li hember hêrişên Turkiyê bêdeng neman. lê divê em vê rastiyê jî bidin xûyakirin ku dewleta Îsraîl ji bo berjewendiyên xwe bi Turkiyê re

nexwest dengê xwe li dijî hêrişên Turkiyê bilind bike. Lewra Turkiyê dîsan neçarbû, leşgerên xwe di 29.02.2008 an de ji Kurdistanê vekşîne. Li vir em kanin bêjin ku siyaseta Turkiyê li hember Îraqê û herêma Kurdistanê ne li ser bingehêke dîrokî; zanistî û rasteqînî ye, lewra jî ewa ne niha û ne di pêşerojê de nikane Îraqa fêderal perçe bike û xewnên xwe yên Toranê vejîne; ji ber ku, li gor nirîna me, ne dewletên Erebb, ne gelê Kurd, û ne jî siyaseta gorepana navnetewî rêbaza Turkiyê ya toranîst dipejrin û bi ser de, dê ewanan hemû bi tundî li dijî gavavêtên koledarî rawestin.

## **Turkiyê û pêwendiyên wê bi Îranê û bi hin komarên Îslamî re**

Tevî ku di dîroke de diyar e, "Împiratora Osmanî" û "Împiratora Sefewî" li dijî hev şer kiribûn, têkeliyên wan di sedsalên duhatî de, ne bi dijmantî û ne jî bi dostanî dihatin naskirin.

Lê piştî ku şoreşa Îslamî bi seroketiya A.E- Xomeynî li dijî M.R. Behlewî di sala 1979 de li Îranê biserket. Turkiyê ji hewşvedana ola Îslamî-Îranî ya radîkalîst ditirse, ji ber ku Îran berxwe dide akamên xwe di warê olî li hundir Turkiyê bike. Lê gava ku Sovyetistan hilweşiya û komarên Îslamî li Asiya Navîn serxwebûnên xwe ragîhandin, vê carê di navbera Turkiyê û Îranê de, pêşbirkek destpêkir; her yek ji van herdu dewletan dixwaze van komarên Îslamî ji aliyên aborî û nemaze di warên "Zêrê Reş" û "Gazê" de bi stratêciyên xwe ve girêde. Lê Turkiyê gavên xwe hîn ji vê pirtir di

destdirêjkirina nav dewletên Asiya Navîn û Kafkasê de ( Ezerbêcan, Turkmanistan, Kazaxistan, Uzbêkistan, Kêrgîzistan û Tacîkstan ) avêtine; ewa ne tenê dixwaze sudên aborî û diravî ji van komaran bibîne, lê ewa niyaz dike ku wan dewlet û miletan di warên siyasî, nijadî û çandî jî bi xwe ve bibestîne, ewa niha xwe mîna birayekî mezintir ji pênc gelên Turkaxêv re dibîne. Dîsan weke tête zanîn, rêxistina ( E C O ) ji bo hevkarîyên aborî di sala 1960 î de, di nav van dewletan de, Turkiyê, Îran û Pakistanê ve hatiye avakirin, lê piştî rûxandina Soyetistanê, di sala 1992 an de Ezêrbêcan, Turkmanistan, Uzbikistan, Tacîkstan dibin endamên vê rêxistina abrî ( E C O ) û komara Kêrgîzistan di vê rêxistinê de ( E C O ) mîna dewletek çavdêr tête destnîşankirin. Turkiyê dixwaze bi van hewaldanên xwe, rola xwe di van herêman de hêztir bike, ta ku ewa kanibe rêkê li pêş armanc û daxwazên Rusiya û Îranê li wan herêman bigre û li pêş wanan mîna gêrbendekê raweste. Li aliyê din jî Turkiyê dixwaze bi van çalakiyên siyasî, aborî, û çandî helwestên xwe li hember " Yekitiya Ewropî " û dewletên Rojava xurt bike. Turkiyê ji bo pêkanîna armancên xwe pir gav li van herêman avêtine. Di warê siyasî de; ewê hîn di sala 1991 ê de serxwebûna van dewletan bi şeweyekî fermî pejirand û balyozxaneyên xwe li wan komaran vekirin û komîtek taybet ji nav wezîrên xwe ji bo karûbarên van balyozxanan destnîşan kirin. Di warê leşgerî de; Turkiyê hevpeymanek hevbeş ji bo berevaniyê bi Ezêrbêcanê re mor kiriye. Herweha jî ewê peymanên din leşgerî bi hin van komaran re girêdane. Di warê aborî de; wê têlên telefônên xwe bi yê wan komaran ve girêdan, pirojeyên bazarganî, gumrikî (

bacbirin ), çandinî, neftî, industrî û riyên çûyên û hatine li wan deran ava kirine. Dîsan Turkiyê di warê rêgihandina Neftê de berberitiya Rusiya dike; ewa jî dixwaze Neftê ji "Deriya Qezwînê", ji Bako di nav erdên xwe re derbazî Ewropa bike.

Herweha jî Turkiyê hewal dide ku têkeliyên xwe yê aborî bi welatên din Îslamî re xurt bike. Di sala 1997 an de Turkiyê bi van heft dewletên Îslamî re; Misir, Pakistan, Îran, Bengladêş, Nêcîriya , Indunîsiya, Malîziya "Komeleya Heyşt Dewltî" damezrandin. Armanca Turkiyê ev e; ku ewa derhênanên xwarinî û çekên xwe bifroşe van dewletên jorîn.

Di warê çandî de jî, Turkiyê ji bo xwe gavên kêrhatî avêtine; 1-Ewê di sala 1993 an de bi hevkarîya van welatan: Uzibkstan, Turkmanistan, Kazaxstan, Kêrkîzistan, Ezerbêcan, Alfabayeke hevbeş bi tîpên latînî-Turkî ji bo van welatên jorîn terxandin. 2-Evan welatan bi hev re ferhengên zimanê Turkî bi(zaravên turkî) jamedekirin û Turkiyê mamostên zimanê Turkî şandin û dişîne van welatên Asiya Navîn 3 Turkiyê baregehên nûh ji bo tilfiziyonê ava kirin û bernameyên nûh arasteya van komaran dike .

Tevî em dibînin ku Turkiyê çiqas hewaldanan ji bo pêkanîna armancên xwe li wan welatan dike, lê diyar e, riya wê ji ber van sedeman ne ewqas dûz û serast e. 1-Turkiyê di warên darayî, aborî û zanistî de ne xurt e. 2-Serokê Kazaxistanê Nor Sultan Nizar Babayêf carekê gotibû: Turkiyê dixweze mîna Sovyetistana berê bi serê me bike, ewa dixwaze xwe ji me re weke birayekî mezin bide nîşankirin. 3-Ezêrbêcan û Kazaxistan bi xwe

dixwazin roleke pêşengî di Asiya Navîn û hawîrdora wê de bilîzin4- Weke tête zanîn; %45 ji rûniştvanên Kazaxistanê bi zimanê Rusî dipeyvin, bê guman ewanan naxwazin peyrewiyê ji dewletaTurkiyê re bikin.Lê di baweriya me de, tevî van hin aloziyên jorîn, Turkiyê destên xwe ji van dewletên Asiya Navîn nakşîne, ji ber ku siyaseta dewleta Turkiyê di naveroka xwe de nijadperest e û belkî ewa dixwaze di pêşerojê de Împiretoreke Turkî nûjen damezrîne.

### **Têkeliyên Turkiyê bi dewleta Îsraîl re**

Me berê di rêzên jorîn de gotibû;têkeliyên Turkiyê û Îsraîlê di pir waran de hîn ji destpêkê de başbûn, Turkiyê dewleta Îslamî ya yekem bû, ku di sala 1049 an de damezrandina dewleta Îsraîl pejirand, û ewê di sala 1950î de pêwendiyên dîplomasî bi wê re destpêkir.

Di destpêka salên 90î de têkeliyên herdu dewletan di pir aliyên de baştirbûn. Ev herdu dewlet jî li Rojhilata Navîn hevalên stratîcî ji Emêrîka re ne.Di sala 1996 an de Turkiyê û Îsraîl peymanên leşgerî bi hev re morkirin;yekek ji wan hevpeymanan ev e: Îsraîl kane ezmana dewleta Turkiyê ji bo balefirên xwe bi karhûne;lewra jî dewleta Îsraîlê ta niha gelek sud ji ezmana Turkiyê dîtine;ewê jî pir pêzanîn li ser dewletên dirawsê ji xwe re civandine .Li aliyê din jî Turkiyê kane tangên Îsraîlê bikire;Îsraîl kane bi 600 milyon dolar 54 balefirên leşgerî yên Turkiyê nûhtir bike.Turkiyê divê ajentiye ji Îsraîl re bike û pêzanînen nehên li ser Sûriyê, Îranê û Îraqê bide Îsraîlê. Di encama van hevkeriyên jorîn de, Îsraîl jî alîkariyaTurkiyê û Emêrîka kir û serokê PKK

rêzdar Ebedele Ocelan di sala 1999 an de ji aliyên wan de hate revandin.

Dîsan pêwîs te em carek din li vir biçespînin û bêjin: Têkelî û hevpeymanên Turkiyê bi Îsraîl re encamên neyênî li hember herêma Kurdistanê azad jî rû dide; di sala 2008 an de Turkiyê bi buhaneya hebûna "Girîleyên PKK" hêrişek mezin bir ser Kurdistanê de ajot, dengên pir welatên demokrat li cîhanê li dijî wan hêrişên ne dadmend bilind bûn, lê Îsraîl ji bo razemendiya Turkiyê, bê deng mabû.

Turkiyê hîn ji vê pirtir gavên xwe avêtine, bernamên xwe yê leşgerî amede kirine; ewa dixwaze di destpêka 2020 î de baregehên çekên atomî li Kurdistanê ava bike. Dêmek vaye em dibînin çawa Turkiyê dixwaze xwe li Rojhilata Navîn mîna Îsraîl xurt bike, ewa ne tenê dixwaze rêkê li pêş pêşketina tevgera azadîxwaza Kurdistanê û destkewtinên gelê Kurd bike, lê ewa hîn dixwaze rêkê li pêş armancên Îranê jî li herêmê bigre.

Li rexberî van hevpeymanên jorîn ;pêwendiyên aborî di navbera herdu dewletan de pêşda diçin; ewanan hîn di sala 2000 î de " Bazara Azad ya Hevbeş" di nav xwe de ava kirin. Li aliyêke din jî Turkiyê soz daye Îsraîlê ku ava çemê Manoçatê bifroşe wê. Îsraîl jî niyaz kiriye ku alîkariyê Turkiyê di pirojeya "El Xab" û bi taybetî di şeweyên avdana çandinî de bike.

Bi vî rengî me gelek bi kurtî hin xale ji siyaseta Turkiyê ya derve anîn zimên, lê em dixwazin biçespînin ku eva mijara giring bi pêwîstiya pir lêkolînên berferh hene, lê armanca me ev bû, ku em hinek ji ronahiya mumekê bavêjin ser siyaseta Turkiyê ya derve û rolên wê

yên neyênî di Rojhelata Navîn û Asiya Navîn de bidin xûyakirin.

### **Çavkaniyên kêrhatî**

1- Turkiyê û pirsên siyaseta derve . Bi zimanê Erebî, Xorşîd Husên Delî. 1999.

2-Kurdistan di navbera serxwebûn û dagîrkerinê de.Bi zimanê Kurdî û Erebî, Muhemed Mile Ehmed.2005.

3-El-Barzanî û tevgera azadîxwaza Kurd, birê duhem . Bi zimanê Erebî, Mesud Berzanî, 1997.

4- Doza Kurdî di kongirên navdewletî de.Bi zimanê Erebî, Dr. Fuad Heme Xorşîd Mistefa, 2001.

5- Selemen Cenêralat el.nesir el Kurdistanî. (Gotar bi zimanê E

rebî ) 2008. . Malperên Pena kurd û Welatî .net

.....

Almaniya 2007.Malperên Pena Kurd û Welatî .net

**Berêz Muhsin Ciwanmêr dixwaze bi navê  
serokê nemir M. M. Berzanî  
bi hestên netewî yên kurmancaxêvan bilîze**

Rêzdar Ciwanmêr hîn di rêça xwe ya şaş de diçe û ewê dîsan di 30.07.2007 an de gotarek bi zimanê Erebi di pir malperan de weşandiye. Ew di gotara xwe de dibêje: " Bila dilovaniya xwedê li rêberê Kurd Mistefa Berzanî be, di dema ku ewê di danîştinekê de bi Dr. Mustefa Muslim û hevalên wî re gotibû: "Ez tu caran nivîsandina Kurdî ku bibe latînî napejrînim..." ji ber ku hin Kurdan bi tîpên latînî –Turkî girtine û rudawên dengên latînî –Turkî li ser tîpên Kurdî pêktînin, lewra jî dengên Kurdî reseniya xwe winda kirine û hin tîp jî ji zimanê Kurdî hatine avêtin ...." Ewa dîsan dinivîse: " Ez nizamim ji bo çi hin Kurd tîpên latînî pîroz dibînin û ewqas evîndarên wan tîpan in, tu dibêjî, qey ewan ji ezmên de hatine xwerê....".

Ew hîn dibêje: "Eger pêwîst be hemû gelên cîhanê bi tîpên latînî binivîsînin, lê pêdivê Kurd van tîpan ne pejrînin, ji ber ku bi karanîna van tîpan, ziman, çand, kelepur, dîrok, û erdnîgariya gelê Kurd li Bakur hema hema winda kirine, û gelê Kurd mîna neteweke serbixwe nabînin..., û wan bi Turkên çiya nav dikin ....."

Bi ser van gotinên jorîn de jî, nivîskar M. Ciwanmêr xwe dixwe hin çewtîyên din, ewa dixwaza ji bo du, sê tîpên Erebi yên ku di bin bandora pirtûka pîroz (Qoran) de ketine nav zimanê me, tîpên Kurdî –latînî nepejrîne, bi sedama ku Kurd nikane wan tîpên Erebi bi latînî bi

karhûne, ango bikaranîna wan tîpan bi latînî, tîpên Erebi yê resen têtin guheztin .: : ..."

Di rastiyê de min nedixwast dîsan bersiva mamoste M.Ciwanmêr bidim, ji ber ku min û çend hevalên din jî mîna nivîskarên berêz, Dr.Husên Hebeş, Heyder Omer, HelîmYosiv, Hesên Silêvanî, Selah Sadallah, Elî Cefer, Selîmê Biçûk bersiva wî û yê mîna wî wek Ferhad Şakilî li ser zimanê Kurdî û astengiyên zimên ji zû de dabûn.Me ji wî û ji yê mîna wî lava kiribûn ku ewanan hinekî bi aramî û zanistî kêşeya zaravên me bipelînin û ne bi darê zorê li nav çavên zaravê Kurmancî yê bi tîpên latînî bidin ..., lê mixabin hêrişkirin li ser zaravê Kurmancî û tîpên latînî hîn berdewame ..., ez û bi sedan rewşenbîrên Kurmancaxêv li çar beşên Kurdistanê gelek ji helwestên van berêzan mîna Muhsên Ciwanmêr û Ferhad Şakilî matmayî dimînin.Ez bi xwe pir caran ji xwe dipirsim, ma gelo çima ev pirsê niha ji aliyê van kesan de pir bi neyînî germ dibe..? Çima wezaretê perwerdeyê li Kurdistana azad çavên xwe li ser van hêrişên ne rewa dadimrîne???? Ma gelo perlemanê Kurdistanê li pişt van kesayetiyên e ???Ma gelo hin siyasetmedarên destltdar bi nehênî li pişt van berêzan radiwestin?? Bi rastî gelek pirsên din bê vîna min di serê min de derin û tîn !!!

Li alîyêkî din, berêz serokê herêma Kurdistanê kek Mesud Berzanî bi awakî vekirî li pêş nivîskar, ronakbîr û siyasetmedarên parêzgeha Dohokê goti bû: Niha ne dema çareserkirina pirsgirêkên zimanê Kurdî ye ..., û h. w.d "lê tevî vê, Muhsên Cewamêr di nivisîndina xwe de li ser vê mijarê hîn berdewam dike, ew û pir mixabin ta niha nirx nedaye nivîsarên nivîskar û ronakbîrên kurmancaxêv û ne jî ew nexê dide nirîna serokê herêmê kek Mesud

Berzanî..., lê bi ser vê de jî ew dixwaze bi peyvên serokê mezin, nemir Mila Mistefa Berzanî bi hestên welatparêzên Kurdistanê bilîze û çavên me hemûyan li ser şaşiyên xwe bigre. Di sebarek peyvên nemir M.M Berzanî li ser tîpên kurdî –latînî de, ez nizanim ta kîjan radeyê nirîna serokê me yê pakrewan li nik rêzdar Muhsên Cewamêr belgekirî ye ????. Herweha mirov dixwaze dîsan pirsên din ji kek Muhsên Cewamêr bike; eger serokê nemir rast ev gotinan kiribin, çima ewanan niha tîpên ser zimên? Çima gava ku serok ev gotinan kirin, nivîskar û rewşenbîrên me li hemû beşên Kurdistanê guhdar ne kirin yan di belgeyê de ne xwendin ... ???Eva li aliyê, lê li aliyê din, bi malyonan Kurdistanî M.M.Berzanî mîna serokê gelê Kurd dibînin, siyaseta û rêbaza wî ya netewî di dil û mêjiyên hemûyan da ne, ango nemir Mistefa Berzanî siyaseta medar, têkoşer û ramangîrê kêşeyên demokratî û azadiyê bû ..., lê ew ne zimanzan bû, ez gelek bawer dikim, ku ewa niha hîn xweş bûya, ewî, dê biryara standardkirina zimane me bi erkên zimanzanên hemû beşên Kurdistanê ve bibestanda, peyv û pêşniyarên serok Mesud Berzanî di vê derbarê de nimûneyeke gelek zelal e..

Di encama van bawerî û vepirsînên min de, ez lava ji hemû zimanzan û ronakbîrên her çar beşên Kurdistanê dikim ku ewanan bi aramî û hêminî gotar û lêkolînên xwe derbarê zimane Kurdî û astengên wî binivîsîn, divê ewanan niha li hukmeta herêma Kurdistanê çareserkirina vê pirsgerê ne lezînin, çimkî hukmeta me hîn nû ye, û mîna her kesek dizane ku niha bi sedan aloziyên siyasî li Îraqê henin, hukmeta Kurdistanê di hev kêşeyê siyasî mezin û giring de ye, lewra jî hêgin û germkirina kêşa

zimanê Kurdî di vê qonaqa pir nazîk de, ne li gor berjewendiyên netewa Kurd e, bi texmîna min, belkî dijminên me sudan ji pêşniyar û nirînên van hin rewşenbîrên Soran mîna Muhsên Ciwanmêr û Ferhad Şakilî wergirin û qelîşteken mezin di navbera Kurmancaxêv û Soranaxêvan de peyda bikin ..Ez bi hêvî me ku em hemû bi çavên bilind li pêşniyarê serokê herêma Kurdistanê kek Mesud Berzanî temaşe bikin, ji ber ku ew baş dizane ku niha çi qas heyama siyasî li Kurdistanê nazîk û hestwer e.

Almaniya.28.08.2007 .Malperên welatî .net û Pena Kurd .

.....

## **Çend gotin li ser "Eniya Rizgariya Niştimanî"**

Cerkî ku Dr.Beşar Elesed ji sala 2000 î de serdariya Sûriyê dike, pir dezgeh, rêxistin û eniyên rikberî li dijî rêcîma Sûriyê li hundir Sûriyê û li dervayî Sûriyê ava bûne.Wek nimûne ji yên hundir Sûriyê "Ragîhandina Şamê" bi hevparbûna beşekî mezin ji tevgera Kurdî li Rojavayê Kurdistanê di 16.10.2005 an de hatiye damezrandin, tevî me gelek kêmkasî di daxûyaniyên wan de dermafê gelê Kurd de dîtî, lê dîsan me "Ragîhandina Şamê" bi gaveke erênî nixand.

Lê vê carê eniyek din bi navê "Eniya rizgariya niştimanî" li dervayî welêt bi seroketiya cihgirê serokê Sûriyê yê reviyayî, Ebdil Helîm Xedam bi alîkariya çavdêrê giştî ya "Civata mislimanên bira" Elî Sedir Elbeyanonî û bi beşdarbûna siyasetmedarê Kurd Selah Bedireldîn di 17 Avdarê, sala 2006 an de li Biroksilê paytexta Belçîka hati- bû ragîhandin û vê" Eniyê" kongira xwe ya damezrandinê di rojên 4-5 .06.sala 2006 an li Londinê lidarxistibû.

Dîsan vê( Eniya Xedam ) kongira xwe ya duhem di rojên 16-17.09 sala 2007 an de li Berlînê girêdan..

Di sereta de em dixwazin bêjin ku avakirinên (Eniyên Rikberî) ji bo pêkanîna dêmokratiyê li her welatekî rewa ne û ewanan pêwîst in li ser bingeheke giştî û li hevkirî werin avakirin. Lê pirs

herî mezin ew e ku kî bi kê re "Eniyan" çê dike?, û ev "Eniyan" çi çareserkinên nû ji pirsgerêkên kevin re li welêt di piroje û rêbazên xwe yê siyasî de pêşkêşî gelên xwe dikin ?

Ev herdu siyasîmedaran, Ebdil Helîm Xedam û Elî Sedir Elbeyanonî damezrênerên "eniya rizgariya niştimanî " yê sereke ne. Her kesek jî me zane ku Ebdil Helîm Xedam hîn hevalê serokê Sûriyê yê berê Hafîz Elesed bû, para wî di destladariya Sûriyê de pir mezin bû, ango ewî tu carî nizanî bû ku dêmokratî û serbestî çi ne ? ewî bi dehên salan di rêvebirîya partiya "Bes" de ya ku bi riçperestî û şovînîstiya xwe ta niha di dîroka tevgera siyasî de nasdar e.

Piştî ku H.Elesed mir, diyar bû ku serokê nû Dr.B.Elesed û bi layingirên xwe ve tu giringî nedidan E.H.Xedam û hêdî, hêdî destên wî di rêvebirîya dewleta Sûriyê de kurt bûn, nirînên E.H.Xedam yê cuda tu carî jî civaka siyasî re ne bi dizî û ne jî eşkere ne hatibûn diyarkirin. Di rastiye de, ew di biryarên dewleta "Bes" de herdem bi çalakî beşdar bû.

Piştî ew bê hêvî dimîne, ew direve Ewropa, vêca li vir xwe mîna rikberê dewleta Sûriyê dide xûyakirin, bê guman jî, li gorî texmînan perên wî bi Bilyonan di Benkên ewropî de henin...Bi kurtegotinekê E.H.Xedam di vê (Eniya Rizgariya Niştimanî) de nûnertiya şepêla erebperestên nijadperest dike û weke me gotiye: Ew bi ser vê de jî hîn xawên dîokeke tarî ye .

Elî Sedir Elbeyanonî mosliman, erebperest û riçperest e, partiya wî jî mîna partiyên din olperest û erebperest ta niha naxwaze bi gelê Kurd û bi welatê Kurdan yê di nav çar dewletan de hatiye parvekirin, nas bike.

Lê di vê dema dawiyê de li gor heyama siyasî ya nû, ev herdu şepêl û li gor hin berjewendiyên hevbeş têkeliyên xurt bi hev re ava kirin, bi ser vê de jî ewanan dixwastin têkeliyan bi tevgera Kurdî li Kurdistana Rojava û li dervayî welêt bikin û ew hîn jî bi awayên xwe yên taybetî di vî warî de berxwe didin, lê di encama bizava van herdu şepêlan de, siyasetmedarê Kurd, Selah Bedir Dîn jî mîna kesayetiyeke serbixwe dibe hevalê van heru şepêlan.

Zayina (Eniya Rizgariya Niştimanî)bi serpereştiya van her sê navên jorîn ji ber van sedemên jêrîn dengvedanek, ne cihê pesnê di nav hêzên dêmokrat û gelê Kurd de çê kir.

!-Dîroka kesayetiya Ebdil Helîm Xedam û ramanên wî yên kevneperest.

2-Helwesta neyênî ya (Civata Mislimanên Bira) li hember mafên gelê Kurd yên rewa.

3-Selah Bedir Dîn mîna kesayetiyeke serbixwe nikane bi tenha xwe û bê hevkarîya hêzên Kurdî li Sûriyê bibe dengê gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê.

4-Ne beşdarbûna partiyên Kurdî yên sereke di hundir vê (Eniyê) de .

5-Ne beşdarbûna hêzên Erebi dêmokratîxwaz yên Sûriyê.

Li gor ku em belge û daxûyniyên vê (Eniyê) dişopînin, ta niha em gihane van encamên jêrîn.

"Eniya Rizgariya Niştimanî" bersiva vê pirsaxwe, ( Projeya Niştimanî ya Guhertinê) çî ye?. Bi vî awahî dide; armanca niştimanî ya guhertinê, divê avakirina Sûriyê mîna dewleteke şaristanî û nûjen be, ew dixwaze bi aştiyane desthilatê bi dest xwe ve hûne, û ew (Pirojeya Guhertinê...) dê hemwelatiyê bike bingeh ji bo maf û erkan...."

Bê guman her kesek dêmokratîxwaz û mirovperwer dixwaze hemû dewletên cîhanê bibin dewletên bajarvanî û nûjen, armanca me jî ew e ku Sûriyê bibe komareke nûjen, rêzê li yasa û destorên navnetewî bigre, lê pirsgerêka herî mezin ew e ku gelek partî, rêxistin, dewlet li cîhanê henin ku her yek ji wan fîstana dêmokratîyê û nûjeniyê li gorî bejna xwe dibire û wê li xwe dike, wek nimûne, pir caran hevalên Ebdil Helîm Xedam, mîna serokê Sûriyê yê berê û yê niha jî, nirîna jorîn ji raya giştî re çespendine. Dêmokratîxwazên resen û nameze nûnerên tevgera Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bi çavên zor pêgumankirî li pêşeroja fîstana dêmokratîya E.H.Xedam û Elî Sedir Elbiyanonî temaşe dikin.

Ji ber ku ev herdu şepêlên jorîn pir mixabin weke pir hêzên erebperestên şovînî nikanin Kurdên Kurdistana Sûriyê mîna mileteke serbixwe û xudan erdeke dêrînî bipejrînin û hîn nûh û li gor dêmokratîya xwe dixwazin gelê Kurd weke kêmetewekê li Sûriyê bibînin..., vêca em nizanin

avakirina Sûriyeke nûjen û şaristanî li ku derê ma? Ma gelo şaristanî, gelan dipêşêve ? lê dîsan E.H.Xedam û E.S.Elbeyanonî li gorî xwe jî peyva şaristaniyê şirove dikin???Ne xêr, li gorî em dibînin ku peyva şaristanî mîna pir peyvên din,(gel, netew,dewlet,dêmkokratî,azadî, mafê çarenûsî,welat) û h. w. d. peyveke zanistî ye, pêwîst e wateya wê li hemû welatan mîna hev bin, eger ne weh be, dê tu astengî yan kêşe li cîhanê çareser nebin...

Dîsan di bersiva pîrsa jorîn de bi vê wateyê hatiye; ku dewleta E.H.Xedam û Elî Sedir Elbeyanonî ya nûh dê ne hemdem xwe li ser destura sala1950 hilpesêre.

Hemû siyasetmedar û ronakbîrên Kurd dizanin ku mafê gelê Kurd yê dadmend di wê desturê de jî ne hatibû terxandin û gelê me hîn di wê demê de bîndest bû û ji mafên xwe yê netewî bê par bû. Li vir em dîsan ji nûjentiya E.H.Xedam û E.S.Beyanonî matmayî dimînin û herweha jî em dixwazin ji wan pîrs bikin; ji bo çî (Eniya Rizgariya Niştimanî) naxweze destureke nûh pêşkêşî gelên Sûriyê bike ? .

Di Daxûyaniya dawî ya kongira damezrandinê de weha hatiye;( Partiya Bes) yek ji qorbaniyên rêcîmê ye .."ji ber vê jî (Eniya Rizgariya Niştimanî )bang li Besiyan dike ku ewanan xwe tev cemawerê gel bikin, ta ku Sûriyê ji rêcîma zordar rizgar bibe ..." , her dîsan divê setemkariya ku li hemwelatiyên Kurd bûye, ewên ku bi me re di welêt û çarenûsiyê de hevbeş in, divê ew zordestî ji holê rabe û pêwîst e encamên wê setemkariyê jî di çareçewa yekitiya

niştimanî û mafên hemwelatîyê de werin çareserkirin..."

Ji van gotinên daxûyanîyê de rind diyar e ku Ebdil Helîm Xedam hîn li ser rêç û ramana Mîşîl Efleq û Zekî Elersozî diçe, tevî ku em hemû dizanin ku partiya Bes bi seroketiya Dr.B.Elesed serdariya dewletê dike, lê hîn ew bê dudilî dixwaze partiya Bes li Sûriyê xurtir bibe, lê bila vê carê jî, dewleta Sûriyê bi seroketiya wî be û li ser rêbaza partiya Bes be. Em bawer dikin ku rêbaza partiya "Bes" bi naveroka xwe ya nijadperestî û kevneperestî di qada siyasî de pir zelal e. Lê Ebdil Helîm Xedam dîsan dixwaze çerxa demê şunde bizivîrîne .

Em gelek kes dixwazin ji wî û ji kesên mîna wî re bêjin, çi cidabûn di navbera wan û serdarên Bes li Sûriyê de henin, ma ne hûn hemî besîn e ?? Ma ne partiya Bes pirtirî 40 salî li ser textê dewletê yan li ser singê gelê xwe danîştiye ??? Vêca ev keftûlefta wan û yên bi wan re digrin, dê ta kîjan radeyê bi encamên erênî bin ? Nemeze em ta niha nabînin ku ewanan bi çavên rexneyî li partiya xwe temeşe kirine.....!!!!

Di naveroka daxûyanîyê de hîn bi vê wateyê hatiye nivisîn " Eniya Rizgariya Niştimanî" ji dezgeyên asayşê û bi taybetî ji efseran dixwaze ku ewanan bi berpirsiyariyeke niştimanî û sincî hest bikin, bila ewanan fermanên destên gemarî bi cih nînin ..., û berdewamkirin di vî karî de, yanê ewanan di tawanbarên rêcîmê de hevbeş in .." Bi rastî em li vir komêntara xwe pir dirêj nanivîsîn,

lê tenê emê bêjin, belê, kî fermanên serdarên gemarê û zorker bi cih bînîn, yanê ewanan jî tewanbar in, lê eger Ebdil Helîm Xedam bi dehên salan di vê rêcîmê de serdar, xawên biryar û ferman bû, yanê ewa bê hestên niştimanî û sincî bû û tewanbarê gewre bû, eger ne weha bûya, çima ewî dikanî ewqas salên dirêj li ser sîngê miltê Sûriyê rûništa ???!

(Eniya Rizgariya Niştimanî ) li hebûna kêşeya Kurdî li Sûriyê pir nizim temaşe dike, wek nimûne;navê Kurdan mîna miletekî serbixwe di daxûyaniya kongira damezrandinê de(4-5/6.2006 nehatibû, herweha jî E.H.Xedam di peyava xwe ya di wê kongirê de xwendiyê, gotina "Kurd" jî ne ji dur û ne ji nîzîk anîbû zimên.

Erê, Elî Sedir Elbeyanonî di cihekî de weha gotiye: Pêwîst e gelê Kurd li Sûriyê hemû mafên xwe bibe, lê ew vê gotina xwe bi zelalî ronî dike û dibêje: lê divê hemwelatî bingeha mafdestxistinê be ....". Ew hîn berdewam dike û dibêje: Mafê her netewekê ye li Sûriyê, ku rola xwe mîna yên din li welêt hebin û ji mafên van kêmtewan e ku taybetmendiyên xwe bi zimên, çand û dîroka xwe derbibirin .. , bila zimanê wan di dibistanên wan de werin xwendin ....., lê em li dijî perçe bûnê ne .."

Eger em dîsan kûr li peyvên Elî Sedir Elbeyanonî jî binêrin, dîsan ji me re gelek ronak e ku ew bi peyv û bêjeyan dilîze, û naxweze ku gelê Kurd li Kurdistana Rojava mafên xwe mîna neteweke serbixwe bistîne, û ew mafên Kurdan li ser bingeha hemwelatîyê diçespîne..

(Eniya Rizgariya Niştimanî) mîna hemû erbeperestên nijadperest naxwaze dîroka gelê Kurd ya kevin û ya nûh nas bike, yan jî ewa bi mebest û armancên xerap mêjoya gelê Kurd bincil dike, û rola hevpeymanî Sayiks –Pîko di sala 1916 an de di dabeşkirina Kurdistanê de nabîne .

Piştî ku (Eniya Rizgariya Niştimanî) kongira xwe ya duhem li dardixe, ewa di daxûyaniya dawiyê de dibêje: Gelê Kurd li Sûriyê bi me re di welêt û çarenûsiyê de hevpar in ..."lê dîsan wê "Eniyê " di bernama karê xwe ya duhatî de weha dinivîse: "Divê di destura dewletê de rêdan ji hemwelatîyên Kurd re hebe ku ewanan çanda xwe bi kar hûnin û mafê wan hebe ku zimanê xwe di hînbûn, ragîhandin û çandinê de pêkbînîn..., mafên xwe yê siyasî di çarçewa yekitiya niştimanî de bi karhûnin.."

Bi nirîna me (Eniya Rizgariya Niştimanî) bi mebest xwe dixwe hevdişiyê, ango carekê ewa dibêje: "Hemwelatîyên Kurd " û careke din dibêje: "Gelê Kurd"ta ku di pêşerojê de li gor ramanên xwe bi van gotinên jorîn bilîze.. , lê ewa dîsan xaleke pir tirsdar di daxûyaniyê de gelek bi ronahî diterxîne û dibêje;"çespendina nasnama şaristaniya Erebi û Îslamî yê gelê Sûriyê..."

Em ji vê hevokê weha têdigînin ku nasnama netewî ya gelê Sûriyê, Erebi û Îslamî ye..."vêca em nizanin;kanî şaristanî û nasnama gelê Kurd li kuderê dimînin ??? Ma gelo ev ne tê vê wateyê ku (Eniya Rizgariya Niştimanî "ji niha de bi çarenûsa gelê me

dilîze û ewa berxwe dide ku bi hin gotinên xwe yê ne zelal nexwaşiyên ramanên xwe bi awakî ne hemdemî pirsan bike, lê em pir rind bawer in ku siyasetmedar û ronakbîrên gelê Kurd bi van lîstok û tektîkên nijadperestan nayên xopandin û dê ewanan bi çalakî çî li hundir "Eniyê" çî li dervayî "Eniyê" li dijî van hevok û peyvên dijber bixebitin û vîna gelê Kurd ya rastîn derbibirin.

Em dikanin di sebarete helwestên(Eniya Rizgariya Niştimanî " de li bermberî dewletên dirawsê mîna Libnanê, Îraq Îsraîl, Felestîn, Îran bêjin, ku ewanan bi piraniyên xwe helwestên erênî nin, baweriyên wê li li nik me bi awakî gelemperî ne cihê rexnê ne, tenê em dîsan di vê gumanê de ne ku (Eniya Rizgariya Niştimanî) helwesta xwe li ser kirîza Îraqê ne ewqas zelal dide diyarkirin, ewa dibêje: Pêwîst e xwîn li Îraqê ne herike û bila Îraq yekitiya xwe niştimanî li gel erdê û millet ve vegeîne .." Di vir de vepirsîna me ev e; ma çima xaka Îraqê niha ne yek e? Ma niha komara Îraqê ne fêderal e ..?? Lê ev (Eniya) dixwaze bêje: Gelê Kurd, Îraq perçe kiriye û destlata wan cida ye!!?? . Bi rastî divê mirov li ser van peyvên "Eniyê" bi hurgilî raweste, çimkî ev herdu şepêlên damezrêner ne ewqas cihê baweriyê ne. Li aliyê din, em jî li dijî şerê navxûyî ne û bi tundî jî karên têrorîstî û layingirên wan şermeze dikin, em piştvanîya komara Îraqê ya fêderal dikin. Lê dîsan têbîniyeke me din giring û balkêş li ser helwesta vê (Eniyê) derbarê têrorîstên Usame bin Ladin û destdirêjîyên hin dewletên dirawsê heye;ev (Eniya) di belgeyên

xwe de, rîxistina " Elqaîde ". û dûvkên wê yên ku roleke pir mezin di xwînherkandina gelê Îraqê de dilîzin, ne cersandiyê, lewra jî em guman dikin ku siyaseta "Eniya Rizgariya Niştîmanî" ji bilî Kurdan û siyaseta hin dewletên mînaTurkiyê, Îranê û Sûriyê rastî hev hatine û helwesteke hevbeş neyênî di wan de peyda bûye.

Piştî ku me bi kurtî wêneyeke siyasî ya vê "

(Eniyê) pir ji çavên xwe ve nîzîk kirin, û me hemû nirînên wê yên neyînî dîtin, dîsan em dixwazin ji xwe û ji hemû Kurdistaniyan pirs bikin; eyan eger siyasatmedarên Kurd di nav hêzên weha kevneperest û nijadperest de têkoşînê bikin yan na !  
?????

Li gor nirîna me, her miletek, yan her tevgerekê taybetmendiyan xwe henin, heyam û rewşa siyasî ya ku gelê Kurd ku tê de dijî, pir dijwar û nemaze ye. Miletê Kurd bi sedsalan bindestî dîtiye û hîn jî li sê beşên din setemkariyê dibîne, piraniyan hêzên milletên serdest jî li ser kêşa Kurdî û mafên gelê Kurd yên rewa pir zû bi nirînên destladarên dewletên xwe re dibin yek. Di vir de em pir caran cudabûnên mezin di helwestên serdarên van dewletan û hêzên rikber dermafê gelên bindest de nabînin, nimûneyên me jî gelek in; eger em tenê li hundir Sûriyê temaşe bikin, dê pir mînakên geş werin ber çavên me, kanî em li bername û rêbazên mîna van partiyên jêrîn temaşe bikin, hemû partiyên komonîst li Sûriyê, hemû partiyên Nasrî li Sûriyê, hemû dezgehên bajarvanî li Sûriyê û sed carî

mixabin hîn naxwzin bi nirînên nûjenî û dîrokî li gelê Kurd binêrin, hîç partiyek ji van partiyên jorîn naxweze Rojavaya Kurdistanê di çarçewa Sûriyê de bipejrîne, lê ewanan xwe ji partiya destlatdart baştir dibînin û bi navê dêmokratîyê, azadiyê û mirovperweriyê dipeyvin û di vê dema dawiyê de ewanan li gorî hin berjewendiyên xwe pir dixwazin bi tevgera Kurdî re diyalogan bikin, vêca eger em ji diyalogan birevin, danûstandinê li gel wan nekin û dîroka milletê xwe, armancên gelê xwe, mafên gelê xwe bi şewakî zanistî bi hulumên berferh bi berxwedanên pîdarî ji wan re nedin xûyakirin û doza xwe bi wanan hêdî hêdî nepejrînin, yanê em bi xwe deriyên danûstandinan bigirin, ew tucarî ne li gorî sud û kêrhatiyên gelê Kurd e.

Bi wateyeke din ez dixwazim weha vepirsînekê bikim, ma gelo, eger partî, yan rêxistinên Erebbî bi tewawî yan bi tomî piştgiriya doza me nekin, kanî em çî bikin ? Ma li pêş tevgera me ji bilî diyalog û danûstandinan, rêkên din henin ?

Almaniya, 30.09.2007. Malperên welatî net û Pena Kurd .

.....

## **Çirûskek ronahî li ser hin kongir û konfiransên penaberên**

### **Kurdistana Rojava li dervayî welêt**

Piştî rûxandina rêcîma dîktetur di 9.04.2003 an de hêviyên hêzên dêmokrat û gelên bindest mîna gelê Kurd bi pêkanîna azadiyê her pirtir bûn, lewra jî penaberên Erebi ji Sûriyê û penaberên Kurdistana Rojava gelek bizavên rêxstinî li Emêrîka û li Ewropa û bi razemendiya hukümetên wan welatan kirin. Helwestên destlatdarên wan welatan hîn gelek di paş perdên mijan de şermok û hezhezokî ne, ez nikanim hîn baweriya xwe bi dêmokratî û mirovperweriya Emêrîka û welatên Ewropî bînim, lê ez pir înan dikim ku berjewendiyên aborî û darayî li nik wan mîna ku dîroka wan kevin û ya nûn çespandiye, armanca sereke û pîroz e. Tevî van rastiyên jorîn penaberên Erebi û Kurd dixwazin ji bo dêmokratiyê û serbestiya gelê Kurd berxwe bidin, konfirans û kongiran li darxînin û hinekî balên wan ber kêşa dêmokratiyê li Rojhilata Navîn de pirtir bikşînin.

Di 12-13 . 03. 2006 an de kongirek di avahiya Encumena perlementerên Emêrîkî li Waşontinê bi serpereştiya Dr. Şêrko Ebas hate bestandin. Nûnerên piraniyên partiyên Kurdistana Rojava li Ewropa di vê kongirê de beşdar bûn. Hin endamên kongirê bi hin berpirsiyar û siyasetmedarên Emêrîk re li ser doza dêmokratiyê û pîrsa Kurdî li Kurdistana Sûriyê gufete gu

kirin.Li gor baweriyên min Emêrîka dixwast hin aliyên xwe bi du cureyên siyasî nîşan bide1-Pêşbîniyekê bi Kurdên Sûriyê re çêke, helwest, radeya Kurdên Sûriyê û hêza tevgera Kurd li Sûriyê ji nîzîk û rasterast nas bike.2-Ewê dixwast ji nûnerên Kurdan re bêje: ku Emêrîka ne mîna berê ye, û ewa dixwaze piştvanîya dêmokratîxwazan û gelên bindest bike û li gor vê yekê jî ewê dixwast û hîn jî dixwaze gelê Kurd bi siyaseta xwe ya dervayî bawerkirin bide.Ev li aliyekî li aliyê din, ewê dixwast û hîn jî dixwaze bi destlata Sûriyê re bêje: Eger tu siyaseta xwe li gor berjewendiyên me li Rojhilata Navîn nekî, vaye em kanin yekser sê milyon Kurd, hin rêxistin û kesayetiyên din Erebi li Sûriyê li dijî te bilivînin.

Dîsan di vê perawîzê de "Kongira damezrandina Encumena Niştîmanî Kurdistanî-Suriyê) di meha Hizêranê, sala 2006 an de li Biruksêlê û dîsan bi serpereştiya Dr.Şêrko Ebas hate damezrandin.Lê partiyên " Hevbendiya Dêmkokrat " û hin partiyên din ji ber sedemên siyasî û tektîkî di vê kongirê de beşdar nebûn û di encama vê kongira jorîn de heyamek siyasî û rêxistinî di navbera rêvebirên vê kongirê û pêşengên bizava Kurd li Sûriyê de peyda bûn, ji ber ku rêvebirên wan kongiran dixwastin bernamên xwe yê siyasî derbarê çareserkirina kêşa Kurdî li Sûriyê û şeweyên têkeliyên bi welatên derve re li gor bawerî û zanînen xwe bimeşînin, lê li aliyê din pêşengên partiyên me li Sûriyê tu carî nikanin vê yekê ji penaberên dervayî welêt bipejînin, ku ewanan li derve û dûrî rewşa heyî li Sûriyê rêbaza siyasî ji tevgerê re amede bikin, lewra jî bi ya min be tu carî kongirên weha bê razemendiya pêşengên partiyên Kurdî li Sûriyê nikanin serkevtî bin.

Hin nûnerên tevgera azadîxwaza Rojavayê Kurdistanê bi bawerî li siyaseta Emêrîka ya dervayî temaşe kirin û beşekî din ji tevgerê bi çavên gumankirî li siyaseta Emêrîka nirîn û hîn jî weha li helwesta wê ya li gor berjewendiyên xwe guhêzbar dinêrin.

Dîsan li gor pêşniyaz û bi alîkariya du kesayetiyên welatparêz û serbixwe Dr.Alan Emonê û rêzdar Ciwan Simo konfiransa duhem di 16.03.2007 an de ji bo pêkanîna yekitiya hêzên Kurdî, yeknirîna siyasî û avakirina lêvegerek Kurdî ji rêxistinên Kurdî li dervayî welêt re li Parîsê li darxistin. Li gor nirîna min;ev konfiransa di warê rêxistinî de li gor yên din pirtir serketîbû, ji ber ku nûnerên sê navendên sereke ji tevgera Kurdistanê Sûriyê li dervayî welêt 1-( Hevbendîya Dêmoqrata Kurd), 2-(Eniya Dêmoqrata Kurd ), 3-(Komîta Hevgirêdanê) û hin kesayetiyên serbixwe li vê konfiransê û bê destdirêjîyên dewletên biyanî beşdar dibin.Di dawîya konfiransê de, nûnerên partiyên Kurdî li dervayî welêt bi yeknirîn daxûyaniyeke dawî radigihînin.Di daxûyaniyê de hemû partî pir bi zelalî beşa çarem ji Kurdistanê bi navê Kurdistanê Sûriyê bi nav dikin û li gor vê rastiya dîrokî jî;partiyên Kurdî li dervayî welêt di daxûyaniyê de 13 xalên giring xwastine pêkbên. Xalên gelek balkêş ev in 1-Li gor yasa û belgeyên navnetewî divê mafê çarenûsî ji gelê Kurd li Kurdistanê Sûriyê re hebe.2- Pêwîst e tevgera Kurdî li Sûriyê bi yeknirîn lêvegereke Kurdî ava bike.3- Divê diyalogên Erebi -Kurdî ji bo bi cihanîna berjewendiyên herdu gelan û kêmetewên din li Sûriyê pêşda biçin û ewanan hîn jî ferehtir û kurtir bibin.4-Divê tevgera Kurdî alîkarî û piştvanîya têkoşînên bizava Kurdî li beşên din jî bike û

têkeliyên Kurdistanî li ser bingeha rêzlihevgirtinê û li gor taybetmendiyên her beşekî pêşda bibe. Herweha jî di daxûyaniyê de hin daxwazên din nirxbuha cihên xwe dîtine. Li dawiya konfiransê komîtekek ji 4 nûnerên partiyên

Kurdî û kesayetiyek serbixwe ji bo danana destura lêvegera Kurdî li dervayî welêt di nava şeş mehan de destnîşan bûye.

Di nirînên min de daxwazên konfiransa Parîsê di cihên xwe de ne, lê pirsgirêka siyasî ya herî mezin li nik vê konfiransê ev e; ku ewa dixwaze lêvegere Kurdî li dervayî welêt bi bernameke siyasî cudayî an dijberî daxwazên piraniya hêzên tevgera Kurdî li hundir welêt damezrîne. Ango tevgera azadîxwaza Kurd li Kurdistanê Sûriyê bi du rêbazên siyasî li Rojhilata Navîn û li dervayî welêt xwe bide nasîn. Ji ber ku em hemî dizanin Ku (Hevbendiya Dêmkrata Kurd) û (Eniya Dêmkrata Kurd) ta roja îro hîn nikane bi zelalî û eşkere bêje: Ku gelê Kurd li Kurdistanê Sûriyê ye, yan li Rojavayî Kurdistanê ye. Di baweriyên min de ewanan hîn ne amede ne ku navê Kurdistanê ya erdnîgarî û dîrokî bi zelalî di bername û rêbazên xwe de biçespînin. Lê divê ez vê dijberiyê di bernamên van hêzên siyasî de jî li vir sercil bikim; ewanan di bernamên xwe de pir zelal dinivîsînin ku piştî hevpeymanê Saykîs – Pîko (1916) Kurdistan di nav çar dewletan de parve bûye û ewanan weha dinivîsînin; 1- Kurdistanê Turkiyê. 2- Kurdistanê Îranê. 3- Kurdistanê Îraqê. 4- lê li Sûriyê. Her weha jî ewanan pir caran jî bi zelalî dibêjin: Kurd li Sûriyê bi hezaran salan li ser axa xwe dijîn. Eger hemû partiyên me dibêjin: Kurdistan çar beş in; vêca ez nizanîm çî wate ji veşartina navê Kurdistanê Sûriyê re li nik Ereban maye???, ji bilî vê

rastiyê, çar û pênc qenalên TV Kurdî û sî ta çel partiyên Kurdistanê gelek vekirî di weşanên xwe de û bi zimanên milletên serdest dibêjin: Kurdistana Sûriyê, yan Kurdistana Rojava û ewa jî ji mafên wan yên rewa ye ku beşa çaremîn ji welatê xwe mîna beşên din bi Kurdistan binav bikin. Dîsan ez dipirsim; wateya veşartina navê Kurdistanê li Sûriyê li ku ma ye ?? Ez hîn dixwizim vê vepirsînê jî ji têkoşerên tevgera me li Kurdistana Sûriyê bikim; eger partiyek yan endamek ji " Ragihandina Şamê " ji serokên tevgera Kurdî bipirse; we di bernamên xwe de nivîsîne; Kurdistan di nav çar dewletan de parve bû ye; ji keremên xwe ji me re diyar bikin, ku beşa çaremîn li ku dikeve? Ez nizamim serokên me, dê çi bersivan bidin, lê ewanan nikanin bêjin: Beşa çaremîn li Pakistanê yan li Afxanistanê ye !!!! Dîsan wateya veşartina Kurdistana Sûriyê li nik tu kesî namîne. Eger partiyên me li Kurdistana Rojava ji vê pirsgirêkê xwe rizgar nekin, dê herdem aloziyên mezin li pêş damezrandina lêvegereke Kurdî peyda bibin, û tevgera me ya dadmend nikane bi yekdeng û bi yeknirîn têkoşîna xwe ne li hundir welêt û ne li dervayî welêt bike. Xala duhem û zor giring dîsan ev e; ku piraniyên partiyên me mafê çarenûsî ji gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê re naxwazin. Li gor van herdu rêxistinên "Hevbendî" û "Enî" daxwaza mafê çarenûsî daxwazek giran e û axivtin li ser wê di rojên îro de aloziyên siyasî mezin li pêş tevgerê çê dike. Li aliyê din, weke li jor hate dît ku nûnerên piraniyên partiyên me li dervayî welêt du çaran dijberî bernamên xwe yên siyasî biryar istandine. 1- Kurdistana Sûriyê 2- Mafê çarenûsî ji gelê Kurd re. Bi vî rengî, tevger me li welêt xawêna bername û rêbazeke siyasî ye û ewa li dervayî welêt xawêna bernameke siyasî

cuda ye!Vêca li vir hêzên dêmokratîxwaz li Rojhilata Navîn û li Ewropa, dê xwe li ser kîjan bernameya siyasî hilpesêrin?Ma gelo ev dijberiya ne nîşana nizimbûna asteya siyasî li nik tevgera me ye? Ma gelo lêvegereke Kurdî siyasî divê li Rojavayê Kurdistanê destpêbike yan li li dervayî welêt ?Ma gelo em Kurdên dervayî welêt peyrewên tevgera xwe li Kurdistanê ne?Yan Tevgera me li welêt peyrewa Kurdên dervayî welêt e?

Bila tu kes ji min şaş têngihîne ku ez dibêjim: Bila Kurdên dervayî welêt nirîn û daxwazên xwe dernebirin, yan ewanan ji bo gelê xwe têkoşînê nekin ! Ne xêr! Mebesta min ev e; ku em li dervayî welêt bê pêşengên partiyên xwe li welêt nikanin rêbazeke siyasî cuda û li gor baweriyên xwe biterxînin û li ber ronîya wê xebatên xwe berdewam bikin.Em tenê kanin nirîn, pêşniyarên xwe ji partiyên xwe re derbibirin, berevaniya helwest û baweriyên xwe bi devkî yan bi nivisîn û bi awakî bajarvanî bikin û em hemî bi demê re bê pozbilindî sudan ji hev wergrin û bighînin yek bawerî.

Li dawiyê ez dîsan dixwazim dubare bikim, bizava tevgera me li dervayî welêt rewa û dadmend e, ewa beşeke giring e ji tevgera me ya giştî, divê bi her awayî têkeliyên xwe bi hemû rêxistin û dewletên dêmokratîxwaz re xurt bike, û bi hişmendiyeke siyasî, şehrezayî û bê ku xwe bike qurbana lîstik û tektîkên vî welatî yan wî welatî, xebatên xwe bi çalakî berdewam bike .

.....

**Dabeşbûna tevgera me li Rojavayê Kurdistanê  
bi destên me bû  
û hêzkirina bizava me jî bi destên me ye**

Ramangirê Ereb Prof.Dr.Burhan Xelyon dibêje:

" ÇARENÛSA ME NE LI SER ENIYA ME HATIYE  
NIVSÎN;

LÊ EWA BI DESTSÊN ME ÇÊ DIBE: "

Bê serdorên dirêj ez dixwazim yekser li ser çarenûsa gelê Kurd û welatê me Kurdistanê rawestim. Di pêvajoka dîrokê de ji ber dewlemendî û samanên Kurdistanê, yên li ser erdê û bin erdê, welatê me her dem bi destên neyaran, dagîrker bûye. Ewa bi destên neyaran çend çarkî hatiye dabeşkirin û bi destên dijminan samanên welatê me hatine dizîn, ta niha jî li sê beşên din jî ji aliyên destladran de têtin dizîn, gelê Kurd bê vîna xwe û bi darên zorê ji dewlemendiya xwe bê par maye.

Çarenûsa gelê me ta roja îro bi giraniyek pir mezin bi destên biyaniyên dirawsê û paşê bi destên koledarên Ewropî hatiye destnîşankirin, ango mîna ku li jor Dr. Burhan Xelyon nivisiye: "Çarenûsa me ne li ser eniya me hatiye nivisîn; lê ewa bi destên me çê dibe ..". Yanê çarenûsa gelê Kurd jî li ser eniya gelê Kurd û li ser eniya Kurdistanê ne hatiye nivisîn, ewa bi destên dijminan, koledaran hatiye parvekirin û bindestkirin, lewra divê ewa bi destên me jî bête azadkirin.

Gelê Kurd di jiyana xwe ya siyasî û netewî de ji hemû milletên hawîrdoren xwe û ji gelên cîhanê re mêlg kiriye ku ewî bi destên xwe, bi hêzên xwe, bi xûna xwe pir ji bo çarenûsa xwe berxwedan kiriye û hîn jî ew bi hemû kanînen xwe di vê riya pêroz de bi pîdarî berdewam e .Di nirîna min de riweştên herî giring û baş ku mirovê Kurd kane xwe pê serbilind bibîne ew e, ku ew yekcarî nikane zor û setemê bipejrîne û ewa bê sênor baweriya xwe bi azadiya xwe tîne, ev rastiyên erênî dîroka gelê me xemlandine, lê pîrsgirêkên herî mezin li nik me, ne başbûna karên rêxistinî û dabeşkirina trevgera me ne.

Di vir de ez naxwazim li ser aloziyên rêxirawî li beşên din ji Kurdistanê rawestim, lê ez niyaz dikim ku ez bi çend rêzkên sakar dîsan rewşa tevgera me di warê rêxistinî de di ber çavên me re derbaz bikim. Yanê cerkî (Partî Dêmkorati Kurdisanê) li Sûriyê di 14 Hizêranê, sala 1957 an de hatiye damezrandin, ne bi xêr cara yekem partiya me di sala 1965 an bûye du beş, di sala 1972 an de bûye sê partî û paşê her çend salan her patiyek ji van partiyên dubare yan sêbare bi destên me hatiye perçe, perçe kirin, li dawiyê mîna ez zanim ta niha hejmara wan bi partiyên biçûk ve gihane 14 partiyên.

Me berê ji gelê xwe re digot: Ev partiya yemînî ye (rastgir e) ya din yesarî ye (çepgir e), ya sisiyan Berzanî ye, ya çaran serbixwe ye. Belkî di wê demê de pir kesan dikanîn bi hêsanî baweriya xwe bi vê partiyê yan bi wê partiyê bihanîna, lê piştî ku her yek ji van partiyên bûye çend beş, vê carê gelê me bi sanahî jî riya xwe di warê rêxistinî de şas dike, bi sed hezaran Kurperwer ji hev û ji endamên partiyên vekirî dipirsin û dibêjin: Eger partiyek rastgir e, ya din çepgir e, ya sisiyan Berzanî ye, ya çaran

serbixwe ye, lê partiyên din çin e ??? Vê carê berpirsiyar, kadêr û dostên partiyan destên xwe li sîngên xwe dixistin û digotine gelê xwe: Em çepê li ser riya zanistiyê ne, çepên din keysebaz in û ji riya Lênîn û Markis derketine.

Partiyên din jî digotin: Ev partiya bi dewleta Sûriyê ve girêdayî ye, û pêwendiyên pêşengên wan yekser bi dezgeyên asayêşên Sûriyê re henin, hin partiyan jî li ser partiyên din digotin: Ewanan bi Berzanî ve besta ne, ewanan bi fermana wî li Sûriyê dixebitin. Li vê dawiyê jî dîsan hin partî hatine holê û ewanan li ser yên din dibêjin: ev partiyan li Kurdistana Sûriyê naxebitin û ewanan nikanin pîrsgirêka Kurd li Rojavayê Kurdistanê çareser bikin.

Lê weke her kesek îro dizane piştî rûxandina sêstêma sosyalîstiyê baredoxa siyasî li cîhanê pir hatiye guhartin, heyama nûh bandora xwe li ser hemû têkoşînên siyasî kiriye, lewra jî hin partiyên me nav û bernamên xwe jî guherîn, dîsan niha partiyek bi ya din re nikane bêje. Tu rastgir î yan tu çepgir î, ango ev astengiya ramanî, eydeliyocî ji holê rabûye .

Lê tevî van guhertinên nûh, dîsan partiyên me pir bûn, ez dixwazim li vir çend sedemên serke hûnim zimên 1-Ez bê peraw û vekirî dibêjim: Nizimbûna pileya rewşenbîriyê û ramanê li nik pîr siyasethêrdarên tevgera Kurdî. 2-Ezeziya bilind, yan xwehezkirina pîr mezin li nik gelek rêvebir û kadiroyên partiyên me . 3-Gelek pêşeng û rêberên partiyên me, ji ber nexwêsiya ezeziyê nikanin yan naxwazin fersendê bidin niweyên îroîn û ewanan bawer dikin ku ew herdem mamoste û zana ne, tevî ku ji me

hemûyan re baş diyar e, pir endamên partiyên di rêxistinên xwe de di rêzên paşîn da ne, lê ewanan ji rêberên xwe yê rêxistinî pir şehrezatir û ronakbîrtir in.4-Gelek caran pêşengên partiyên me çavtengiyên li rewşenbîrên siyasî, yan li pisporên pêşeyan dikin û naxwazin wan li rex xwe, yan car caran jî li jor xwe bibînin ..5-Pir ronakbîr û bîrewerên me jî hene bê dadmendî xwe di ser partiyên, yan xwe di ser tevgera xwe re dibînin, xwe ji partiyên dîrdixînin û newêrin rexnên xwe jî vekirî arastî tevgerê bikin, yan destên xwe aşkere deynin ser nexweşiyên keysebaziyê, nezaniyê, ezeziyê, yan dîkteturiyê û h.w.d.6-Du sê partiyên me li Rojavayê Kurdistanê henin, belkî ta radeyekê li ser tektîkên xebat û çalakiyên rojane di hundir Sûriyê de ne lihev bin, lê dîsan jî bi ya min be cudabûnên pir mezin di navbera wan de tune ne.7-Dijwarbûna surûştê doza Kurd bi awakî giştî.

Eger serok û merokên me kanibin xwe ji van rûdawên neyinî û zor tirsdar rizgar bikin, belkî tevgera me kanibe xwe ji gelek aloziyên rêxistinî rizgar bike, dê hejmarên partiyên û martiyên li nîk me kêmtir bibin, dê baweriya gelê me bi tevgera xwe xurtir bibe û dê bizava me di cîhana siyasî de kanibe pirtir û rindtir xebata xwe bidomîne .

Tu kes ji me nabêje: Bila hemû partiyên me bibin yek partî, ne xêr!!ê em bi hezaran welatparêzên Kurd bi dengên bilind bang li partî û kesayetiyên ku mîna hev diramin, bi zûtirîn dem xwe bighînin hev, dema me niha pir nazîk e, pir giring e, xebat ji bo dêmokratîyê, azadiya gelan û mafên mirovan berdewam e. Li aliyê din, rûya zordarên gelê me di nav siyaseta Rojhilata Navîn û cîhanê de reştir dibe, lewra jî divê partiyên me, kesayetiyên me

yên rewşenbîr, rêzanzanên serbixwe li xwe vegerin û bi kêmasî yên mîna hev diramin, bi tendurustiyeke ramanî û siyasî baş û bê nexweşiya ezeziyê û kursiyê dîsan werin cem hev û hejmarên partiyên gelê Kurd kêmtir bikin. Lê divê ez vê rastiye jî bêjim û li

gor ez dibînim, cerkî ku rêjîma sedamî hatiye rûxandin, stêrka gelê Kurdistanê Başur geştir bûye, helwesta herêma Kurdistanê ya netewî bi seroketiya pêşmerge qehreman serok Mesud Berzanî xurtir dibe, serok M.Berzanî namên yekser û ne yekser ji cîhanê û dewletên derdora me re pir bi zelalî dibêje: Mafê netewa Kurd heye ku dewletke xwe serbixwe hebe, û her weha jî dîsan dibêje: Emê piştvanîya xebata siyasî ya gelê Kurd li her sê beşên din jî bikin. Ev tun helwesta berpirsiyarene wireya siyasî û netewî li nik gelê Kurdistanê û li nik hemû welatparêzên Kurd bilind dike, baweriyên pir partî û cemawerê Kurd li her çar beşên Kurdistanê hîn bi serok Mesud Berzanî hêztir dibin, cimkî Mesud Berzanî û P.D.K li ser binaxa rêbaza siyaseta welatparêziya hişmendî ya nemir Mistefa Berzanî têkoşanên xwe netewî, têkeliyên xwe mirovane bi gelên dirawsê re dajon, û serok Mesud Berzanî rastiya rêbaza serokê nemir Mistefa Berzanî ji niştimanperwerên her çar beşên Kurdistanê re mêlag kiriye û ewa(rêbaza )bi sedên nimûyên jîndar li Kurdistanê, li Bexdadê, li Rojhilata Navîn û li nav dewlên (Yekitiya Ewropî) çespandiye.

Li ber ronîya van sedemên jorîn, pir partî û rewşenbîrên Kurdên Kurdistanê Rojav jî careke din li xwe vedigerin û dixwazin berjewendiyên gelê Kurd biparêzin û vîna mîletê xwe derbibirin, lewra jî em niha dibînin hin partî û ronakbîrên Kurdistanê Rojava vedigerin nik

partiya xwe ya dayik û hin jî niha li ser riya vegeerêne, ewanan dibînin ku P.D.K El-partî bi seroketiya têkoşerê navdar Mihemd Nezir xawên helwesteke siyasî cîwest e, partiyeke cemawerî ye, pêwendiyên xwe bi pir partiyên beşên din ji Kurdistanê re xurt in û bi taybetî ewa xwe mîna partiyek bira ji PDK li Kurdistana Başur dibîne û li ber sîtava nirîn û felsefa siyasî ya M.Berzaniyê pakrewan, siyasetên xwe li Kurdistana Sûriyê û siyaseta xwe ya dervayî jî dimeşîne.

Bê ku ez navên hin partiyan yan hin kesayetiyên ku li partiya xwe ya pêşîn vegeeriyane û yên dixwazin vegeerîn hûnim zimên, ezê bê dudilî bêjim: Ewanan gavên pîroz avêtine û davêjin, ewanan xwe ji hin pirsgerêkên saykolocî, siyasî, rêxistinî rizgar kirine, dixwazin hêza gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê xurtir bibe û roja serketin û azadiyê ji miletê xwe re nîzîktir bikin. Ji ber vê jî ez dixwazim bi boneya van xwelêvegerînên siyasî û rêxistinî gelê me û P.D.K –El -Partî li Rojavayê Kurdistanê pîroz bikim.Li aliyeke din ez hêvî jî dikim ku hin partiyên me, hin serok û sekretêrên me yên ku mîna hev diramin û şeweyên çareserkirina pirsê Kurdî mîna hev dibînin, bê dudilî refên xwe bikin yek, ji berku pêşeroja gelê Kurd tenê di van gavavêtinên erênî da ye, ew kesên ku niha ji ber sedemên ne rewê û diyardeyên ne tendurustî li pêş yekitiya hêza Kurd radiwestin, em neçar dibin ji wan re bêjin: Ewanan ji bo kursiyên xwe nikanin ji çar serokan, serokekî tenê derxin holê. Di vê derbarê de, ez hez dikim nimûnekê ji welatê Ereban hûnim zimên, dibêjin: Ji şalyarekî siyasetmedar pirsîn;te berê pir li ser yekitiya hêzan, yekitiya partiyan û yekitiya dewletên Ereban

dipeyvî û te derbarê vê mijarê de dinivîsand, lê cerkî tu bûye şalyar, em gotin û nirînên te yê berê ji nabîhsin ??

Siyasetmedarê Ereb weha pir eşkere û bi mêranî bersivand û got: Ma ez dînim niha li ser yekitiya hêz û partiyan û dewletan bipeyvim, eger dewletên Erebî bibin yek, cihê min dê li ku bimîne? Vêca ez pir ditirsim ku pir serokên me jî weha biramin, lê ewanan nikaninbin weha mîna şalyarê Ereb bersivên xwe vekirî bidin gelê Kurd.  
.!!!

Elmaniya , 18.04.2007.Malperên welatî net û Pena kurd .

.....

## **Dêmkraþiya**

### **dewletên sermiyandar zandar e**

Di dîroka serdem de diyar e ku welatên sermiyandar ji dehên salan de li gor pîvanên xwe li ser rêça dêmkraþiyê diçin. Lê li vir em dixwazin di sereta de nirîn û têgihîştina xwe li ser peyva dêmkraþiyê derbibirin. Em dibêjin ku peyva dêmkraþiyê mîna termekê yekgirtî ye, ewa perçeyeke ne şikestbar e û ewa ne bi du yan bi sê rûyan e. Ew dewletên ku dixwazin vê têgeha siyasî bi du yan bi sê rûyan bikin; ewanan nikanin li ser xwe bêjin: Em nûnertiyên welatên dêmkraþiya tomî û tewaw dikin.

Welatên sermiyandar li gor berjewendiyên xwe têgeha dêmkraþiyê ne bi awakî zanistî bi du aliyên sereke dabeş dikin; yekemîn ev e; dêmkraþiya hundir welatên xwe, duhem jî; dêmkraþiya dervayî.

Evan dewletan li ber xwe didin ku dêmkraþiyê hundirîn pêk hûnin, tevî ku em zanin jî, pileya pêkanîna dêmkraþiya hundirîn jî li nik hemû welatên sermiyandar ne wek hev bilind in, lê bi kêmasî ewanan berxwedidin gelên xwe li hundir welatên xwe bi riya hîlbijartina perlemanên xwe, ji xwe razî bikin û xwe mîna destlatên bajarvanî bi gelên xwe bidin pejrandin. Perlemanên dewletên sermiyandar bi awakî azadiyane û dêmkraþatî desturên welatên xwe amede dikin, partî û hêzên rikber jî dikanin nirînên xwe di weşanan de bê perwa û bi zelalî ji civakên xwe re binivîsînin. Bi ya me be jî, tevî ku mirov dikane dêmkraþiya hundirîn bi gelemperî bi

awakî erênî binerxîne, lê dîsan pêvajoka dêmokratiya hundrîn jî hin caran toşî hin kêşeyan dibe û ewa bi lêdana hin yasayên ne dadmend dermafên biyaniyan birîn dibe. Yanê em li vir diçespînin ku li hin welatên sermiyandar dêmokratî ne tenê bi du rûyan e, lê belê ewa niha bi sê rûyan e. Lewra jî em dikanin bi sanahî bêjin ku têgeha dêmokratiyê bi wateya xwe ya zanistî, siyasî û yasayî dibe qurbana berjewendiyên guhêzbar yên dewletên sermmiyandar.

Mebesta me di vê gotarê de danezanîna çawayetiya dêmokratiya dervayî ye. Siyaseta dewletên sermiyandar ya dervayî herdem li gor berjewendiyên xwe yên taybetî ne, dêmokratiya dervayî ya van dewletan pir caran di bin setema keysebazîya wan de dinale, ewanan bi rîya siyaseta xwe ya aborî rûya dêmokratiya xwe birîn dikin. Pirên caran ewanan piştvaniya dewletên setemkar û dîktetur li pênavê sûd û kelkên xwe dikin û temenên wan dewletan bi dehên salan dirêj kirine û hîn jî temenên wan dirêj dikin. Rêcîma dîktetur bi serdariya Sedam Husênê xûnvexwar di dîroka me ya nûjen de nimûnek e pir geş e. Emêrîka, Birêtaniya, Almaniya, Firansa û hin din ta beriya çend salan rêcîma Sedamî ji rûxandinê diparaztin û destên xwe yên dostaniyê pir kurt û pir bi haydarî dirêjî hêz û partiyên dêmokratîxwaz dikirin. Bi sedhezaran Kurd, Erebb û kêmetewên din dibûn qurbanên vê dêmokratiya birînkirî.

Îro jî dêmokratiya dervayî ya van dewletan dîsan bi du carna bi sê aliyan ne, niha ewanan li Îraqê, dêmokratîxwaz û azadîxwaz in, lê zimanên wan li hember siyaseta Turkiyê ya hundirîn kin in, ewanan çavên xwe li ser zepkirina mezintirîn beşê Kurdistanê û

bindestiya gelê Kurd û Ermenan digrin, tevî ku em zanin jî, ewanan hin caran li ser nebûna mafên mirovan li Turkiyê dipeyvin, lê ewanan naxwazin hevalbenda xwe ya dîrokî û berjewendiyên xwe aborî, leşgerî ji bo milletên bindest li Turkiyê winda bikin. Yanê bi gotineke din; ewanan li Îraqê û li Kurdistanê bi mafê çarenûsa gelê Kurd re ne û li Turkiyê û li Kurdistana Turkiyê tenê hin caran azadiya Kurdistanê û serbestiya gelê Kurd di çarçewa mafên mirovan de dibînin.

Piştî ku ewan dewletan bi dehên salan dostaniya destlatdara Îranê dikirin û dijminên hev, mîna Îraqê û Îranê li hevdu dihanîn û binpêkirina hemû mafên dêmokrat û mirovane li van herdu welatan ne diditin. Niha ewanan li dijî rêcîma Îranê ne, tevî ji hemû çavdêrên siyasî re pir zelal e ku destlatdara Şah Mihemed Riza Behlewî ne ji destlatdara Ehmedî Necad çêtir bû.

Bi ya me be; siyaseta Almaniya ne pir ji rêzaniya Emêrika baştir e, erê ewa hin caran siyaseta Emêrika ya hundir û derve jî rexne dike û ewa ne herdem jî gavên xwe bi qaserî wê davêje, lê rêzaniya Almaniya ya dervayî di naveroka xwe de mîna ya Emêrika ye, ewa jî mîna dewletên din, ji bo berjewendiyên aborî rûya dêmokratiya xwe ya dervayî zam dike.

Weke em zanin

Rawêjkara dewleta Almaniya, xanim Mêrkêl (CDU) hinekî ji yê berê rêzdar Şiroder (SPD) cudatir e, car caran tête gotin ku pêşketineke balkêş di siyaseta derva ya Almaniya de çê bûye, wek nimûne, xanim Mêrkil giringiyê dide doza mafên mirovan, hin caran

dixwaze xwe mîna siyasetmedarekî qehreman û dilsoz bide diyarkirin, û hin rexneyên xwe derbarê mafên mirovan arasteyê dewletên mîna Misirê, Rusiya, Çînê û hin din dike, lê gava ewa dibîna ku siyaseta aborî ya Almaniya dikeve metirsiyê, yan di metirsiyê de ye, yan eger dengên dezgeyên aborî gewre li Almaniya ne razîbûna xwe derbarê helwestên wê de didin xûyankirin, xanim Mêrkil dîsan neçar dibe, çavên xwe dadimrîne, wek mînak, ewa niha li ser pêhnkirina mafên mirovan li Rosiya damrîne. Çima ?

1- Ji ber ku Rusiya amede ye Gazê û (Zêrê Reş) bide welatên derve.2-Dewleta Rusiya mezin e û destên xwe dirêj û xurt in .3-Li Rusiya jî û nemaze li dewletên Asiya ya Navîn, hêzên têrorîst, îslamperestên rastrew û hişkbawer peyda bûne, lewra jî Rusiya dixwaze bi welatên sermiyandar mîna Almaniya û bi hin din re li dijî têrorîstan û îslamên hişkbawer pişikdar be.Bi kurtî xanim Mêrkil di heyameke dijwar de ye, diyar e ewa dixwaze rûya welatê xwe li derva jî spî bike û xwe weke dêmokrat û aştxwaz bide nasîn, lê li dawiya dawiyê ewa jî ta radeyeke bilind ji bo berjewendiyên siyasî û aborî dê bibe yexsîrê sermiyandarên dewleta xwe.

Eger em bi gotineke din nirîna xwe bêjin, eger hin dewlet hilibijartinan li nik xwe dikin, dewletên sermiyandar dixwazin ji wan dewletan re yekser bêjin: ew dêmokrat in, ji ber ku ewan dewletan naxwazin pêwendiyên bazarganî bi wan dewletên ne dêmokrat re winda bikin, lê ya rastîn ne weha ye, ew dewletan dîsan rêzê li yasayên mirovan e, li mafên azadiya derbirînê, yan pênasîna mafên netewî yên gelên

bindest nagrin. Bi gotineke dawiyê;dewletên sermiyandar nikanin bi pêkanîna dêmokratiyê li hundir welatên xwe rûyên xwe yên ne dêmokrat û birîndar li dervayî welatên xwe veşêrin!

Almaniya.5.2.2008. Malperên welatî. net û Pena Kurd

## **Destlata Sûriyê**

### **ji dilreşiya xwe danagere**

Weke tête zanîn ku 22 dewletên Ereban henin, ewanan ji dewletên Ewropî fêrbûn ku (Yekitiya Perlemana Dewletên Ereban) damezrînin û li gora berjewendiyên xwe yên aborî, siyasî têkeliyên xwe bi hev re bidomînin. Li ser binaxa vê yekê, ewanan di sala 1974 an de (Yekitiya) xwe li Şamê di bin sîbera( Partiya Bes) ya kevneperest û nijadperst de damezrandin. Evan dewletan dixwastin xwe mîna dewletên Ewropî, têgehên dêmokratîyê, aştiyê û hevkarîya nav gelên cîhanê di rêbaza xwe de biçespînin.

Di van rojên borî de hate ragîhandin ku vê carê dewleta Îraqê, dê rêvebirîya vê (Yekitiyê) bike, lewra ewê, ji ber sedema nebûna aramiyê li Bexdadê, biryar istandiye ku vê carê kongira (Perlemanên Dewletên Ereban) ya dehemîn li li Îraqê, paytexta Kurdistanê li Hewlêrê di( 28- 29) Avdarê de bête bestandin. Ta roja îroyîn dewletên Ereban helwestên xwe yên neyênî derbarê cihê girêdana vê kongirê dernebirîne, tenê dîsan mixabin dewleta Sûriyê li ser zimanê serokê "Encumena Gel "Mehmud El-ebreş dilreşiya xwe li hember doza Kurd û gelê Kurdistanê mîna hercarê bi zelalî dide xûyakirin û ewa ji kînên xwe naxweze dagere. Li aliyê din jî, ewa dixwaze xwe rûreş li nik dewletên cîhanê nede diyarkirin, ji ber vê jî , serkokê "Encumena Gel" dixweze biryara ne beşdarbûnê li vê kongirê bi zimanbaziyeke dekedûlavkirî di (Perlemana) xwe de bi riya piraniya dengên bistîne, ta ku ewa, vê biryara xwe bi navê gelê Sûriyê rewakirin bide

û gunehê xwe ji ustiyê xwe bi buhaneya dêmkratiyê têxe hembêza gelê Sûriyê. Bi ya me be, têlên tembura Sûriyê pir zengarî bû ne, ji zû de tu kes nikane guhdariya sazên wê, ya sergêjê û tolazene bike, siyaseta wê ya hundirîn û dervayî babidestî û bednav bûye, ewa ne tenê çavsoyîyê li gelê Kurd li Kurdistana Rojava dike, lê bi ser de jî ewa bi tundî li dijî her çiravêxistinekê li Kurdistanê ye, ewa naxweze dewleta fêderal li Îraqê bipejrîne û bê şermî piştvaniya hêzên reş û rikberên dewleta azad dike, ji ber ku binketina siyaseta (Partiya Bes) li Îraqê, nerastiya siyaseta wê li Sûriyê jî dişerpizîne.

Dewleta Sûriyê pêşda dizane ku di vê kongira duhatî de, dê di encamê de hin biryarên erênî dermafê Îraqa nû de bête wergirtin, wek mînak; Pênasîn û pejrândina Îraqa fêderal, ango (Perleman û hukmeta herêma Kurdistanê) mîna rastiyeke dîrokî û siyasî di vê kongirê de tête çespendin. Her weha jî dîsan di kongirê de, karên têrorîstî û destdirêjîyên hêzên derve, dê werin cersandin û şermezarkirin. Lewra Sûriyê naxweze xwe têxe vê qorziya teng û çemberkirî.

Helwesta Sûriyê a bê rû di vê derbarê de, ne tenê li dijî Îraqa fêderal e, lê belê, ewa hîn li dijî vîna (Yekitiya Perlemanê Dewletên Ereban) ne jî, vêca pirseke din xwe di vir de berdide holê; ma gelo, eger bi rastî Sûriyê di vê kongirê de ne behredar be, dê (Yekitiya Perlemanê Dewletên Ereban) çi biryarê li dijî Sûriyê bistîne ?? Yan piraniyanên wan dewletan jî, dê çavên xwe li ser helwesta wê ya dilçepelî damrînin .???

Yan jî ewan mîna (Perlemana Dewleta Istraliyê) ya nûh, ya ku lêborîna xwe pir vekirî û bi mêrane ji gelê

Eborcînê, yê berê di pêvajokeke dirêj de bindestkirî, daxwaz kir dê li xwe vegerin, hinekî bi wêrekî û bi aweyeke bîrgeşî rexnên dewletên şovînîst û dijminên Kurdan bikin, bandêra dêmokratiya rastîn hildin jor û bêjin: Hêdî bese! setemkariya Kurd û Kurdistanê!

Gelê Kurd bi riweşt û xwerista xwe herdem geşbîn e û ew herdem bi hêviyên ronak li pêşerojê temaşe dike.

Almaniya, 26.02.2008    Malperên Welatî .net û Pena Kurd

.....

## Eyzîdî Kurdistanperest û qehreman in

Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman

Naşikê û danayê topên zeman

Kes nebên Kurd dimirin

Kurd jîn dibin.

Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

....."

DILDAR

Bi kêmasî her Kurdek dizane ku berê çend sedsalan bavpîrê xwe eyzîdîperest bû, û Eyzîdî olek ji olên pêşîn bû ku bi xwedayekî bawer kirin. Piştî ola Îslamî bi riya pêxember Mohemed tête ragîhandin û ew ola li nik pir gelên cîhanê bi riya cengan tête pejrandin, gelê Kurd jî bi piraniya xwe mîna gelek milletên din, di bin zor û setemê de ola Îslamî, ya ku li (Girava Erebi) dest pêkiribû, bawer kir, yan xwe bi dadrê zorê bawerkirin dida .

Weke pir rind di dîroka Îslamî de tête zanîn ku bi dehan û sedan Kurdên îslamperest navdar in, ewanan navê ola Îslamî pir bilind kirin û paya wan di serketinên cengan de zor bilind bû. Selah eldîn Eyobî eniya dîroka Îslamî bi qehremantî û serketinên xwe xemilandiye. Em naxwazin li vir pir dûr biçin, bi kurtî beşek ji gelê me li Kurdistanê xwe radeştî Îslaman nekir, wî beşê ji bo

parastina ola Kurdan ya resen bi pîdarî berxwedanên dijwar kiriye, evî beşî 72 fermanên tevkujî û setemkariyê di bin navê Îslamperestiyê de dîtine, û rûberek mezin ji deşt, newal û çiyayên Kurdistanê bi xûna van pakrewanên "Eyzîdayetiyê " hatine avdan û bi saya van Kurdên bawermend ola Eyzîdî mîna beşek ji felsefe û şaristaniya jînê ta niha hatiye parastin.

Eger em vekirî bêjin: Kurdên Eyzîdî ne tenê setemkarî ji aliyê milêtên biyanî dîtine, lê gelek mixabin ewanan pir zordestî û hêrişên hovane ji aliyê hin birayên xwe, Kurdên Musliman jî dîtine, dijminên netewa me pir caran hin Kurdên Musliman xopandine û ewanan li dijî birayên xwe çav sor kirine, lê li aliyê din, divê ez pesnê gelê me yê Eyzîdî bidim, ku piraniyên wan tucarî nexwestine ji welatê xwe Kurdistan birevin û koçberî welatên din bibin, ewanan herdem li cihûwarê bavpîrê xwe mîna çiyayê "Araratê" û çemên "Feratê" û "Dicle" cîhwest mane û herdem welatê xwe KURDISTAN û OLA xwe bi vîneke netewperestî û bi baweriyeke olî bilind parastine.

Di mêjoya nûjen de neyarên gelê Kurd û Kurdistanê dîsan bi awayên ne zanistî û ne mirovane berxwedane ku nasnama Kurdên Eyzîdî ya netewî bi riya hin noker û xwefiroşan biguherin, lê dîsan bi saya Eyzîdiyên Kurdistanê helwestên wan yên mêrane pîlanên dijminên gelê Kurd bi serî nebûn, ango bi serneketin; ronakbîr û welatparêzên me yên Eyzîdî bi qehremanî û bi şehrezayî dek û dolabên neyaran pûç dikirin, li aliyê din jî mîna birayên me Eyzîdî baş dizanin ku bi melyonan Kurdên Musliman bi çavên rêzdarî li ola xwe ya kevnare temaşe dikin, birayetî û hevaltîyên xwe li ser bingeha netewayetiyê bi Kurdên Eyzîdî re dikin.

Ez dibêjim belkî ne zêde be ku ez li vir tenê birek ji helwesta xwe wek nimûneyeke zindî ji xwendevanên rêzdar re hûnim zimên; gava ez di sala 1993 an li Kurdistana Îraqê bûm û min mîna mamosteyê zimanewaniyê di beşê Kurdî li zankoya Selaheldîn kar dikir, di wê salê de jî navenda Lalişê li Duhokê bi alîkariya desthilata Kurdî hate damezrandin, min jî weke her Kurdekî ronakbîr bi mamosteyê nemir Hemîd Surî re serdan li navenda Lalişê kir û me pîrozbahiya rêvebirên navendê kir, li wir min seydayê mezin pîr Xidir Sulêman nas kir, ewî gote min: Mîvanê me ji Kurdên Rosiya henin, ewanan dixwazin seredanê li LALIŞÂ NURANÎ bikin, ma tu jî dixwazî bi me re biçî wir ?. Min bi wî re got: Mamoste, te daxwaza dilê min anî zimên, diyar e te hestên min di çavên min de xwendin, ma çawa ez naxwzim herim şaristaniya bavpîrên xwe bibînim û hinekî çerxa dîroka setemkar hûnim bîra xwe.

Bi kurtî ez bi birayên xwe re çûm "LALIŞÊ", li wir ez li dîroka bavpîrên xwe vegerîm, min rêdan ji seyda Pîr Xidir Sulêman xwest ku ez jî dixwazim li vir mîna we bikim, û rêzê li vê cihê pîroz bigrim, ewî gote min tu çî dikarî wê bike! Di rastiye de, mîna ku tete bîra min, min pîr gav weke birayên xwe Eyzîdîperest avêtin û min rêzeke bê sînor li "LALIŞA NURANÎ" kir. Ev wêneya di dil û serê min de herdem zindî ye, ez xwe bi wê serdanê pîr serbilind dibînim û herdem ji xwe re dibêjim: Eger ez welatparêz bim yan mirovperwer bim, ev serdana min li "LALIŞÊ" beşeke ji welatparêzî û mirovperweriya min e.....Ez hêvîdar im ku bi van çend rêzikên xwe li ser wê serdana dîrokî, min nama xwe gihan dibe birayên xwe Musiliman û Eyzîdîperestan.

Rola piraniyên Ezîdiyan di dîroka tevgera azadîxwaza Kurdistanê û her weha jî di pêşvebirina çand û behemên zanistî de ji me hemûyan re gelek diyar e. Lewra jî dijminên gelê Kurd û bi taybetî rêcîma partiya Bes li Îraqê gelek tawanên mezin li Kurdên Eyzîdî kirin û beşekî mezin ji Eyzîdiyan li navça Şêxan û li derdora wê, di sala 1992 an de ji herêma dayik "Kurdistan" veqetandin û li jêr destên xwe de hêştin .lê dîsan niştimanperwerên Eyzîdî xwe ji tevgera xwe ya netewî veneqetandin û ewanan bi hemû awayan piştvanîyên xwe çî bi dizî û çî eşkere derbarê herêma xwe Kurdistan ya azad derdibirîn.

Piştî ku di 9.04.2003 an de rêcîma Sedamê dîktetur hate rûxandin, dewleta fêderal li Îraqê ava- bû, xala 140 î di destura Îraqê de bi saya cemwerên Kurdistanê û di nav wan de Eyzîdiyên welatparêz li navça Şêxan û deverên din, û bi saya nûnerên hêzên Kurdistanê, bi taybetî P.D.K bi seroketiya kek Mesud Berzanî û P.Y.N. bi seroketiya mam Celal Telbanî di perlemana Îraqê de hate pejrandin... Hêviyên birayên me Eyzîdî hatin vejandin ku ewanan piştî pêkanîna yasya 140 î têkevin bin siya destlata xwe ya Kurdî û ya resen ...Ev daxwaz û armancên Kurdên Eyzîdî li nik neyarên Kurd û Kurdistanê zor zelal bûn, lewra jî dijminên me, ango dagîrkerên Kurdistanê dîsan mîna hercar bi hev re pirojeyên xwe li dijî armancên gelê Kurd bi dizî bi alîkariya têrorîstên Îslamî û nijadperestên milletên serdest li ser rêça xûnvexwer Elî Kîmawî berdewam kirin û di sêşemeke reş, 14.08.2007 an de bobelateke gewre bi ser Kurdan ve anîn, ewanan carek din Helbceyeke duhem di eniya dîroka xwe ya tarî û qirêj de çandin û bi sedan Kurdên Eyzîdî pakrewan bûn û bi sedan jî birîndar bûn .

Armanca neyarên me pir diyar e, ewanan dixwazin gelê me li Şingalê çavtirsîyaî bikin ta ku ewanan ji welatê xwe awere bibin û beşek ji welatê xwe ji biyaniyan re bihêlin .., lê ez kanim bêjim ku dijminên me ta niha hîn têngihîştine ku vîna gelê Kurd di pêvajoka mêjoyê de tu carî ne hatiye tewandin, gelê me xawên pêşbîniyên zor dewlemend in, niştimanperwerên Kurdistanê pêşda zanin ku qelengê azadiyê tenê qurbanî û pakrewanî ye û di pend û şîretên Kurdî de hatiye;"Her bostek erd temenê xwe tasek xwîn e .", dêmek pêwîst e, neyarên me vê rastiya me baş bizanibin ku gelê Kurd, Kurdên Îslam û Eyzîdî perest tucarî ji ber dijminên xwe axa xwe ya pîroz bi chi ne hêştine û ne jê dê bi chi bêhilin, eger ne weha bûya, dê gelê me ji zû de mîna hin milletên din dêrînî li Rojhilatanavîn bihata pişaftin û bê xak û welat bima ..

Di encama van gotin û nirînên xwe de, ez dixwezim hest û helwesta xwe li ser tevkujiya bêzar derbibirim û ez jî mîna her kurdperwerekî dixwazim bi malbetên Kurdên Eyzîdîperest re azerî û janên wan ji dil de parve bikim û ji wan re bêjim ku derd û êşa we beşek ji bêzariyên me ye, birîn û zamên we, birîna gelê Kurd e, nirx û buhaya axa Şengalê mîna buhabûna Amedê, Muhabadê, Dohokê, Efrîn û Qamoşliyê ye û bila serê we û gelê Kurd sax bin û hûn herdem bimînin Kurdistanperest û qehreman.

Almaniya 20.9.2007.Malperên welatî .net û Pena Kurd .

## **Ezbenî M.Ciwamêr!**

**bi dara zorê zimanê Kurdî nabe yek!**

**Tikaye aramke, aramke !**

Di vê dema dawiyê de, di mehên 10, 11, sala 2006an de Ronakbîrê Kurd û nivîskarê jîr Muhsin Ciwamêr çend gotar di bin van navnîşanan de di derbarê zimanê Kurdî, di malpera Rojava.net de weşandine.(1-Ma rast e, ku perlemanê Kurdistanê zimanê Kurdî yê hevbeş çespanîye?, 2-(Zimanê Kurdî yek e), ( 3-Xwendina xwendekarên Kurd li zanîngehên Kurdistanê weke dareke berhemdar e ), (4-Divê kurdkirina Kurdên Turkiyê dest pêbike, bi boneya lidarxistna komgirê: Duhok pira rewşenbîriya Kurdî ye).Lê birêz M.Ciwamêr hîn dibêje: Min pêşda mîna rêrastkirin û amedebûnekê ji van gotarên xwe re, nameyek di derbarê zimên de ji serokê herêma Kurdistanê birêz kek Mesud Berzanî re şandibû.

Em li vir dixwazin bi awayeke giştî li ser nama wî ji serokê Kurdistanê û li nik gotarên wî rawestin.M.Ciwamêr ji serok Mesud Berzanî re di namê de bi kurtî weha dinivîse: (Biryarwergirtina Xwendina pir zaravan li dibistanan cihê metirsiyê ye, eger ku kîjan zarava bibe ya sereke, eva ne giring e, ya giringtir ew e, ku em li ser zaravekî rawestin, û kî bi kîjan zaravî pir dipeyvin, ew jî ne giring e, tenê em weha kanin yekitiya xwe ya netewî ta roja qiyametê biparêzin.), herweha ew hîn ji serokê Kurdistanê re wisa dinivîse: (Eger dîkteturiyet di her tiştêkî de guneh be, lê ewa (dîkteturiyet)di ferzkirina

zaraveke taybet ji bo yekbûna zimên û wêje rindî û qenciyeke e û her rindiyek bi deh rindiyan e.)

Di nirîna me de M.Ciwamêr di warê ramana netewî de wek bîrdoz û teorî tiştêk nû ne gotiye, her siyasetmedarek, her welatparêzek, her zimanzanek dizane, ku her miletek pêwîst e bi zimanekî tenê û ne bi du zaravên bingehîn û bi çend zaravokên din bixwîne, hebûna pir zaravan di zimanekî de jî yasayeke xwezayî ye û zanistiya zimanewaniyê vê rudawa surûştî bi sanahî dipejîrîne. Lê di dîroka pêşketina zimanan de diyar bûye, ku pir zaravan alîkariyên hev kirine, ewanan bi hev re hev kêşî kirine, lewra di zimanê Kurdî de jî, diviyabû ji zû de hemû zaravên zindî ango bi kêmanî yên ku, bi wan tên nivîsîn bi hev re hev kêşî kiribûna. Lê mixabin wêneya zimanê Kurdî ji ber pir sedemên siyasî, erdnîgarî û siyaseta dabeşkirinê ne cihê dilşadiyê ye. Piştî ku piraniya gelê Kurd ola Îslamî pejirand, ewî jî tîpên Erebî, tîpên zimanê pirtûka pîroz wek pir miletên din mîna Farisan, Turkan û hin din ji xwe re pejirandin. Wek me li jor gotiye: Di pêvajoka dîrokê de zaravên Kurdî jî peyda bûn, û her zaravek li gor rewşa xwe pêşda çûye, lê niha piraniya gelê Kurd bi zaravê Kurmancîya Bakur (Kurmancî) dipeyvin û dinivîsînin (Kurdîstana Bakur bi piraniya xwe ango li derdora 20 milyonan), (Kurdîstana Rojava li derdora sê milyonan), (Li Kurdisatan Rojhilat dîsan bi milyonan), (Li Kurdîstana Başur jî ne kêmtirî du sê milyonan in). Gelê Kurd di dîrokê de bi zimanê Kurdî bi zaravê Kurmancî, ya ku nîzîk ya zaravê niha dipeyvî û bi dehan helbestvanên Kurd yên kevneşopî bi vî zaravî berhemên xwe rabeî gelê Kurd kirin û wêjeya gelê Kurd xwe bi wan berhemên serbilind dibîne. Mîr Miqdad

Medeht Bêg yekemîn rojnama Kurdî "Kurdistan " bi zaravê Kurmanciya Bakur di 22.04.1898 an de li paytexta Misirê weşand, û di pişt re ango di destpêka sedsala 20 an de pir kovar û weşanên Kurdî bi zaravê Kurmancî li Turkiyê, Sûriyê, Libnanê û li Kurdistana Îraqê derçûn. Dêmek zaravê Kurmancî jî wek zaravê Soranî, di bin siya rewşa zordestiyê de serê xwe netewand, ewî ji bo berdewamiya jiyana xwe bi pîdarî berxwedan kiriye. Di salên sî û çelîyan de Mîr Celadet Bedirxan wek zimazanekî nasdar, (ew ji bilî zimanê dayika xwe bi heyşt zimanên din biyanî (Almanî, Firansî, Êngilîzî, Erebî, Turkî, Farisî, Rusî û Yonanî û pir zaravên Kurdî zanîbûn), ewî pirojeya çespendina Alfebaya latînî û rêzimana Kurdî li ser bingehê zanistî û zimanewaniyê amede kiribû, di pişt re ewî zanyar û zimanzanê mezin Tewfîq Wehbî ji Kurdistana Başur (Soranaxêv) vexwendî cem xwe kir û Mîr Celadet Bedirxan reşpela pirojeya Alfebaya zimanê Kurdî li ser bingeha tîpên latînî û rêzimana Kurdî pêşkêşî Tewfîq Wehbî kir, û ewan herduyan bi hev re guftogoyên vekirî li ser vê pirojeya nû kirin. Tewfîq Wehbî razemendiya xwe li ser vê Alfebayê û rêzimanê li nik Celadet Bedirxan dabû xûyakirin, ewî bi Celadet re gotibû: Ezê vê pirojeyê bi xwe re bibim Kurdistana Başur û paşê ezê te agahdar bikim. Tewfîq Wehbî vedigere Kurdistana Başur û Mîr Celadet Bedirxan demek dirêj çavênîya bersiva Tewfîq Wehbî dikir, lê mixabin ewî bersiva xwe ne bi erênî û ne jî bi neyênî ji Mîr Celadet Bedirxan re şandibû. M.C. Bedirxan neçar dibe vê Alfebaya latînî û li gel rêzimana zimanê Kurdî di hejmarên kovara Hawrê de diweşîne. Ji wê demê de nivîskar û rewşenbîrên Kurdistana Bakur û Kurdistana

Rojava berhemên xwe bi Kurdî- latînî û li ser bingeha rêzimana M.C.Bedirxan dinivîsîn.Dîsan pêwîst e em li vir di derbarê rêzimana Kurdî û Alfebaya latînî de, zimanzan Reşîte Kurd(Kurdistana Rojava) û zimanzanê mezin prof.Qenatê Kurdo( Sovyetistana berê ) jî bi bîr hûnin û rolên wan di pêşvebirina ziman û rêzimana Kurdî (Kurmancî ) de gelek balkêş in.Dêmek di vê demên 60-70 salên dawiyê de, zimanê Kurdî (Kurmancî bi tîpên latînî jî ) bi kêmasî li du beşên Kurdistanê gelek pêşda çûye, ewa ne tenê zimanê devkî maye, lê bi sedan pirtûk, kovar û rojname, û li van çend salên dawiyê jî têlvîzîyon û malperên întêrnêt hatin û hîn tên weşandin.Bi sedan nivîskar, rojnamevan û siyasetmedarên Kurd bi zaravê Kurmancî bi tîpên latînî peyda bûne, û hin berhemên wan jî ji bo zimanên biyanîyan jî hatine û hîn jî tên wergerandin.Lê eger em hîn li ser rewşa zimanê Kurdî (Kurmancî bi tîpên Erebi )li Kurdistanê Başûr rawestin, emê baş bibînin, ku çawa li navçeya Behdînan zaravê Kurmancî bi tîpên Erebi jî pêşketiye, navên pir nivîskar û zanyarên navçeya Behdînan di dîroka wêjeya Kurdî de li rex nivîskar û zanyarên zaravê Soranî gelek geş û nasdar in.Em dixwazin texmîn bikin, ku aghadarî li nik M.Ciwamêr di derbarê zimanê Kurdî de û bi taybetî di derbarê zimanê Kurdî (zaravê Kurmancî ) de gelek kêman in, em guman dikin, ku ewî tu carî berhemek Kurdî latînî nexwendiyê, ewî pirtûkxana Kurdî (Kurmancî ) baş ne dîtîye, em dibêjin: Eger wî ev samanên zimanewanî, wêjeyî û zanyarî dîtibûna, belkî ewî nikanîbûya weha weke li jor hatiye ji serokê Kurdistanê re binivîsanda.Dîsan M.Ciwamêr di nama xwe de weha dinivîse: (Mebesta me ne ew e, ku em zaravên din di

zimanê Kurdî de jibîr bikin, yan jî em naxwazin giringiyê bidin wan zaravên Kurdî, lê zaravên Kurdî her dimînin û ewanan kêrhatî ne, mirov dikane sudan ji wan zaravan wergre û hergîz bi wanan jî zimanê fermî dewlemend bike..., lê eva ne netê vê wateyê, ku mirov hin rewşên awerte û taybet li hin herêman nebîne, divê mirov raweste ta ku mercên objêktîv li wir jî werin dîtin, lê dîsan divê mirov ji zimanê hevbeş û fermî re pêbend (multezim) be, û herwisa jî pêwîst e pisporên jêhatî werin amedekirin, ta ku ewanan zimanê fermî li seranserê welêt bidin fêrkirin). Em li vir pir bi kurtebirê ji M.Ciwanmêr dipirsin, dê çawa Kurdên soranaxiv sudê ji zaravê Kurmancî bigrin, gava ku bi wî zaravî neyê nivîsîn û neyê xwendin, û ew zarav bi awakî fermî di dezgeyên dewletê de neyê naskirin ??????. Ji ber ku em li gor pêşniyarên raborde û îroyîn çak dizanin, tevî ku zimanê Kurdî (Zaravê Kurmancî) mîna me li jor jî gotiye: Glek dewlemend bûye, lê mixabin birayên me Soranaxêv sud ji zaravê Kurmancaxêv wernegirtine, berevajayê vê yekê, Kurmanaxêv gelek bi hezkirin û bi dilşadî peyvên Soranî hîn dibin û wanan gelek bi lez di nivîsarên xwe de bi kartînin, eva di riya pêşketin û yekbûna zimanê Kurdî de rudaweke pir erênî ye.lewra jî me hêvî dikir, ku rewşênbîrên mîna M.Ciwanmêr bi vê lezbûnê û bê lêkolînên berferh ji aliyên pisporên zimanan de, nirînên weha zor hişk û li dijî vîna piraniya gelê Kurdistanê dernebirîna, saman û dewlemendiya wêja Kurdî, zimanê Kurdî (zaravê Kurmancî) bi du sê gotarên ne durbîn nedixistin erşîva dîrokê yan mozexaneyên Kurdistanê ...

M.Ciwanmêr di gotara (Zimanê Kurdî yek e) de dinivîse: ( Ew kesên hewaldanan dikin, ku bi zaravên

xwe jî li dibistanan bixwînin, evan hewaldanan destpêka metirsiyê ye, ku gelê me û zimanê me perçe bibe ... , xwendina bi zaravê niha ya fermî li Kurdistanê ji sala 1970 î de mêlg dike, ku ev zarava serkewtî ye, ewa kane bibe zimanê hemû beşên zanyariyê li hemû herêmên Kurdî, pir peyvên zaravên din jî di vî zaravî de cihên xwe girtine, hêdî mirov nikane bi sanahî navê zaravê li vî zaravî bik, û Kurdên Turkiyê nikanin bi sanahî zimanê Kurdî yê fermî li Başur fêrbibin, sedema wê ne ev e, ku zimanê Kurdî li wir dijwar e, lê ku em bêjin ev zimana li wir dijwar be jî, dîsan ev ji aliyê perwerdeya fêrkirin û xwendinê de nayê pejrandin.Kurdên Turkiyê ji ber sedemên bindestî û zordestiyê zaravê xwe jî baş nizanin, û piraniyên wan baş zimanê Turkî zanin, û wek nimûne, eger mirov li Diyar Bekirê be ewa dê nizanibe, ku ewa li kevintirîn bajarên Kurdî ye, ji ber ku di hemû aliyên jiyana wir de, zimanê Turkî û turkayetî serdest e, lê her Behdînanek zaravê fermî têdighîne û herweha Kurdên Kurdistana Sûriyê yên ku li Ewropa dijîn jî zaravê Soranî têdighînin, tiştê pir matmayî ev e; ku hin kes hene, fêrbûna zimanê xwe dijwar dibînin, û hînbîna zimanên biyaniyan sanahîtir dibînin û M.Ciwanmêr hîn ji xwendevanên xwe dipirse;ma gelo hemû zimanên fermî li cîhanê, zimanên piraniya gelên xwe bûn, lê pir caran ewanan zimanên pir hindikan yan yên Paşan yan yên qeder û çarenûsiyê bûn ??..; ew kesê ku dixwaze zaravê wî jî li rex zimanê Kurdî yê fermî bête xwendin, divê ew baş zanibe, ku ev zarav jî dê bi demê re hêdî hêdî bibe zimanekî serbixwe û ez bawer nakim, ku hişmendên Kurd bi van hewaldanan razî bibin, yan ewanan bi vê teramerabûnê xwe bextewar bibînin, yan serkirdayetiya

Kurdistanê , dê ji bazara zaravan hezke....).Wek me berê jî gotibû: Zarav û zaravokên Kurdî diyardeyek xweserî ye, zarav û zaravok dikanin zimên dewlemend bikin, lê ev netê vê wateyê, ku em dibêjin, bila ta roja qiyametê gelê Kurd bi du û sê zaravên bingehîn bixwînin û binivîsînin, her Kurdek, her mêjonasek, her rojhilatnasek zane, ku taybetmendiyek rewşa gelê Kurd ji van hemû aliyan ve heye, (Erdnîgarî, dîrokî, zimanewanî, siyasî). Rast e Kurdên Başur ji sala 1970 î de bi zaravê Soranî bi fermî li dibistanan, xwendegehan, zanîngehan dixwînin, dîsan rast e, ku zaravê Soranî li Kurdistana Îraqê pêşda çûye û serkewtî ye, lê wê ne rast be, ku em bêjin: Zaravê Kurmancî binketî ye û ewa nikane bibe zimanî fermî. Rewşa siyasî li Kurdistana Bakur, li Rojavayê Kurdistanê ne mîna beriya sî salî ye, li herdu beşan û li dervayî welêt bi dehan partî, rêxistin û dezgeyên siyasî, rewşenbîrî hatine damezrandin, bi dehan kovar û rojnamên Kurdî bi zaravê Kurmacî hatine weşandin û hîn jî tîn weşandin, bi hezaran ronakbîr, siyasîmedar, wêjevan, zimanzan, hunermend, rojnamevan û pirtûk bi zaravê Kurmancî peydabûne, bi sedan ji wan bi zaravê Kurmacî navdar bûne, her wisa jî nîzîkî deh salane, ku têlvîzyona Kurdî M T V, Roj.T V bi zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî jî weşanên xwe dike. Zaravê Kurmancî bê ferman û bi awayeke xweserî li van herdu beşan, li nav Kurdên Sovyetistana berê û li dervayî welêt bûye zimanê fermî.Ango em dixwazin bêjin: Zimanê fermî ne tenê zaravê Soranî ye, lê belê zaravê Kurmancî jî bûye zimanê fermî. Lewra jî em dibînin, ku berêz M.Ciwanmêr gelek bi nezanî, bê agahdariyên rasteqînî û bê lêkolînên zanistî nirînen xwe derbarê zaravê Kurmancî de derbirîne.Di

rastiyê de M.Ciwanmêr fermanên gelek metirsî di dermafê zaravê Kurmancî de derxistine.Em guman dikin, ku ewî bê mebesteke xerap fermanên cehirkirî dermafê bi kêmanî du beşên Kurdistanê derxistine, ew nizane, ku encamên van fermanan li derûniya Kurmancan, dê çawa bin?Ew nizane, ku ewa samana çanda Kurdî, dewlemendiya zimanê Kurdî bi destên xwe dixwe gornê. Eger em jî niha li vir weke M.Ciwanmêr biramin û bêjin: Zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî pir pêşketî ye, ewa jî bi demê re bûye zimanê fermî, piraniya gelê Kurd bi vî zaravî dipeyvin, dinivîsîn, zarava Kurmancî ji ya Soranî kevintir e, û di ayênde de bajarê Amedê, paytexta Kurdistana mezin e, lewra jî divê zaravê Kurmancî li hemû beşên din li Kurdistanê bibe ya fermî û bila ewa sudê ji zaravên Soranî, dumilî û yên mayîn bigre. Ma Gelo helwestên M.Ciwanmêr û birayên me Soranaxêv dê çi bin ???? lê em gelek bawer dikin, ku rewşenbîr û siyasetmedarên Kurmanc fermanên weha ne berpirsiyarne, ne îro û ne sibe dixwazin derxînin, . ewanan gelek rêzê li zaravê Soranî digrin, pir nivîskar û rewşenbîrên Kurmanc ji Kurdistana Bakur û ji Kurdistana Rojava bi şehnazî wişeyên Soranî fêr dibin û bi kartînin.

Em naxwzin li vir li ser zaravê Kurmancî li navçeya Behdînan li Başurê Kurdistanê pir rawestin, lê em zanin, ku zaravê Kurmancî û bi tîpên Erebi li wir jî gelek pêşda çûye, asta berhemên nivîskar û wêjevanên Behdînan pir bilind e, ewanan bi hezkirin û bi şewakî ne fermî bi zaravê Kurmancî dixwînin û dinivîsîn.Vêca em nikanin têbighînin, ku ji bo çi ev zarav jî li dibistanan nayê xwendin?Eger M. Ciwanmêr xwendina vî zaravî di dibistanan de ziyar û metirsî ji bo perçebûna netewa Kurd

dibîne, lê em dibînin berevajaya wê ya rast e, ango eger hukumeta herêma Kurdistanê xwendina zaravê Kurmancî li dibistanan qedex bike, û zaravê Soranî li ser Kurdên Behdînan ferz bike, em bawer dikin, dê heyama netewî, siyasî, partiyetî, civakî pir li hevkeve, û li pêş hukumeta herêma Kurdistanê pir astengê çê bibin.

M.Ciwanmêr di gotara xwe(Xwendina xwendekarên Kurd li zanîngehên Kurdistanê darek berhemdar e) de dibêje: 300 xwendekar ji sê beşên din li Kurdistana fêderal dixwînin, mirov guman dike, ku ewanan xwendinên xwe kuta bikin û vegerin herêmên xwe û ewanan zimanê Kurdî yê fermî li wir bidin xwendin, ta ku ev ziman(Soranî) li wir jî bibe zimanê xwendin û nivîsandinê..). Vaye em dîsan dibînin, ku M.Ciwanmêr dixwaze xwendekarên beşên din ji Kurdistanê zaravê Soranî li herêmên xwe bidin xwendine, ewî qet ji wan xwendkaran nepirsiye, ma gelo ewanan ji bo fêrbûn û fêrkirina zimanê Kurdî (Soranî) çûbûn Kurdistana fêderal ?lê ewanan ji ber sedemên din yan ji bo pîşeyên din çûbûn Kurdistana azad?Ma gelo birêz M.Ciwanmêr dizane, ku gelê Kurd li wan sê beşên din dixwazin zaravên xwe bi ya Soranî biguhêzin ?Lê nirîna gelê Kurd li sê beşên din li nik M.Ciwanmêr qet ne giring e, û li nik wî "Dîkteturiyet di vir de xêr e, û her xêrek bi deh xêran ne!!!"

M.Ciwanmêr di gotara xwe ya di bin vê navnîşanê de jî (Divê kurdkirina Kurdên Turkiyê dest pêbike), û bi boneya lidarxistina komgirê(Duhok pira rewşenbîriya Kurdî ye) nivisiye: Ez bawer dikim ji ber çêkirina tîpên latînî Kurdên Turkiyê ji birayên xwe li Başur û Rojhilata Kurdistanê hîn pirtir bi durketin, eger tîpên latînî piştî kesayetiya Turk carekê şikandiye, lê ewê piştî kesayetiya

Kurd pir caran şikandiyê, ji ber ku ewa bûye sedema, ku Kurdên Turkiyê ji Alfebaya xwe ya resen bi durkevin, ... , û rûxandina zaravê Kurmancî, jarbûn û rawestandina pêşketina wî li nik Kurdên Turkiyê mîna zimanê Erebi li nik gelê Erebi li Cezayêrê ye, lê li aliyê din zaravê Başur ji hemû aliyan ve gelek pêşketî ye.... Alfebaya latînî Kemalîstî, Ataturkî ye û ev Alfebaya hîn ji Turkan jî dur e). Eger em bala xwe bidin navnîşana gotarê (Divê kurdkirina Kurdên Turkiyê dest pêbîke). Emê pir bi zelalî bibîn, M.Ciwanmêr di vê baweriyê de ye, ku Kurdên Kurdistanê Turkiyê hîn Kurdayetiyê ji ber du sedemên bingehîn nasnakin.

1- Pirên wan nizanin bi Kurdî bipeyvin .2-Kurdên ku zimên jî zanin, ewanan bi zaravê Kurmancî dipeyvin û bi tîpên latînî –Turkî dixwînin. Em nikanin bawer bikin, ku piraniyên Kurdên Turkiyê nizanin bi Kurdî bipeyvin, û eger ev texmîna rast be jî, ev netê vê wateyê, ku Kurdên Turkiyê kurdayetiyê nasnakin û divê ewanan werin kurdkirin, rast e; di avahiya ramana netewî de parastina zimên û pêşketina wî mercek ji mercên sereke ye.Lê pêwîst e bê gotin jî, wek me li jor jî aniye zimên, ku piraniya Kurdên Kurdistanê Turkiyê bi hemû hest û ramanên xwe kurdpêrwe in. Ewanan pir hewaldanên şoreşgerî, berxwedanên niştimanî, bizavên rewşenbîrî, wêjeyî, hunermendî bi pir aliyan ve kirine û ew hîn niha jî li Kurdistanê û li dervayî welêt çalakvan in , lê tenê-gunehê wan ev e- ewanan ne li gor ferman û daxwaza M.Ciwanmêr bi zaravê Kurmancî yê zikmakî, zaravê mîrê helbesta Kurdî Ehmedê xanî, zaravê mîrê Botan Celadet Bedirxan û li gor rêziman û Alfebaya ku wî danîye, dipeyvin û dinivîsînin.Em dîsan ji berêz M. Ciwanmêr

tênaghînin, ku ji bo çî tîpên Erebi ji bo gelê Kurd tîpên resen in?Li gor ku em zanin piraniya zimanzanên Kurmanc mîna Celadet Bedirxan, prof.Kamîran Bedirxan, prof.Qenatê Kurdo, Reşîtê Kurd, Dr.Zerdeşt Haco, Amed Tîgris, Dr.Fedil Omer, Keça Kurd, Deham Ebdilfetah, Î.Naso û bi dehan kesên din li Kurdistanê û li dervayî welêt bi awayên zanistî mêlag kirine, ku tîpên latînî ji bo zimanê Kurdî baştirîn tîp in.Mîna me berê li banî diyar kiribû, ku zimanzan û rewşenbîrê gewre Tewfîq Wehbî jî razemendiya xwe ji pêşniyêrên Celadet Bedirxan re dabû xûyakirin, lê mixabin ji bo çî ew paşê poşmam bûye û bersiva Celadet Bedirxan di derbarê guhartinên tîpan û rêzimana Kurdî de nedaye?Em nizanin.Ango eger ewî di wê demê de alîkariya Celadet Bedirxan bikra, dê niha pirsgirêkên zimanê Kurdî pir kêmbûna.

Dêmek niha rastiyeke ne xweş di zimanê gelê Kurd de heye, em bawernakin, ku netewperestên Kurd weke M.Ciwanmêr ji vê rewşa awerte dilşad in, bê guman e danîna pirojeya çareserkirina vê pirsgirêka zor û zor mezin erka her rewşenbîrêkî kurdperwer e, lewra jî em di vê nîrînê da ne, ku birêz M.Ciwanmêr bi mebesteke baş pêşniyarên xwe li Kurmancaxêvan dike, û bi mebesteke baş dixwaze em hemû Kurmancaxêv pêbendiyê fermana wî bikin.Lê em dixwazin ji wî û ji hemû kesên weke wî diramin re bêjin: Ev fermana we li nik me cihê xemgîniye ye, derçûna fermaneke weha ne rewşa, dê carek din Kurdan ji hev dûrxîne, dê pir aloziyan di nav gelê Kurd de çêke, dê bandura wê rasterast li ser jiyana siyasî li ser her çar beşên Kurdistanê bike .Ev netê vê wateyê, ku em dixwazin ta roja qiyametê bi du sê zaravan bixwînin û binivîsînin, ne xêr!!ê em naxwazin wek M.Ciwanmêr

nexweşiya sedsalan bi fermanekê derman bikin, pir pêdivê, ku em bi awayên zanistî, û bi bêhna fereh tiliyên xwe deynin ser vê pirsgirêka gelek dijwar û pir hestewer. Em li vir dixwazin hin xalan, ligor nirfînên xwe weke rêduzbûnekê li ser riya dirêj û dijwar pêşniyar bikin.!.- Divê em di warê zanistî û derûnî de biçespînin, ku hemû zaravên Kurdî, yên ku niha bi wan tîn nivîsîn, bingehên zimanê Kurdî ne .2-Divê her zaravek li yê dîtir bi pozbilindî temaşe neke û ewanan hemû bi çavên nirxbuha li hev temaşe bikin .2- Divê siyasetmedar, nivîskar rewşenbîr berxwe bidin, zaravên zimanê Kurdî yên bingehîn nas bikin û hêdî hêdî wan bixwînin.3- Hemû zaravê sudê ji hev wergrin, peyvên Soranî têkevin nav zaravên din, wişeyên zaravên din têkevin nav zaravê Soranî, ji ber ku pêkanîna van mercan dihêle, ku zimanek dewlemend ji zaravên xwe peyda dibe. 4- Avakirina dezgeyên zimanewanî li seranserî Kurdistanê û li dervayî welêt.5-Divê koreyên zimanewanî bi awayên werzeyî û komgirên zimanewanî bi kêmasî salê carekê li Kurdistanê û li dervayê welêt werin bestandin.Bê guman ev gavavêtinan ne hêsan in û ewanan zû zû pêknayên, lê ev gavavêtinan zor giring in, û ewanan kanin pir dijwariyan li ser riya zimanê yekbûyî ji holê rakin.

Eger em dîsan li pisporên gelê Kurd vegerin, emê bibînin, ku pisporêkî navdar mîna prof.Qenatê Kurdo hîn beriya 25-30 salî ronakbîr, wêjevan û rojnamevanên Kurdistanê bi devkî û nivîskî şîret dikirin, lê sed carî bidaxawa gelek wêjevan, siyasetmedar, rojnamevan û pisporên zimanê Kurdî guhên xwe ji van şîretên zanistî û zimanparêzî re girtûbûn.Pisporên gelê Kurdistanê nikanîbûn ji ber hin sedemên giring sudan ji pir pêşniyar û

pir şîretên mezinan bigirtana.Di dema niha de mercên siyasî pir ji berê baştir e, çanda Kurdî baş bi rêve diçe, beşek ji Kurdistanê azad bûye, heyama siyasî li Kurdistana azad bi serkirdayetiya partiyên sereke û bi seroketiya kek Mesud Berzanî rind pêşda diçe, Kurdistana Başûr bûye navbendek zor giring ji bo hemû beşên din jî, lidarxistina komgira rewşenbîrên Kurdistanê di vê mehê de li Duhokê mînakeke geş e.Dêmek niha rewşenbîr, nivîskar, pisporên zimên dikanin xwe pir rind bilivînin û gelek çalakiyên kêrhatî di derbarê zimanê Kurdî de jî çêkin, pêşniyarên zanistî bistînin.Em li dawiyê dixwazin ji birêz M Ciwanmêr re bêjin: Belkî di zimanewaniyê de jî xebata bi hev re baştir e, û weke ew jî dizane( Destê XWEDAYÊ MÎHREBAN BI KARÊN HEVBEŞ RA YE)

Almaniya,15.11.2006.Malpera Pena Kurd,ûWelatî .net.

.....

## **Gurên bersorî hûn çi dikin ?**

### **"Riyên gelê me bûne bust û hûn nebûn dost"**

Dîrok dibêje: Di jiyana civaka mirovperweriyê de heyameke mîtolocî he bû, di wê demê de zanîna mirovan pir nizim û di serasera bû, her êlekê yan komek ji mirovan di vê civakê de bawer dikir ku bavpirê xwe yê yekem lawirek ji lawiran bû, yan jî hişaniyek taybetî bû. Evan mirov û êlan xwe bi wan lawiran yan bi wan hişaniyan diparaztin û ewanan ji xwe re mîna xweda didîtin.

Dîroknasê Turk Yalmaz Awiztona di pirtûka xwe "dîroka dewleta Osmanî" de nivisiye: Turk bawer dikin ku bavpirê wan yê herî pêşîn gurê bersorî bû û ji ber vê jî gur bûye nîşana niştimanî ji Turkan re .. "

Herweha dîrok dîsan dibêje: Cihwarê Turaniyan yê kevin pir bor û belengaz bû, ewanan ji bo berdewamiya jiyana xwe hevrikiyên dijwar li dijî jiyana tazî û hişk dikirin, lewra jî Turanî bi sertî û lêxistinên hovane perwerde bûne, ewanan ji ber birçîbûnê hêrişên xwe dibirin ser dirawsêyên xwe, " gelên Ariyanî" (Afganistanî, Îranî, Kurdistanî) çimkî evan herêmanan bi saman û şaristaniyên xwe dewlemend bûn.

Mîna di dîrokê de hîn hatiye destnîşankirin ku berê, her êlekê yan miletekê di cengan de duruşmek mîna Xwedayê xwe yê mêtolocî bilind dikir, ji ber vê jî

durişma Turaniyan mîna dîdema "Qizil qurtê" bû, lê gelên Arî nîşana hetawê mîna Xweda di şeran de hildidan jor ...

Wek di dîrokê de hatiye gotin; ku pêxemberê Araynî-Mîdî Zeredêşt li gel 80 peyrewên xwe li pîrozgeha bajarê Belexê (Afganistan) bi destên Turaniyên, yên ku xwe mîna gurên bersorî "Qizil qurtê" peçinandibûn, hatine kuştin.

Di pêvajoka dîroka Îslamî de Turaniyan herdem hêrişên xwe birine ser Farisan û Kurdan, lê ji nav gelên Aryanî, milletê Kurd pirtir ziyar ji dest "Gurên bersorî" (Qizil qurt) dîtiye. Li gor nirîna lêkolîvan Dr. Ehmed Xelîl, peyva "Qizil qurt" damarên xwe bi kuranî berdane hişên Kurdan û ewana ta roja îro vê peyvê wek tirsdayinekê bi kartînin.

Cenga çekdarî di navbera Turaniyan (Osmaniyan) û Farisan de dîsan ji bo dagîrkirin û çewsandina samanên Kurdistanê bû, li dawiyê welatê me di nav xwe de di sala 1639 an de parvekirin. Lê gelê Kurd ji berê de destgirêdayî nemaye, welatparêzên Kurd mîna mîr Bedirxan raperînek li Botanê kir û konfêderliyek Kurdî (1830-1845) li wê herêmê damezrand, lê mixabin dîsan (Gurên Bersorî) Mîrşena Bedirxan rûxandin. Piştî hevpeymanê Saykis-Pîko di sala 1916 de Kurdistan bi destên Firansa û Êngilîz careke din parvebû. Bi vî rengî dijminan welatê me ji xwe re zepkirin.. Lê pîrsa giring ev e; ma gelo netewperestên Kurdan xwe radestî neyarên kirin? Bê guman mêjoya Kurdî ya nûh bi raperîn û şoreşên xwe mişt e, gelê Kurd ta niha bi melyonan keç, law, jin, mêr kirine qurbanên Kurdistanê, û nijadperestên Turkan bi hêrişên hovane

belgeyên dîroka mirovperweriyê bi xûna Kurdan û Ermeniyan sor kirine.

Tevî van babeltên mezin, gelê Kurd bi hemû awayî berxwedaye, welatê xwe Kurdistan biparêze.

Tevgera Kurdî bi dehên salan e ku xebatên çekdarî û siyasî dike, dadmendiya kêşa Kurdî hêdî, hêdî li gorepana cîhanê de cihê xwe distîne û damezrandina destlata Kurdî piştî raperîna 1991 ê li herêma Kurdistanê mîna keke ronak e.

Li aliyê din di sala 1984 an de bizava çekdarî jî carek din li Kurdistana Turkiyê bi seroketiya birêz Ebdela Ocelan destpêkir, şoreşa E.Ocelan jî serê destlata Turkên turanîst û kemalîst pir tengkir, helwesta nijadperestên Turk li dijî gelê me li her derê her tund û tujtir bû û li dawiyê bi pîlaneke navdewletî mezin serokê PKK hate girtin. Dijminên azadiya Kurdistanê, ango serdarên Turkiyê "Qizil qurtên Turkiyê" hevdu pîroz dikirin wekî ku şoreşa Kurdistana Turkiyê aşbetal bû, lê weke Ereba dibêjin; "Hesabê sokê li sendoqê nehat", piştî demekê dîsan şerê çekdarî li dijî roviyên kîndar destpêkir, lê di navberê de, P K K pir caran jî ala aştiyê jî hildida jor, lê mixabin Turaniyên nûh mîna bavpîrên xwe naxwzin hebûna gelê Kurd mîna neteweke serbixwe, xawên welat û şaristaniyeke serbixwe nas bike. Ewanan ne tenê li dijî PKK ne, lê li dijî hemû partiyên Kurdistanê ne, li dijî çand û kelepûra Kurdî ne.

Bi kurtebirî PKK û hemû rêxistinên din Kurdistanê, ne evîndarên xûnrêtinê ne, ewanan tenê dildarên azadiyê û civaka mirovperweriyê ne ..lê dîsan emê bêjin: Gelek mixabin zimanê destlata Turkiyê tenê mîna zimanê "Gurê

Bersorî" ye, ewa tenê dixwaze bi her şeweyî milêtê me, welatê me, ji nava dîroka civakê hilîne û hemû samanên Kurdistanê ji xwe re bi darê zorê bistîne. Lewra jî, eger stêrkek li kîjan beşê Kurdistanê geş bibe, Turaniyên nûh bi alîkariya hin rêcîm û rêxistinên regezperest li Rojhilata Navîn dest bi lîstikên xwe li dijî pêşketin û azadiya Kurd dikin .

Piştî ku rêcîma Sedamê dîktatur di sala 2003 an de hate rûxandin, komara Îraqê ya fêderal hate damezrandin, agir û pêt ketiye paşelên Turkên Turanîst û yên hin dewletên mîna Sûriyê, Îranê û gelek hêzên din yên şovênîst. Her yek ji van dewlet û rêxistinên bi awayê xwe ya nemaze li dijî Îraqa fêderal û bi taybetî li dijî Kurdistanê azad dixebite. Em pir texmîn dikin ku hin hêzên destlata Îraqa fêderal hevgerêdanên xwe bi neyênî bi dewleta Turkiyê re hene, ewanan hin caran bê hevaltiya nûnerên Kurdan, diyalogan bi dewleta Enqerê re dikin, kî dizane ku ev herdu alî bi hev re çî pîlanên li dijî herêma Kurdistanê Îraqê dihûnin ??? Kî dizane ku belkî hin aliyên destlatdar, weke Ereb bi xwe dibêjin: ( Hamîhe û heramîhe) yanê (him diparêze û him jî didize ), bi ya me be, ev pîlana hîn ji hukumeta Dr. Îbrahîm Elceferî de destpêkiribû. Eger nûnerên Kurdan li Îraqê û hukumeta herêma Kurdistanê bi seroketiya têkoşerê gewre M. Berzanî li yasa 140 î xawên derdikevin û daxwaza pêkanîna wê dikin, hemû aliyên nijadperest û ne dêmokrat ji tirsê re dilerizin, û Kerkuka Kurdistanê di xewnên rojan û şevan de dibînin, lewra jî Dr. Nordîn Elmalikî, wê siyaseta xwe berdewam dike.

Çima Turkiyê ewqas dixwaze bi lez gefguran bide gelê Kurd û hukumeta herêma Kurdistanê ?!-Bê guman

cerkî ku perlemana Kurdistanê di sala 1992 an hatiye damezrandin û hukumeta Kurdî hema, hema herêma Kurdistanê mîna herêmeke serbixwe birêve dibe, û ewa bi alîkariya gelê xwe yê pîdar, Kurdistanê di hemû warên jiyanê de pir zû pêşda dide, lewra jî çavên Turkiyê û hevalbendên wê pir teng û sor dibin.2- Di rûxandina rêcîma xûnvexwer de, rola partiyên Kurdistanî di qada navnetewî de zor berçavkirî bû 3-.Rêvebirên Kurdistanê bi seroketiya rêzdar Mam Celal Talbanî û rêzdar kek Mesud Berzanî bi hişmendiyeke siyasî bilind û gelek hevpîvayî têkeliyên xwe bi hêzên Erebên Sinî û Şê- î re ava kirin û di encamê de gelek hêz û kesayetiyên Ereb li Îraqê helwesteke erênî dermafê gelê Kurd û herêma Kurdistanê wergirtin3-Li ber çavên dagîrkerên Kurdistanê, hukumeta herêma Kurdistanê

pêwendiyên siyasî, dîplomasî, aborî, perwerdeyî bi dewletên Ewropî re çê dike.

4- Hêzên leşgerî li herêma Kurdistanê pêşda diçe.5- Hêzên pêşmergehên gehreman hîn Kurdistanê diparêzin ..

5-Dewleta Emêrika ta roja îro li rex gelê Kurd û hukumeta herêma Kurdistanê radiweste, û piştvanîya mafê gelê Kurd li wir dike, lewra jî destlata Turkiyê pir ditirse ku Emêrika hîn bi ser vê de jî baregeheke leşgerî li Kurdistanê ava bike û stunên herêma Kurdistanê hêztir bibe û paşê wireyên gelê Kurd li beşên din jî bilindtir bibe û têkoşîna gelê me li Kurdistana bindest de jî bi vîneke pola bête vejandin..

Ji ber van sedemên jorîn, perlemana Turaniyan di 17.10.2007 an de, bê ku ewa ji dîrokê û komelgeha cîhanî şerm bike, çira kesk ji çêlkên Gurên Bersorî re

vêxistin ku ewanan hêrişên xwe bibin ser navçeyên herêma Kurdistanê û niha bi hezaran leşgerên Turk li ber sênora Kurdistanê ne..Vêca niha pirs ev e; ku dewleta Turk dê rast têkeve Kurdistanê yan na ? Eger em li gor siyaset û logîka hişmendî texmîna xwe derbibirin, divê em bêjin na ! Turkiyê gefgurên mezin mîna rastiyeke ji Kurdan û ji dewletên hevpeyman re dide diyarkirin, ta ku ewa tirsê têxe dilên rêberên gelê Kurd û di encamê de, ewanan dengên xwe ji bo pêkanîna xala 140 ji destura Îraqê nizam bikin ta ku pirsê Kerkukê weha tepisî û bincil bimîne.Erê Turkiyê bi awakî stratîcî naxweze ku Kerkuk di bin sîbera destlata Îraqê de jî bimîne, lê niha ewa li gor rêbazeke tektîkî mayîna Kerkukê di çarçewa erdnîgariya siyasî ya herêma Erebî de bimîne, dipejirîne.

Lê ta roja îro destlata herêma Kurdistanê bi seroketiya birêz kek Mesud Berzanî û serokê komara fêderal rêzdar Mam Celal Talbanî bi her awayî ji aliyên xwe de, tu kompîrîmîs li hember dewleta Turkiyê destnîşan nekirine.. , lê berevajayî vê yekê, ewanan herdem li ser kêşa Kerkukê radiwestin û di heman demê de jî ala aştiyê û dostaniyê hildidin jor. li aliyê din jî gengaz e, Turkiyê dixwaze ku hukumeta herêma Kurdistanê şerê çekdarî li dijî girîleyên PKK bike û agirê şerê birakujiyê di nav herdu aliyên de vêxe, lê ta roja îro rêberên gelê Kurd bersivên dewleta Turkiyê zor bi sinciyeke siyasî bilind didin û ewanan pîr bi zelaî ji raya giştî re dibêjin: Em rêberên PKK jî radestî Turkiyê nakin û em daxwaza çareserkirina kêşa Kurdî li Kurdistana Turkiyê bi awayên aştiyane dikin..., îro Serok Mesud Berzanî di kenala Elcezîr de dîsan bi vê wateyê got: (Ev sed salên destladarên Turkan bi şer û cengan dixwazin dawîya kêşa

Kurdî hûnin, lê bila ewanan carekê tenê jî, riya aştiyê û diyalogan bi karhûnin).

Lê eger dewleta Turkiyê rêzê li yasa û desturên navdewletî neke, bi zikreşî û kînên kor derbazî gund û bajarên Kurdistanê bibe, vêca çi ji hukumeta navendî li Îraqê, ji dewletên hevpeyman mîna Emêrika û Birêtaniya, ji komelgeha dewletên Erebî û ji Netewên Yekgirtî tête xwestin??? Ma gelo evan dewletan dê destgirêdayî bimînin?Ma gelo hukumeta fêderal, dê dagîrkirina Kerkukê ji aliyê dewleta Turkan de bipejrîne ?lê dewleta Turkiyê weha soz daye hin rêberên fermî di hukumeta fêderal, ku ewa dixwaze bingeha herêma Kurdistanê ji hemû aliyan de birûxîne ??

Di siyasetê de her tişteke gengaz e, bersivên van pirsên jorîn em vekirî ji vîna azad re dihêlin, lê di herhal de gelê me li Kurdistana Başur amede ye ku berevaniya ax û rûmeta welatê xwe bike û her weha jî em di vê baweriyê de ne ku gelê Kurd li sê beşên din jî dê li hember van hêrişên hovane bêdeng nemîne. Li dawiyê em dixwazin bêjin: Mişk axê dikule û wê li nav çavên xwe dike).  
**BEIKÎ JÎ DEWLETA TURKIYÊ DIXWAZE HIN CARAN BIBE MIŞK !.**

27.10.2007

Almaniya ,malpera Pena Kurd û Welatî .net.

**Jina Kurd di pêvajoka dîrokê de,  
rewşa wê niha çi ye?  
Rêyên pêşketin û azadiya jina Kurd çi ne ?**

**Kurtelêkolînek**

" Yê bêje û bike , mêr e,  
yê ne bêje û bike şêr e,  
yê bêje û neke kerê nêr e."  
Ji pendên Kurdî

Pirsa jina Kurd ji zû de li nik hin Ewropiyan û li cem hin Kurdên bîrewer bûye mijarek balkêş, li gor hin çavkanî diçespînin ku Lecy M.J.Gornet di sala 1891 ê de pirtûka xwe (Jin li Turkiyê û folklura wê) weşandiye. Di vir de lêkolînan bi qaserî 80 rûpelan terxandine kar û ayinên malbetî yên jina Kurd.

Dîsan N.A.Simîrnove pirtûkeke serbixwe (Jina Kurd )di sala 1927 an de li Mosko çap kiriye, li gor texmînan ev berhema yekem e ku petî li ser jina Kurd hatiye nivîsîn.

Di nirîna lêkolîner Rohat Alakom de jineke danîmarkî Henny Harald Hansan baştirîn pirtûk li ser jina Kurd bi navê ( Jina Kurd ) li Kurdistana Îraqê bi zimanê Êngilîzî di sala 1961 ê de weşandiye.Dîsan vê lêkolînera danîmarkî

berhemek bi navê ( Keçên xwedê di nav jinên Musliman de li Kurdistanê) nivisiye, R.Alakom dibêje: (Henny Harald Hansan dayika lêkolînên li ser jinên Kurd e).

Lê ji nav gelê Kurd, Mehmudê Beyazîdî yekemîn kes e ku berhemeke berferh bi navê (Erf-edetên Kurdan ) di sedsala 19 an de nivisiye, di vê pirtûkê de ew li ser rewşa jina Kurd, destlat, têkoşîn û ayinên wê rawestiyaye, zaniyara nasdar M.B.Rodênko ji ber giringiya vê pirtûkê, ewa di sala 1963 an de wergerandiye ser zimanê Rusî.

Ji bilî van kesayetiyan jorîn hin kesên biyanî, mîna karmend, gerokan, Misyoneran (oldarên xaçeperest ola xwe bi gelên Rojhilatê jî didan nasîn ) li ser jina Kurd nivîsîne. Ji wan ev in: C.J.Edmunds, E.B.Soane, Gasparad Droville, Wilhelm Köhlner, Moritz Wagner, Pietro Della Valle û h.d.

Di sala 1948 an de nivîskar Emînê Evdel yekem Kurd bû ku berhemeke zanistî li ser jina Kurd bi navê ( Jina Kurd angorî metiryalên (berhemên.) êtnografî û folklorî di malbeta pederşahî de pileya doktriyê li ser vê berhema xwe ya zanistî li Rewanê wergirtibû.). Herweha Emînê Evdel dîsan pirtûkek bi navê ( Pêwendiyên pismametiyan ) di sala 1965 an de daye çapkirin, di vir de nivîskar pir bi awayeke berferh li ser jina Kurd rawestiyaye .

Cara yekem e pirtûkek xwerû bi navê (Afreta Kurd) bi zimanê Kurdî ji aliyê nivîskar Şakir Fetah, di sala 1959 an de roniyê dibîne.

Di sala 1984 an de keçeke Kurd ji Rojavayê Kurdistanê Leman Îbrahîm li ser berhemeke zanistî ( Cihê jinên Kurdistanê di nav rûpelên weşanên Kurdî yê

pêryodîk de), ji zanîngeha Lênîningradê ya berê, pileya Macêstêr di pêşeya rojnamevaniyê de distîne. Herwisa jî lêkolîner Rohat Alakom pirtûkek gelek dewlemend li ser jina Kurd ( Li Kurdistanê hêzeke nû- Jinên Kurd) di sala 1995 an de bi zimanê Kurdî li Siwêdê weşandiye, di baweriyaya me de cihê vê pirtûkê û rola wê di nav dîroka jina Kurd de zor bilind de.

Herwisa jî di van demên dawiyê de gelek nivîskarên kurdistanî bi berhem û nirînên xwe xwendina li ser pirs û kêşeya jina Kurd dewlemend kirine, em tenê ji bo nimûne dixwazin navên çend xemxwerên doza jina Kurd û çend berheman li vir hûnin zimên, 1-Narîn, 2-Helîme Omer (Netewa yekbûyî û setemkarî li dijî jinan)", ( Ketina jinê hundir qesrê gunehkarî ye) , (Keça ciwan û asoyên pêşeroj), (Pirbûna jinanînê ji bo mêrekî li dijî mirovpereweriyê ye), (Çawa em serbestiyê di nav rêzikên çîna bîrewer de têdighînin) . 2-Lava Xalid (Jinberdan , ewa û ewî, ) 3- Saman Emîn (Jin û dîsan jin û li dawiyê dîsan jin) 4-Konê Reş (Pencera jinan), 5-Rewşen Qasim (Jina Kurd di navbera seyrana têkoşînê û hevîbirîna dadmendiya de ) 6-Suad Cegerxwîn ( Mafên mirovane yên jinan) 7-Hoşeng Osî (Şêr şêr e çi jin e çi mêr e ) 8-Dr.Mihdî Kakayî (Jin û sêstêma cîhanî ya nû) 9- ( Hevpeyvîn bi Vînos Faîq re), Dr.Midiya Mehmud.10-( Wateya azadiya aborî ji jinan re çi ye ? ), û bi dehên din lêkolîner, nivîskar, malperên Kurdî, televîzyonên Kurdî berxwe didin pirsgerên jinên Kurdistanê şirove bikin.

Wek ji me re diyar bûye, hemû biyaniyan pesna jina Kurd dane, chi û rolên wan di civakê de li gor jinên mîletên dirawsê baş dîtine û ew rastiyên dîrokî di nav pirtûkên xwe de bi chi anîne.Em li jêr wek çend mînakên

pelandî tûnin zimên. Gerokê îtalî Pietro Della Valle bi hevsera xwe re serdanê li Îraqa niha û Îranê dike, ewan dibin mêvanên malek Kurdan, pesnê jina malê Sultan xanimê didin û dibêjin: (Ewa bi tenê li mal bû, em pêşwazî kirin, xwarin û vexwarin ji me ra pêşkêş kir..) , G. Droville di destpêka sedsala 19 an de ji gera xwe vedigere û dinivîse: (li vir Herêmên Kurdistanê li Îranê-M.Şêxo ) jin ji jinên Farisan pirtir serbest in, piraniya wan bi sibê derdikevin û ta êvarê li derva dimînin, eger ewanan kuda diçûn, mêrên wan xemên wan nedixwarin.). W.Köhlner gotiye: (Li Rojhilatê tu jin bi qaserî jinên Kurd azad nebûn e .) , C.J.Rich di pirtûka xwe ya li ser Kurdan de li ser jineke Kurd ya Amazon (a koordîsh amazon ) (Bi mebesta jineke têkoşer) dipeyve: (ji êla Bilbasî jinek hebûye, ewa baş li hespê sîwar dibû û mîna mêran cilûberg li xwe dikrin, rojekê ji rojan, peyakî Turk dixwaze namusa wêbişkîne, eva jina Kurd bi rimê li wî Turkî dixwe û dîkujê..)

Dîsan li gor Rohat Alakom dinvîse: (Mîsyonerekî Emêrîkî li serê çîyan, di rêkeke teng de rastî jineke Kurd tê, ewa ji nişkava hemû barê kerê xwe bi qaserî 50 kîloyê dide ser piştê xwe, bi meşa xwe dikeve pêşîya kerê, û bi ser da jî bi destekî teşîya xwe dirêse). Lê Henny Harald Hansen rola jina Kurd weke (Hêza Kurdistanê ya nû ) bi nav dike.

Li gor nirînên biyanîyên ku me li jor bi navkirine û li gor hin cihderên din; dîroka jina Kurd ji pir alîyan ve, bi gelek rudawên xwe ve li gor jinên gelên dirawsê pêşketîr bûne, ewanan herdem mîna nimûneyên geş di nav jinên Rojhilata Navîn de hatine danasîn.

Di derbarê jina Kurd de mîna me li jor nivîsiye: Gelek pêzanîn hewasdar di berhem û lêkolênên bîrewerên Kurdan de jî hatine nivîsîn. Rola jina Kurd di hemû aliyên jiyanê de pir caran bi erênî hatine destnîşankirin, wek nimîne: jina Kurd dikarîbû rola navber di nav du êlên hevdij de(ango yên li dijî hev şer dikirin) bilîsta û agirê şer di nav wan de vemiranda. Nivîskar Erebe Şemo di bîranînên xwe de gotiye: Di navbera êlên Hetroşa û Simîreka şer çê dibe, diya min Gewrê laçika serê xwe derdixe û li nik wan wê davêje erdê û dibêje wan herdu êlan: Bese hûn xwîna hevdû birêjin! Bese vekşin ! piştî van gotinan herdu êl şerên xwe radiwestînin. Eva li aliyekê, li aliyê din Kurdan di şerên nav xwe de li jinan nexistine, û bi ya me be, ev tun rêzlêgirtin ji refên jinan re, ta roja îro hatiye parastin, eva bê guman aliyekê ji şaristaniya mêrên Kurd baş dide diyarkirin.

Dîroka gelê Kurd hîn dibêje: Di sedsala deh û yanzdan de navên jinên Kurd di wara wêje de jî de hatine geşkirin, mîna nimûne: Daya Tebrez Hewaramî, Celale Xanim Luristanî, Reyhan Luristanî, Xatun Meyzad, Daya Xazan Serkat .

Piştî Selah Eldîn Eleyobî diçe dilovaniya xwe, kurê wî dewsa bavê xwe di serdariyê de dike, piştî maweyekê ew jî hate kuştin, vê carê hevsera Selah Eldîn Eleyobî, Şeceret Eldure şûna kurê xwe destlatdariyê li Misirê dike, hemû karûbarên giran têne ser şanên wê, lê paşê diyar dibe ku Muslimanên rikrewî nikanîbûn serdariya jineke Musliman bipejrandana, lewra jî ewa bi destên Muslimanên asoteng û şûnmayî têtê kuştin.Em li vir ji dîrokê têdighînin ku li nik Kurdan jina Kurd dikane bi sanahî şûna mêrê xwe yan bav û birayê xwe di pir aliyên

jiyanê de bigre. Yekemîn dîrokzanê Kurd Şeref Xan Bedlîsî di berhema xwe ya dîrokî de van rastiyan diterxîne û ew weke nimûne dinivîse: Dewlet Xatun jî piştî mirina malxûyê xwe rêbertiya êla xwe dike .

Serpêhatiyên (Kelha Dimdimê ) ya di salên (1608-1610) ê de li dijî Şah Ebasê yekem û qehremantiya jinên Kurd di wê berxwedana mêrane de, rûpelên mêjuya jina Kurd geş kirine, ji ber vê jî bûyerên (Kela Dimdimê) li nik pir wêjevanên Kurd bûne mijarên giring di berheman de, mîna nimûne: Yekemîn romannivîsê Kurd Erebe Şemo romanek bi navê ( Kelha Dimdimê) nivisiye, ewî di vê ramana dîrokî de qehremantiya jinên Kurd û berxwedanên wan li dijî leşgerên Farisan baş dide xûyakirin, ewî weha nivisiye gava hêzên Şah Ebas hêriş birin ser (Kelha Dimdimê) mêr û jinên Kurdan bi hev re û bi serdariya Emîr Xan( Xanê Lepzêrîn ) pir berxwedan li dijî wan kirin, li dawiyê, leşgerên Farisan zora Kurdan dibin, lê jinên Kurd nexwestin di vê cengê de xwe radestî dijminên xwe bikin, lewra jî pirên wan xwe ji(Kelhê) avêtin xwerê, û xwe kuştin, û hinekan xwe bi cehrê kuştin, û hinekan ji wan (Kelha) bi ser xwe de hilweşandin, û jinên mayîn mîna dîl û yexsîran ketin ber destên leşgerên dijminan.

Lê helbestavanê navdar Hêmen dinivîs: Piştî şeş salan jinek ji jinên Mîr Ebdela Xan dîsan (Kelha Dimdimê ) ji Farisan rizgar dike.

Em li ber roniya van bûyeran bawer dikin ku jinên Kurd tevî hemû dijwariyên jiyana xwe ya taybetî, li rex mêr, bira û bavên xwe di çareserkirina pirsgirêka Kurdistanê de rawestiyane, û ne hêştine ku namusa wan

di nav lepên dijminan de bête berbatkirin, ev ne tenê nîşana welatparêziya jinên Kurd e, lê bi ya me be ewa dibe nîşana xweparastina rûmet û sinciyê jî.

Di sedsala 17 an, di dîroka jinên Kurd de dîsan Mîra Soranê Xanezade Sultan gernas dibe, ewa nîzîkî (13) salan navçeya Soran bi rêve dibe û ewa serdariya (12-40) hezar leşger dike, bi ser da jî ewê gelek Kelha li wir ava kirine, û ta roja îro (Kelha Xanzade Soran) li herêma Soranan nas kiriye .

Di salên (1750-1794) an de Muhemed Kerîm Zend hukumetek Kurdî li Kurdistana Îranê damezrand, lê Îran bi xwe jî di vê demê de, di bin destlatdariya Efxaniyan de bû, Kurdan li gel Farisan li dijî Efxaniyan şerkirin, di vî şerî de jinên Kurd dîsan bi wêrekî û mêrane li rex mêt û birayên xwe li dijî Evxaniyan şerkirin, çavên leşgerên Evxan ji çalakiyên jinên Kurd pir tengbûn, ewanan bi xwe dîtine ku çawa mêrên Kurd bi xwe re jinên Kurd jî dibin şer, lê li aliyê din serbazên Evxaniyan nikanîbûn û nexwestine jinên xwe bi xwe re bibin şer, lewra ewan tinaziyên xwe bi Kurdan kirine û gotine: (Mêrên Kurdan ketine bin dawên jinên xwe) .Lê em van gotinên wan bê dudilî li vir pir bi erênî dinexînin û em dibêjin dijminên Kurdan bê mebesteke pesneyî bi xwe dibin çavnirînavan ku çawa jina Kurd ne tenê bermaliya malê bûne, lê ewanan herdem têkoşer û hevalên mêran jî bûne.

Di destpêka sedsala 19 an (1805-1847)de jinek dîn Kurd li Rojhilata Kurdistanê(Senendecê li Mîrşena Edelanê ) bi navê Mah Şeref Xan (Mestore ) mîna helbestvan û dîrokzan pir navdar dibe, lê pêwîst e em li vir biçespînin ku rola bavê Mestorê di perwerdekirina

keça xwe de zor bala bûye, ewî keça xwe tim li malê ne dihêşt, ewa bi xwe re dibir her deverekê, ewî ji Mestorê re keys û derfet amede dikirin, li aliyê din jî Mestorê xwe şûnda venedikişand û ewê mîna keçeke şhereza gelek sudên nirxbuha ji gerên xwe wergirtine û pirtûka wê dîroka (Mîrşena Erdelan) di dîroka Kurdistanê de ji lêgervanên mêjunivîs re herdem cihdereke giring û balkêş e.

Bizûtinewa azadîxwaza Kurd bi awakî gelemper di sedsala 19 an de pêşketiye, hin Mîrşenên Kurdî serbixwe li Kurdistanê hatine damezrandin, lewra jî leşgerên Osmaniyan hêrişên xwe li dijî gelê Kurd pirtir û xurtir kirin. Wek nimûne; leşgerên Osmaniyan bi serdariya Reşîd Paşa di sala 1838 an de hêrişên xwe birin ser Kurdan, di berxwedana Kurdan de jinên Kurd li rex mêran rawestyan û bi hev re li dijî dijminên azadiyê û wekheviya gelan şerkirin, efsere Elman R. Moltkê bi xwe ew şer dîtibû û li ser jina Kurd weha nivîsîbû: Min dît çawa jineke Kurd bi xençerê leşgerê Turk kuşt.

Dîsan mînakek berçav; di rapêrîna Mîr Bedirxan, sala 1842 an de jineke Kurd, Helîme Xanim, hevsera Mîr Noreela Beg navdar bû, ewê destlatdariya kelha navçeya Boşkalî dikir.

Di dîroka gelê Kurd de herdem baş diyar bûye ku çawa Kurd bi hilmeke mirovane, helwestên erênî li rex milletên dirawsê li dijî hêrişên derva istandine, di şerê Kirîmê(Qirmê), sala 1853 an, navbera du Împiratorên mezin, osmanî û rusî de peydabû, jina Kurd Fatma Reş ji Kurdistanê tev 300 sîwarên xwe diçe Îstenbolê û ji destlatdaran re dibêje: Em amede ne li gel we li dijî

leşgerên Rusan şer bikin. Li ser çûyîna wê, rojnameke Almanî nivîsîbû (Şêra Kurdistanê gihaye Îstenbolê) Dîsan xanim Fatma Reş di cenga (1877-1878) an de li dijî Rusan hevpar bû, ewê 500 leşgerên Kurd ji bo piştvanîya leşgerên Osmanî şandin qada şer. Bi vî rengî têkoşer Fatma Reş di cîhana Ewropî de jî mîna qehremaneke navdar hatiye nasîn û wêneya wê jî di nav rûpelên rojnamên Ewropî de hatiye weşandin.

Di destpêka sedsala 20 ê de jina Kurd, Qedem Xêr li Luristanê li Rojhilata Kurdistanê dewsa birayê xwe Yosif digre û ewa pêşengiya serhildanê li dijî Şahê Îranê berdewam dike, piştî berxwedaneke dirêj, Sahê Îranê bi alîkariya Omer Xanê Şikakî êrişeke mezin dibe ser vê serhildanê, lê Qedem Xêr ta dawiyê berevanîyê dike, paşê ewa ji aliyên hêzên Şah ve tête girtin, ewa sê salan di girtîgehê de dimîne û bi nexweşiyê di wir de jî pakrewan dibe .

Piştî rûxandina Împiratora Osmanî çalakîyên jinên Kurd pirtir bûn, jinên Kurd rewşa xwe ya şundamayî baş dîtibûn, erkên xwe jî rind nas kiribûn, lewra ewanan (Komela pêşketina jinên Kurd) di sala 1919 an de li Istenbolê damezrandin. Hîn di destpêkê de berpirsiyarek ji vê komelê, Encam Yamlukî rola jina Kurd di pêşketina jînê de dabû xûyanîkirin, û wê gotibû (Îro pêşeroja hemû netewan dikeve qunaxeke nû, di wê qnaxê de, ji her kesekî re mafek tête dayîn, em jî mafên xwe dixwazin). Li gor pêşniyara (Komela pêşketina jinên Kurd ) Emîne Xanim jina Şerîf Paşa ya ku di wê demê de li Parîsê dijiya, dibe seroka vê komela jinan.

Pisporê dîrok û kêşa Kurdî M. Lazêrêv nivisiye: (Kurdan li rex Turkan li dijî Yonaniyan di sala 1920 ê de şerkirine, û Fatme xanim keça apê Simko di vî şerî de cilên leşgerî mîna yên mêran li xwe dikir û serkêşiya 100 leşgerî Kurd dikir.)

Piştî 1923 an de bergeheke nû li Turkiyê û li Kurdistanê destpê dike, raperîn û şoreşên Kurdî mîna, şoreşa Şêx seîd Pîranî di sala 1925 an de, şoreşa Araratê 1930 î de, şoreşa Dêrsimê di sala 1938 an de li dijî Kemalîstan çê dibin. Di van şoreşan de bi hezaran jinên Kurd bi hemû şêweyên hovane hatin şewtandin û zikên wan hatin qelaştin, pir keç û jinên Kurdan ta ku xwe radestî dijminan ne kin, ji neçarî xwe avêtin binî newalan yan jî nav çeman, herweha jî gelek jin ji aliyê Turkan de dihatin girtin û ewanan bê mêrên wan re dişandin Rojavayê Anadolê. Em dixwazin li vir mînakek tenê derbarê helwesta jina Kurd ya mêrane hûnin ziman; Ezet Beg û kurê xûşka xwe piştî şoreşa Şêx Seîd têtin kuştin, serên wan ji laşên wan dibirin û wan seriyan dişînin Muşê, destladarên Turk xûşka Ezet Begê, Gulnazê ji zîndanê derdixin û wan herdu seriyan nîşanî wê dikin. Gava Gulnaz serê lawê xwe û serê birayê xwe dibîne, ewa yekser dibêje: (Ev kurê min e ji bo vê rojê min şîr daye wî, eger min ji bo Kurdistanê ewa weha ne dîtibûya, minê şîrê xwe ji wî re herem bikra.).

Di destpêka sedsala bîst an de Hefse Xanim Neqîb bi navûdeng dibe, ewa malxûya Şêx Qadir û paltoza Şêx Mehmud bû, ewa di sala 1881 ê de ji dayik bûye, di sala 1953 an diçe ser dilovaniya xwe. Ewê dîwanxana xwe kiribû mîna navbendeke xwendinê û dibistaneke êvarene ji bo jinan vekiri bû. Bi ser vê de jî Hefse Xanim

avahiyeke xwe ji bo vekirina dibistanekê raberî (Komela zanyarî) dike. Hefse Xanim ne te tenê balên xwe daye rewşa civakî û ronakbîrî, lê belê ewa hîn şehrezatir bû, ewa hîn di sala 1930 î de nameyekê dermafê doza azadiya gelê Kurd de ji (Rêxistina Yekitiya Miletan) re dişîne û di namê xwe de balên nûnerên gelên cîhanê ber kêşa Kurd ya rewa de dikşîne.

Li gor çavkanî dibêjin: (Xanim Hefse bi rindî û helwestên xwe yên mirovperwerî Şêx Mehmud ji sêdarê rizgar kiribû di vê derbarê de weha tête gotin: Di dema ku Êngilîzan li Kurdisanê li dijî Şêx Elhefîd şerkirin, çend efserên Êngilîzan ji aliyên Kurdan de hatin yexsîrkirin, Hefse Xanim ne dixwast ku Kurd zîyanê bighînin wan efserên Êngilîzan, ev qencî û dilovaniya Hefse Xanimê li cem Êngilîzan ne hatibû jibîrkirin, ji ber vê jî Êngilîzan biryara darvekirina Şêx Mehmud sivik kirin û li şûn wê biryara zîndankirinê ta dawiya jînê dermafê wî de derxistin.

Dr.Kemal Mezher dinivisîne: (Fatme Mihye-eldîn xanima şalyarê darayî Ehmed Beg kurê Fetah Begê di hukumeta Şêx Mehmud de yekemîn mamoste li Îraqê bû, wê yekemîn dibistana jinan bi navê Elzehra di sala 1926 an de li şarê Sulêmniyê vekir, jinên mezin bi temenê 25 saliyê jî di vê dibistanê de pola yekê dixwendin, jinên dewlemend û yên belengaz jî li wê dibistanê hîn dibûn).

Jineke din Adile Xanim (Di sala 1859 an de ji dayik bûye û di sala 1924 an de diçe dilovaniyê ). Ewa li Erdelanê gewre dibe, keça efserkî Kurd bû, lê ewa di sala 1895 an de bi serokê êla Caf ( li derdora bajarê Helebce) Osman Paşa re dizewice, ewa bi mêrê xwe re, êla Cav bi

rêve dibe, gava ku Osman Paşa di sala 1909 an de dimre, Adile Xanim bi tenê destlatdariya Helbece 15 salan kiriye, wê di vê demê de bazarganî, çandinî û avahî li Helebce pir pêşda dabûn, dîsan wê dadgehek li bajêr avakir û ewa bi xwe jî dibe seroka vê dadgehê, herweha wê zîndanek jî li wir ava kirbû.

Di sala 1946 an de komara Kurdistan li Mahabadê bi seroketiya Qazî Muhemed hate ragihandin. Qazî Muhemed baweriya xwe bi hêz û mafên jinan hebû, ji ber wê jî ewî ji malê xwe de dest pêkiribû û di wê salê de jî (Yekitiya jinên Kurdistanê) tête damezrandin, Mîne Xanim malxûya serokê komara Kurdistanê dibe seroka wê rêxistinê. Di jiyana komara Mehabadê de bizava jinên Kurd li Kurdistanê bi lez pêşda diçû, di her kolaneke Mehabadê de jinek ji bo seroketiya wê kolanê dihat destnîşankirin. Qazî Muhemed pir piştvaniya têkoşîna jina Kurd dikir û wireyên wanan bilindtir dikir, wek nimûne: Gava destlata Şahê Îranê komara Mehabadê rûxand, biryara darvekirina Qazî Muhemed derxist, Mîne Xanim digriya, Qazî Muhemrd ji wê dipirsî: Tu çima digrî? Pêwîst e jina Kurd ne dîgrî û girî qet li jina Kurd nayê.

Di sala 1952 an de rêxistina jinan ya yekem bi navê (Yekitiya Afretanî Kurdistan) û bi alîkariya (Partî Dêموکراتî Kurdistan) li Kurdistana Îraqê hate damezrandin, seroka wê rêxistinê ji destpêkê de Zekiye Heqî Îsmâîl bû û paşê Şêrîn Îbrahîm dibe seroka wê, şaxên wê li çar bajarên Kurdistanê Hewlêr, Sulêmaniyê, Dohok, Kerkuk hene, evê yekitiya afretan piştvaniya şoreşa Îlolê di sala 1961 ê de dikir, ji nav wê rêxistinê pêşmerge jî peyda bûn, pir jinên Kurd baweriyên xwe bi serok M.M.Berzanî xurt bûn, jineke Kurd ji rojnameke

biyannî re goti bû: Eger Cenêral M.M.Berzanî çi ji me bixweze, em amede ne.

Di sala 1957 an de kongireyek li dijî koledarên Rojhilata Navîn û li weletên Deriya Sipî li Atîna, paytexta Yonanistanê hate girêdan. Rewşen jina Mîr Celadet Bedir Xan jî nûnretiya gelê Kurd di wê kongirê de kiribû û di wir de ji bo azadiya Kurdistanê rind axivîbû.

Di sala 1970 î de jineke Kurd bi navê XedîceYeşar li Enqerê di siyaseta kurdeweriyê de nasdar bû û ewa rêbertiya kovara "Rizgarî" dikir, paşê ewa dibe sernûsera kovara ( Ala Rizgarî), dîsan ewa dibe yek ji damezrênerên (Koma Ala Rizgarî) piştî hatina cunta faşêst di sala 1980 î de ser textê dewleta Turkiyê û Kurdistanê, ewa û tev 150 hevalbendên xwe direvin Sûriyê. Xedîce Yeşar diçe Kurdistana Başur û li wir jî sê salan dimîne û ji sala 1983 an de li Ewropa û niha li Firensa dijî, lê mixabin em niha agahiyan li ser çalakîyên wê yên siyasî, yan civakî nizanin.

Keçeke din xwendekar bi navê Leyla Qasim bi têkoşîna xwe pir nasdar bû, Leyla ji bajarê Xaneqînê bû, ewa ji minalî de tev malbeta xwe awereyî Bexdadê bûn. Li vir ewa li zanîngehê, beşê zanyariya civakî dixwîne, û ewa mîna endameke jîr di nav rêzên (Yekitiya Xwendekarên Kurd) de çalakîyên pir balkêş dike, ji ber vê jî ewa di êvarekê de li gel 5 hevalên din Kurd ji aliyên serbazên Îraqî de têtin girtin. Wek tete zanîn li nik dijminên azadiyê û dêmokratîyê, têkoşer herdem tawanbar in, lewra jî destlata Bexdadê evan her şeş xwendekaran li ber telvîzîyonê mîna kesayetiyên gunehkar pêş hemwelatîyên Îraqê dikirin. Rêcîma dîktetur bi hemû

rengan zor dibirin ser Leyla ku ew lêborîna xwe ji destlata faşîst bixweze, lê Leyla bi qehremanî berevaniya xwe û doza xwe dikir, ewê rûmeta gel û welatê xwe di ser her tiştî re didît, gefgurên xûnvexwerên şovînîst nikanîn bûn vîna Leyla bitewandana.

Serdarên xûnmêj di 13.05.1974 an de Leyla ya 21 salî û li gel çar hevalên din li sêdarê kirin. Li gor ku cihder û çavkaniyên Kurdî diçespînin, li cîhanê cara yekem e, jinek tête darvekirin. Navê Leyla bi kêmasî li seranserî Kurdistanê bi mêrantî hate bihîstin, ewa pir daran dibû û hîn jî dibe cihderê derbirîna hestên helbestvanan, navê wê li ezmana her kurdekî welatparêz mîna stêrka Gelewîjê vedubrise û ewa bûye beşeke giring ji bizava tevgera jinên Kurdistanê.

Di Kurdistana Turkiyê de bizava jinên Kurdistanê jî li rex tevgera Kurdî pêşda diçû, ewanan jî mîna jinên din li cîhanê sud ji heyama siyasî li cîhanê bi gîştî û ji kêşa jinên cîhanê bi taybetî werdigirtin, lewra jî jinên Kurd di sala 1977 an de (Komela Jinên Dêmkokratên Şoreşger) avakirin. Lê piştî ku cunta faşîst di sala 1980 î de destladariya Turkiyê û Kurdistana Turkiyê dike, ewa karên vê komelê qedexe dikin, û dewleta Turkiyê di sala 1986 an de damezrênerên wê komelê, mîna Methiye, Sebîne, Gulê, Zekiye, Muzeyen, Fethiye tawanbar kir, lê 6 jinên damezrêner jî kanîbûn xwe ji dezgeyên ewlekariyên Turkan rizgar bikirana û bireviyana Ewropa.

Di dîroka bizava rizgarîxweza netewên Kurdistanê de cara yekem jineke Kurd bi navê Sakîne Cansiz di sala 1978 an de dibe endama komîta navbendî ya PKK, lê Sakîne di sala 1978 an ta sala 1991 ê de dikeve zîndanê,

navê wê li nik welatparêzên Kurdistanê Turkiyê baş hatibû naskirin. Di rastiyê de PKK giringiyeke bê sênor dida rola jinên Kurd di xebatên siyasî û leşgerî de, evê partiyê bi hezaran jinên Kurd derxistin qada siyasî û leşgerî, bi sedan kadêr û girîlayên jin bi saya PKK çê bûne, ji sala 1983 an de jinên girêla di şerê çekdarî de li dijî dewleta Turkan ji bo azdiya gelê Kurdistanê beşdar in, li gor lêkolîner Rohat Alkom dinivîse: 3500 keç û jinên Kurd di şerê çekdarî de hevpar bûne û bi sedan, ji wan pakrewan bûne. Di sala 1979 an de (Yekitiya Jinan) li Mehabadê bi piştvanîya P.D.K. hate damezrandin, endamên wê yekitiyê 200 bûn. Di sala 1980 î de hukumeta Îranê hêrişên mezin birin ser gelek bajarên Kurdan, jinên Kurd berxwedanên pîdarî û bi taybetî li bajarê Senendecê li dijî leşgerên dewleta îranî kirin, nêzîkî 300 jinên Kurd ji aliyê dewletê ve hatin girtin û hinek ji wan bi guleyên leşgerên Îranê hatin şehîdkirin. Di sala 1980 î de kovareke Firansî hevpeyvînek bi jina Kurd Şehîn Bawafa re ji bajarê Senendecê çêkir, li gor vê hevpeyvînê, destlata Îranê wê yekser bi gul û qurşînan dikuje. Weke em zanin jî keça Qazî Muhemed Fewziye Qazî di sala 1980 î de dibe endamê komîta navbendî ya P.D.K. li Îranê, û keça wê ya din Efat di roja 6.09.1990 î de li Swêdê bi nameke Îranî dînamîtkirî şehîd dibe.

Mîna di dîroka nû de diyar e, leşgerên Îraqê di sala 1984 an de hêrişên mezin li navçeyeya Behdînan birin ser Berzaniyan, û 8000 mêrên Berzaniyan birin cihên ne naskirî û ta roja îro ewanan winda ne. Li gor vê karên ne mirovane dîsan jina Kurd ziyaneke mezin dibîne, bi hezaran ji wan bê mêr, belengaz û sêwî dimînin. Di sala

1988 an de jî rêcîma hov hêrişên mezin bi navê (Elenfal) dibe ser Kurdan û ewa li gor peyvên xwedê di pirtûka pîroz de li ser (Elenfalê) her tiştî ji xwe re rewşa dibîne û dîsan bi hezaran mêr û jin revandin, ewanan birin şûnên ne naskirî û binaxkirin, bi hezaran jin bê mêr, keç bê bav û dê dimînin, di gelek gundên Kurdistanê de jin tenê mabûn. Seroka (Yekitiya Afretên Kurdistanê) Şêrîn Îbrahîm ragihand ku 10000 jinên Kurdistana Îraqê ji bo azadiya welêt şehîd bûne.

Di sala 1988 an de dîsan jineke Kurd Eysê Gulakî, endama Partiya Komunîst li Îraqê tête darvekirin, gelê Kurd ji wê re peykerek li bajarê Koyê çê kiriye.

Herweha jî rêxistineke din ya jinên Kurdistanê bi navê ( Yekitiya Jinên Kurdistanê ) di sala 1989 an de bi alîkariya (Yekitiya Niştimanî Kurdistan) hatiye damezrandin.

Eger bi awakî rêjeyî be jî, bizava jinên Kurdistanê bi rexberî tevgera xwe ya siyasî re, xwe pêşda dide û li gor gengaziyên heyî hewaldanên xwe ji bo azadiya xwe û li pênavî serbestiya gelê Kurd li dervayî welêt jî dike, lewra em dibînin hin komele û yekitiyên jinên Kurdistanê li Siwêdê, Sovyetistana berê, Almaniya, Holenda bi alîkariya partî û saziyên Kurdistanê yekser û nerasterast hatine avakirin. Emê li vir mîna nimûneyên pelandî hin saziyên jinan bi navbikin; di sala 1980 î de (Komela jinên Kurdistanê) bi serdariya siyasetmedar Novîn Hersan ji Kurdistana Rojava li Siwêdê tête damezrandin, Novîn Hesên mîna siyasetmedsreke Kurd di civaka Siwêdê de jî çalakvan e, ewa di hin komgirên navnetewî de beşdar bûye, û wê di wir de berevaniya kêşa jinên Kurd û doza

gelê xwe kiriye. Di vê salê de jî hin xwendekarên Kurdistanê li Lênîngrada berê (Sovyetistana berê) Fatme Resul, Leman Îbrahîm, Şehnaz Yosif û Hêvîn Qulî bi alîkariyeke rasterast ji aliyê nivîsevanê vê berhemê û xwendekar Ebdil Hemîd Sulêman de (Komîta Damezrandina Yekitiya Jinên Kurdistanê li Yekitiya Sovyetê) avakirin. Evê Yekitiyê hin çalakî û civînên kêrhatî bi jinên biyanî re amedekirin, dengê vê (Yekitiyê) bi riya nameyeke pîrozbahê gihabû kongira (Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê li Dervayî Welêt (AKSA)-Berlîn). Weke diyar bû ku vê saziyê ji ber tunebûna alîkariyên berçav ji aliyên tevgera Kurdî û dewleta Sovyetistanê de nikanîbû pirtirî salekê xebata xwe berdewam bikira.

Di sala 1985 an de (Komela Jinên Dêmkokratên Kurdistanê) bi seroketiya Benî Hesên (Suad) keça helbestvanê gewre Cegerxwîn li Siwêdê tete avakirin, evê komelê bi jîrbûnê karên xwe bi rêve dibir, li ser rewşa jinên Kurd pirtûkek weşandibû û herweha jî ewê hin şanoyên giring derbarê kêşa jinên Kurdistanê de bi zindî pêşkeşî temeşevanên Kurd kiribû, Şanogeran di wan şanoyan de, ( Ez nizanim, mêrê min zane), (Sê Quriş têra pênc koftan nakin ), (Ne wextê mîzê ye) bi zelalî setemkariya mêrê Kurd û zordestiya destlatdarên Kurdistanê li dijî jina Kurd jî xûyan kiribûn.

Em dikanin bêjin: Vê komelê di maweyekê de roleke giring di pêşketina asoyaên tevgera jinên Kurd de lîstiyê.

Weke hatiye diyarkirin ku jinên Kurd li Siwêdê têgihîştin ku pîrbûn û perçebûna tevgera jinên Kurdistanê li dervayî welêt ziyaneke mezin dighîne tevgera wê, û

rudawa dabeşbûnê aloziyên ne xweserî li pêş têkoşînên jinan peyda dikin. Lewra jî ewanan herdu komelên jinan li Siwêdê dikin yek sazî û (Yekitiya Jinên Kurdistanê li Siwêdê) dadimezrînin; endamên vê (Yekitiyê) dibin 500 keç û jin û dîsan Bunye Hesên dibe seroka vê (Yekitiya Jinên Kurdistanê). Li gor agahdariyên me jiyana vê (Yekitiyê) ta sala 2005 an hîn berdewambû.

Di sala 1987 an de bi piştvaniya PKK (Yekitiya jinên Kurdistanê) li Almaniya tête avakirin, vê (Yekitiyê) ji sala 1992 -1995 an (8 )hejmar kovar bi navê (Jina Serbilind)weandine, zimanê kovarê bi

piranî bi Turkî bûye, lê pêwîst e em bêjin: ev (Yekitiya) navê xwe di sala 1994 an de dike "Tevgera Aadiya Jinên Kurdistanê)..

Mîna diyar dibe ku vê rêxistina jinan giringiyek mezin dida perwerdeyên siyasî û leşgerî li nik jinên Kurd, lewra jî em bawer dikin ku vê rêxistinê kadirên siyasî û leşgerî ji şerê çekdarî re li dijî koledarên Kurdistana Turkiyê amedekirine, bi vî rengî em kanin biçespîn ku vê rêxistinê erkên xwe yên dijwar û rewa pêkanîne.

Dîsan di sala 1989 an de (Yekitiya Jinên Kurdistanê – Komjin- li Almaniya hate damezrandin, û wê kovarek bi navê (Jin) derdixist.

Eger em dîsan vegehin Kurdistana Sûriyê, em dibînin ku di van salên dawî de jina Kurd hinekî ji berê çalaktir dibe, li gor nirîna me, tevî ku tevgera azadîxwaza Kurd ne di radeyeke pesnedariyê de dijî, lê dîsan ewa dikane hin jinên Kurd ber bi qada têkoşîna siyasî ya aştiyane bikşînin. Bi boneya çejina zarokên cîhanî, nîzîkî 200 jinên Kurd di

26.06.2003 an, bi rêbertiya çar partiyên Kurdî 1-(Partiya Yekitî ya Dêmoqrata Kurd li Sûriyê), 2-(Partiya Yekitî ya Kurd li Sûriyê ) 3-(Partiya Çepa Kurd li Sûriyê ), 4-(Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyê ) di xwepêşandanê de li Şamê beşdarbûn. Dîsan jinên Kurd di 12.03.2004 an, di raperîna Qamuşliyê de û paşê li Efrînê, Helebê pir bi jîrbûn amedebûn, dengên xwe li dijî karbidestên Sûriyê bilind kirin, herweha jî cara yekem e ku hin jinên Kurd li pênavê doza Kurd li Kurdistana Rojava şehîd û birîndar dibin. Bi bîranîna roja navnetewî ya mafê mirovan di 10.12.2004 an de jinên Kurd di xwepêşandanê de ji bo mafên gelê Kurd li Şamê bi mêran re hevpar bûn .

Em van hemû çalakîyên jinên Kurd mîna firkeke civakî, siyasî bi hin gavên erênî dinexînin, hêdî hêdî jina Kurd dixwaze xwe azad bike û ji bo pêşxistina tevgera gelê xwe, xwe berpirsiyar bibîne, û ev dibin nîşana destpêkirina şiyarbûnê li nik jinên Kurdistana Rojava.

Wek tete zanîn bizava jinên Kurdisatana Îraqê bi alîkarî û piştvanîya hukumeta herêma Kurdistanê hîn bi leztir pêşda diçe, rewşa siyasî li wir di van salên dawî de pir baş e, bi kêmasî jina Kurd ji sala 1992 an de ji rêcîma dîktetur rizgar bûye, ewa niha li Kurdistanê, ne tenê di karên siyasî û rewşenbîrî de beşdar e, lê hîn jina Kurd bi jîrbûn, bi wireyên bilind pîşeya leşgeriyê jî dixwîne û di pişt re dibe efsera welatê xwe. Bi vî rengî em kanin bêjin: Firkeke dîrokî payebilind di bizava jinên Kurdistanê de hatiy e terxandin. Ji 9 Nîsana 2003 an de, Îraq (Beşê Erebbî) jî ji destladara xûnmêj serbest dibe, û yekemîn car e ku jina Kurd Nesrîn Berwarî di hukumeta katî de dibe şalyara avahiyê li Îraqê. Lê eva netê vê wateyê ku jinên Kurdistanê, xwe ji hemû diyardeyên din, nexweşiyên

civakî, aborî yê neyênî azad kirine, Jina Kurd hîn li her çar beşên Kurdistanê di heyamek şûnketî û bin zor û setema mêran de dîjin, ji sala 1992 an de ta sala 2005 an, 5 000 hezar keç û jinên Kurd li Kurdistana Îraqê bi sedema namusê ji aliyên bav, mêr û biran de hatine kuştin, şewirmenda serokşalyarê Kurdistanê Nêçîrvan Berzanî, ji bo mafên jinan, Mehabad Qeredaxî di 30.03.2006 an de li Kölnê (Almaniya) di Sêminarekê de bi xwe gotibû: Rewşa jina Kurd li Başur ne baş e, lê ewanan bo mafê jinan her di nav hewaldanan da ne ..., ji ber vê em dibînin ku di 2-3.04.2006 an de li Sulêmaniyê Konfiransê li dijî zordestiyê li ser jinan di bin navê (Têkoşîna li dijî zordestiya li hemberî jinan li Rojhilata Navîn) de û bi amedebûna nûnerên Libnanê, Îraqê û Filestîne hate girêdan. Eva konfiransa ji aliyê rêxistina mafê jinan ya Narwêcê (NPAN) hate birêvebirin. Di wir de, ne tenê ser rewşa jina Kurd hatibû axivtin, lê li ser jiyana jinên hin welatên Rojhilata Navîn jî hatibû şirovekirin, weke hatiye ragihandin ku armanca vê konfiransê ew bû jî, ta ku rêxistinên li dijî zordestiyê ser jinan dixebitin, kanibin agahî, pêzanînan bidin hev, sudan ji zanînen hevdu wergirin û planên kêrhatî ji bo pêşerojê amede bikin. Li gor texmîna me, ne bê sedem ev konfiransa navnetwî li Kurdistanê bû, diyar e, rêxistinên mafên jinan li ser rewşa jinên Kurd jî baş agahdar bûne, û pêşda jî metirsiyên mezin pelandine, û di rastiyê de weke nimûne: Wezaretê tendurustiyê li Kurdistanê ragihand ku di 14 mehan de 831 jinan li Başurê Kurdistanê xwe şewitandine, ji van jinan 35 jin bi destên mêrên xwe hatine kuştin, lê (Navenda Parastina Jinan li Îraqê) nivisiye: Di 12 salên dawiyê de 2604 jinan li Başurê

Kurdistanê xwe kuştine, ji wanan 2095 an xwe şewitandine, temenên wan jî, ji 12-25 salî bûne.

Tevgera jinên Kurdistanê di pêkanîna destura Îraqê û hîlbijartina endamên perlemana Kurdistana Îraqê de bi çalakî beşdar bûye, lê mixabin gava ku (Encumena Şalyarên Kurdistanê) tête ragihandin, ji 43 şalyaran, tenê sê şalyar jin têtin vebjartin, lewra ji bo vê ne wekhevîyê û ji bo pir pîrsgirêkên din yên ku bi jinên Kurdistanê ve girêdayî, rêxistinên jinên Kurdistanê konfiransan di bin vê parolê de ( Hefteya Helwestê)li bajarên mezin, Hewlêr, Dohok, Sulêmaniyê li dardixînin. Naciye Ehmed berpirsiyara çalakiyên (Hefteya Helwestê) gotbû: Me nameyke arastî hemû mektebên siyasî yên partiyên Kurdistanê kiribûn, herdu mektebên siyasî yên (Partî) û (Yekîtî) li civîna Hewlêrê amedebûn, lê li Sulêmaniyê tenê endamek ji mekteba siyasî ya ( Yekîtî ) û endamek ji Partiya Kumunîst beşdar bûn. Bê guman mebestên rêxistinên jinên Kurdistanê ji van civîn û koreyan ev bûn ku ewanan derd, nexweşiyên xwe, yên mêran û kêmkasiyên partiyên Kurdistanê bi awakî vekirî û li hember wan guftegu bikin û pêşniyarên xwe ji wan re pêşkê bikin. Li gor em bawer dikin, radeya asoyên siyasî, rewşenbîrî li nik gelek jinên Kurdistana Îraqê bi şêweke rêjeyî bilind bûye, ji ber vê jî tevgera jinan bi wêrekî li rex û li pêş hukumeta Kurdistanê dikane rexnên xwe ji nûnerên hukemetê û perlemana Kurdistanê re bêje û mafên xwe yên rewa ji wanan bixweze, lê aliyê din jî, divê em vê rastiye jî li vir biçespînin, eger herdu partiyên sereke P.D.K û Y.N.K û perlemana Kurdî rêz li dêmokratîyê ne girtana, dê nûnerên jinên Kurdistanê nikanîbûna bi serbestî rexnên xwe arastî hukumeta xwe

bikirina. Eva rastiya li nik me di warê zanistî û siyasî de nîşana destpêkirina azadiya jina Kurd e. Lê eger em çiqas bi erênî li ser tevgera jinên Kurdistanê û hukumeta Kurdistanê bipeyvin, eva ne netê vê wateyê ku jiyana jinên Kurdistanê niha di tendurustiyeke baş da ye, yan ewanan ji nexweşiyên civakî û destlata mêran rizgar bûne, na! Zordestî û setemkariya li ser jinên Kurdistanê ji aliyên mêr, bav û birayên xwe hîn berdewame. Dîsan em mîna nimûne, dikanin vê agahiyê bidin zanîn;di hejmartineke (Navenda Xatûjin)hatiye nivisîn: Ji 1. 01 2006 an ta 01 07 2006 an de 166 jin li Hewlêrê bi birînên şewatê çûne nexweşxanê û li gor (Navenda (Xatû jin) şewtandina jinan di sala 2006 an de pirtir bûne.

lewra jî tevgera jinan bi jîrbûn xebatên xwe dike. Di bin siya hukumeta Kurdistanê, di rojên 9.04-10.04 2005 an de li paytexta Siwêdê (Stokholmê) kongireke jinên Kurd ya navnetewî di bin vê parolê de (jin li Başurê Kurdistanê û Avahiya Civaka Bajarvanî)li darket, Mehabad Qeredaxî, Şene Hîdayetî, Munîre Muftî Zade di amedebûn û girêdana vê komgirê de roleke pir gewre lîstine.Di vê komgirê de Teha Berwarî peyva serokê (Encumena Şalyaran), Nêçîrvan Berzanî xwend û ewî got: Berê barên jina Kurd pirtir giran bûn.., lê niha biryara siyasî di destên hêzên Kurdî û Kurdistanî de ne..., û herweha serokê hukumeta Kurdistanê di peyvên xwe de çespanî û got: Divê yasayên nû li gor civakên bajarvanî werin deranîn, divê jin di hemwelatiya xwe û di dadweriyê de mîna mîran bi maf be ..). Herweha jî pir lêkolînên cuda li ser pîrsa jina Kurd di warên civakî, perwerdeyî û siyasî de ji aliyên hin pispor û lêkolîneran de hatin xwendin.

Eger em li vir dîsan hinekî vegerin Kurdistana Bakur û bi lez li ser aliyeke din pir neyinî û metirsî rawestin; emê bibînî ku bûyerên xemgînî di nav refên jinan de li Kurdistana Bakur jî pir çê bûne; (namusşikandin, kuştin, xwekuştina keç û jinan). li gor çapemeniyên Kurdî-êliktronî dinivîsînî: li Amedê peyakî Kurd ji ber sedema namusê jina xwe kuşt, (Tevger Jinên Azad û yên Dêmkokrat) kuştina vê jinê di daxûyaniya xwe de bi tundî şermeze kir û dewleta Turkiyê ji rexne kir, ji ber ku ewa yasayên dadmendiye li dijî tawanbaran pêknîne. Herweha di vê çarçewê de, bajarê Batmanê bi kuştina jinan û xwekuştina jinan nasdar bûye; lewra jî (Însiyatîvên jinên Azad) Gelek xwepêşandanên şermezariyê di bin van sloganan de (Wekheviya Jin û Mêran).( Dawî li xwekujiyan bibe!), (Xwekujî ne çareserî ye) li Batmanê çêkirine.

Li gorî agahiyên (Roj TV) di roja 25.03.2007 an de ; di 5 salên dawiyê de li Kurdistana Bakur 5000 jin bi sedema namusê hatine kuştin û 5000 jin xwe kuştine

Di rastiye de li Kurdistana Rojava jî, jina Kurd bi gelemperî mîna jinên beşên din bindest e, lê ev rudawa kuştina jinan yan xwekuştina jinan li wir di hundir pir salan de belkî bi qaserî 10-20 kesan tune bin.

Lê rewşa jina Kurd di warê rewşenbîrî, wêjeyî û zanistî de li her beşekî Kurdistanê bi rengê bi rêve diçe, bê guman e ji ber sedemên siyasî, heyamên lêhatî û azadiya Kurdistanê, rewşa jina Kurd li Kurdistana Îraqê di warê rewşenbîrî de jî ji beşên din pêşdatir e, bi sedan nivîskar, zimanzan, dîrokzan di nav jinên Kurd de bi

saya hukumeta herêma Kurdistanê peydabûne û di pêşketina şaristaniya Kurdistanê de hevpar in.

Lê di hersê beşên din yên ne rizgarkirî de, jina Kurd dubare bîndest e, divê ewanan li zanîgehên mîletên serdest û bi zimanên wan mîletan bixwînin, lewra jî em dibînin ne tenê jina Kurd, lê mêrê Kurd jî li van beşên bîndest nikanin wek têtê xwestin çand, wêje û zimanê Kurdî pêşda bibin. Lê di baweriya me de, tevî rewşa xerap ya awerte li her sê beşên din, dîsan rêxistinên Kurdî, çapemeniya Kurdî û kenalên "KTV", "ROJ TV", "KURDSAT" û niha "KOMELE" rolên mezî di pêşketina hemû aliyên jiyana Kurd li her çar beşên Kurdistanê de dilîzin.

Rêyên çareserkirina nexweşiyên bizava jinên Kurdistanê bi gelek faktorên têkeldar ve girêdayî ne1-Bilindkirina radeya rewşenbîriyê di nav mêr û jinên Kurd de .2- Divê mêrê Kurd xwe ji ayênên kevneşopî, şunketî û destlât-dariya bê rewşa rizgar bike.3- Pêwîst e jina Kurd kanibe li dervayê malê kar bike û ji warê aborî, ango darayî ji mêrê xwe, yan bavê xwe yan birayê xwe, xwe rizgar bike û pêkanîna vê xalê di azadiya jinê de merceke serkîn e.4 –Divê jina Kurd bi jîrekî di bizava siyasî de beşdar be. 5-Divê mêrê Kurd jî ji jina Kurd bixweze ku ewa mîna mêrê Kurd xwe di ber pêşdabirina jinê de berpirsiyar bibîne. 6-Pêwîst e jina Kurd bi riyên avakirina dezge û rêxistinên jinên Kurdistanê li mafên xwe yê rewa xudîderkevin.7-Divê jina Kurd wateya serbestiya jinan bi awakî rast û sincî bi kar hûne û divê ewa rêzê li kultura pêşketî û şarastanî bigrin. 8-Divê li Kurdistana Îraqê di destlât-dariyê de (Perleman, wezaret, û partiyan ) de pir beşdar bin. Eger jina Kurdistanê bi xwe di

biryarwergirtinan de, ango di deranîna yasayên dadweriyê de beşdar be, bê guman jina Kurd nahêle ku biryarên ne mirovane li dijî wê derkevin .9 -Divê jina Kurd li sê beşên din jî pir bi çalakî di partî û rêxistinên Kurdî de beşdar bin û li gel mêran biryarên siyasî û civakî û h.w. bistînin .10 - Divê rêxistinên jinên Kurdistanê li Welêt û li dervayê welêt pêwendiyên xwe bi rêxistina navnetewî ya jinan re xurt bikin.11- Pêşketina bizava azadîxwaza jina Kurd yanê azadiya gelê Kurd û Kurdistanê ye.

Eger mêrê Kurd li gel jina Kurd, û eger jina Kurd li gel mêrê Kurd bi hev re wan pêdivî û mercên jorîn pêkbînin, dê kanibin bi sanahî piraniyên alozan li ser riya doza azadiyê û şarastaniya Kurdistanê bidin aliyekê .

Di rastiye de; eger em çiqasî li ser êş û derdên jinên Kurdistanê û bindestiya wan bipeyvin, em nikarin di kurtelêkolîneke weha de, wêneyeke dewlemend ji rewşa jinên Kurdistanê li vir, li ber çavan deynin. Pirsra jina Kurd kêşeyeke gelek dijwar e, lewra divê zanayên Kurdistanê, pisporên sosyolocî û derûnî jî gelek berhemên xwe yên zanistî ji bo doza jina Kurd biterxînin.

.....

-Çavkaniyên kêrhatî û sudar

1-Rohar Alakom(Li Kurdistanê hêzeke nûh,jinên Kurd) lêkolîneke dîrokî ye, çapa yekemîn , Stockholm, sala 1995.

2-Leman Îbrahîm, (Cihê jinên Kurdistanê di Weşanên Kurdî yên Pêryodîk de), nama Macêstêr li zanîngeha Lênîngradê, bi zimanê Rusî , sala 1984.

3-Rojnama (Jina Kurd) ji weşanên ( Partiya Yektiya Dêmoqrata Kurd li Sûriyê, hej.(16.17, 19, 21, 22), sal 2000, 2001 bi zimanê Erebî.

4-Erebê Şemo, romana (Dimdim) bi zimanê Kurdî, Stockholm, sala 1983.

5- Hin gotarên din mîna (Rêveçûna jina Kurd di dîrokê de), (Narîn Metnî), ( Jina Kurd di navbera seyrana têkoşînê û reşbîniya dadmendiyê de), Rewşen Qasim, ( Mafên jinan yên mirovî û wekhevîyê) , Suad Cegerxwîn, (Jin û sêstêma cîhanî ya nûh), Dr.Mihdî Kakayî ), ( Mafên jinan û azadiya wê), Lava Xalid, (Keça ciwan û asoyên pêşerojê), (Pirbûna jinan li nik mêrekê li dijî mirovperweriyê ye) Narîn Omer, ( Jin.. dîsan jin .. û li dawiyê dîsan jin) Saman Emîn, ji malperên Kurdî bi zimanê Erebî.

6-Gelek nûçe ji malpera "Netkurd"derbarê kuştin û xwekuştina jina Kurd li Kurdistana Turkiyê û Îraqê bi zimanê Kurdî.

Avdar, 2007 Almaniya .Malpera Pena Kurd û welatî .net

## **Kek Edîb!**

### **Silavên min ji hemû pakrewanan re hene!**

Cerkî ku fireşteyên pîroz giyanê hevalê min Edîb (Bavê Pêşrew) bi fistaneke sê rengî li baskên xwe sîwar kiribûn, li ber roniya çavên Pêşrew, û Zerdeşt ji balefirgeha dilê xûşka me Leyle firyan û li nik nemirên mîna Osman Sebrî, Dr.Nore Dîn Zaza, Ebdilhemîd Zîbarî û Ebdilrehman Osman peya kirin, hestên min mîna pêlên çemê Efrînê, mîna babelîskên sirtên "Gundê Mezin, mîna bêzariyên kolanên gundê "Maratê" li ser hev û li bin hev sîwar dibin, mîna karwaneke bê guneh, wek balindên çeşeng bi ezmên de difirin û dixwazin bi 55 çepkegulên nêrgizê li ber gorna nemir, birayê min Edîb pêşwaziya heval û hogiran bikin.Hestên min dixwazin bi hestên Îbrahîm, Ehmed, Cemîl, Leman, Welîd û Adil re, bi hestên darên henarê û darên gozê re, bi hestên kaniya Maratê re siruda "Ey Reqîb" li ber awaza çûkên hêrên zeytonê bixwînin.

Erê kolanên Efrînê!Erê rêk û çatên gundên Çiyaê Kurmênc" ! Erê Kelha Horî! Erê girê Endarê!Erê seyrangehên niştimana kek Edîb!Ez bi kelegirî û kovanên we re bi şevan û rojan dijîm, çavên stêrka ezmana dilê min jî bi firmêskên xwe xwenên min yên zarokane şil dikin, erê dilberên min ! Çiqas min dixwast bi laşê xwe ve jî, bi we re di govenda şênîyê de, li gel hevalên xwe yên resen beşdar bûma, mistek ji axa pîroz û birîndar li ser gorna hevalê xwe belav bikira, me nazên hev bi zimanên geşbînî serast bikirina û bi hev re bi dengên

bilind di rûyên dost û neyaran de bigota: Hawar! , hawar!, birayê me Edîb nemir e û nemir e.....

Bajarê min! Efrînê !Ez zanim çiqas tuyê îro malul û xemgîn bî, ez zanim îro tuyê ji dengên nalîn, giriyên keç û lawên xwe nikanibî bi hêminî xewkî, ez zanim îro çiqas şagirtên nemirê me, dê reşiyê girêdin, ji hev re li ser rindî, sinca mamostê xwe û parêzerê te bi ser bilindî bipeyvin....Erê Efrîna min, lê tu ji min baştir lawê xwe Edîb nas dikî, tu pir rind zanî ku çiqas ewî rûmeta te bi aramî û mêrane parastiye...., çiqas ewî berxwe dida ku birînên hêva te bi tîrêjên çavên xwe derman bike ..., çiqas ewî li ber êş û janên te ahengên têkoşînê girêdane, çiqas ewî li ber ronîya te destana "Mem û Zînê"ji kevir û latên te re, ji xanî û avahiyên te re xwendîye, Erê dayê, erê Efrînê! Bese tu medîgrî !De kanî em bi hev re dîsan bikenin..., em dîsan bi hev re zemawendên evîndaran çê kin, gul û nesrînan di gulistanên dilên şikestî de biçînin..De kanî em bi findên xwe yên bê guneh stêrên çavên hev paqij bikin û dîsan bi dengê bilind ji hev re bêjin: Edîb nemir e... Edîb pakrewan e ...Edîb niha bi Osman Sebrî , Dr.Nore dîn Zaza û Ebilrehman Osman re di buheşta dilên rûmetdaran de dijî... Edîb zindî ye û her zindî ye

...24.08.2007...Almaniya .Welatî.net

## Leyla Zana !

### Xaziya tu xûška min ji dê û bavê bûya...

Beriya çend rojan min axivtina te, ya ku te di kongira (Civaka Dêmkokrat) de li Amedê gotibû, di malpera (Azadiya Welat de) xwend, te pir hevokên watedar û giring anîbûn zimên;mîna (Kurd ne têrorîst in), (Tu Kurdên bi şeref şerê birayê xwe nake)., (Hêzên cîhanê ta niha ji bilî komplo, fend û fêlan li dijî gelê Kurd nakin...), (Me welatê tu kesî dagîr nekiriye). (Divê Turkiyê li Emêrika, Sûriyê, û Îranê negere, çareserî li Turkiyê ye), "lê hevoka ku gelek bala min ber xwe de kişand, û ez ji ber shabûnê bi girî kirim ev bû;( KURDA HERÎ TIRSONEK EZ IM, EZ JÎ JI MIRINÊ NATIRSIM).

Erê xanim Leyla Zana! Ez li ser hemû nirînên te yê jorîn ranawestim, ji ber ku her hevokê ji wanan li nik min dibe navnîşana mijareke taybetî, derbirîn û nirînên te yê siyasî cihên pesnê ne, te siyaseta cîhanê û Rojhilata Navîn pir bi kurtî li pêş guhdarên xwe rêxistin.lê dîsan ezê vegerim ser hevoka te (KURDA HERÎ TIRSONEK EZ IM, EZ JÎ JI MIRINÊ NATIRSIM). ev gotina te tijî felsefe ye, ewa bi naveroka xwe gelek watedar e, bi pir alî ye, te nameyeke zor giranbuha arastî du aliyan kiriye, yekem, ji dijminên Kurdistanê re û tu dixwazî di wê de ji wan re bêjî: Vaye, zîndana we LEYLA ZANE netirsandîye, gefgurên we yê rojane li dijî welatpêz û dêmokratîxwazan, vînaLEYLA ZANE natewandîye û nikane wê bitewîne û hevgerêdana wê bi gelê xwe re sist nake. Herweha jî tu hîn ji wan re weha dibêjî: Eger LEYLA ZANA ji wer e dibêje: Ya herî tirsonek ez im, lê

dîsan ewa ji bo welatê xwe ji mirinê jî natirse, ango LEYLE ZANE ji dagîrkerên Kurdistanê re yekser jî û ne yekser jî dibêje: Yanê şer û çekên we kêşa Kurdî li Kurdistanê çareser nakin, dermanê pirsgirêka me tenê aştî ye, dîyalogên dêmokrat û dadmend in. Ya duhem te nama xwe ji Kurdistaniyan re, mêr û jinan re, ji keç û lawan re şandîye; tu bi me hemûyan re dibêjî: Vaye LEYLE ZANE ewqas sal di zîndana Toraniyan de raketîbû, ewqas destlata Turkan bê rûmetî li wê kiribûn, lê dîsan ewa niha dengê xwe ji bo azadiya gelê xwe bê tirs bilind dike, yanê ewa rasterast ji gelê xwe re dibêje: Hûn dibînin, çawa " Şêr, şêr e, çi jin e çi mêr e".Yanê dîsan TU! LEYLE ZANE ! Bi vê hevoka xwe ya zêrînê, bê tirs û li ber guhên wan, qehremantî û pêdarîyê di hestên Kurdperweran de diçînê û wireyên têkoşînê li nik wan bilind dikê..Vêca çawa tu Kurda herî tirsonekî ??? Ez zanim tu dixwazî ji dijminên Kurdan re weha bêjî ku (Kurdên tirsonek tunen in) , Kurd jî dixwazin li ser axa xwe mîna milletên din bi azadî bijîn û ewanan ji bo rûmeta welatê xwe ji mirinê re jî amede ne...).Lê erê Xanima têkoşer! Tu ne Kurda herî tirsonek î, tu şêra meyî, tu zimanê hîm û latên Kurdistanê yî, tu sîwana netewperestan î, tu lehenga zîndanên î . Eger ez çiças di derbarê te de bêjim, dê hemû peyv û pesnên min li hember tûpek ji tûpên hevoka te ya jorîn û ya ez gelek bi girî kirim " EZ KURDA HERÎ TIRSONEK IM Û EZ JÎ JI MIRINÊ NATIRSIM " ji ber xwe ve şerm bikin û dê serên xwe bi rêzdarî li ber wan tûpên zêrîn re bitewînin. Li dawiyê dîsan ez dubare dikim, XAZIYA TU XÛŞKA MIN JI DÊ Û BAVÊ BA..."

..... 2007, Almaniya .Welatî .net

**Na ! Na ! Mamoste Berzo Mehmud.**

**Çanda Kurdî bi zaravê Kurmancî jî heye .**

19.06.2007

Rêzdar Berzo Mehmud nivîskar û zimanzanekî ji Kurdistana Rojava ye, ewî di pir kovarên Kurdî bi zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî gotar û lêkolînên zimanewaniyê nivîsîne, mamoste Berzo gelek salan di desteyên kovarên bi zimanê Kurdî de mîna(Gelewêjê) û ( Pirsê)bi jêrbûn kar kiriye, ji bo min cihê rûmetê ye ku min jî li gel wî û hin hevalên din, nivîskarên rêzdar mîna Heyder Omer, Rizo Osê, û Merwan Osman di desteya kovara (Pirsê ) de kar kirîye .

Mamoste Berzo danerê pirtûkeke zimanewani (Rênivîsa peyva Kurdî) li ser zimanê Kurdî (zaravê Kurmancî) ye.

Berêz Husên Ehmed hevpeyvînek bi zimanê Erebî li ser zimanê Kurdî bi mamoste Berzo re di malpera (Welatê me) de weşandîye. Mamoste Husên pirsên balkêş, mîna van pirsên jêrîn ji mamosteyê zimanzan kirine;1-Ji bo çi ew bi zimanê Kurdî dinivîse ?2-Eyan lêkolîner Berzo dikane hest û nirînên xwe bi zimanê Kurdî derbibire ?3- ji bo çi hemû Kurd bi tîpên latînî nanivîsînin ?4-Çawa berêz Berzo li helwestên partiyên Kurdî di sebarek zimanê Kurdî de temaşe dike?

Li gor nirîna min, mamoste Berzo bi awakî giştî bersivên têrkirî û sudar dane, wek nimûne: Ew jî di vê baweriyê de ku zimanê Kurdî pêwîst e bi tîpên Latînî bête

nivîsîn, lê eger ewa niha dijwar be jî, lê divê zaravên Kurdî bi kêmasî niha di warê ferhengî de bibe yek û her weha ewî bersivên din jî bi zanstî pelandine, lê nirîna ku gelek bala min kişandîye ev e; lêkolîner dibêje: (DI RASTIYÊ DE EZ ÇANDA BI ZIMANÊ KURDÎ (ZARAVA KURMANCÎ) NABÎNIM).

Di rastiyê de, min jî nedixwast bawer bikira ku hevpişeyê me yê berêz, weha pir hişk li zaravê Kurmancî û berhemên Kurmancî temaşe dike..lê di hevoka wî de pir zelal e, ew çanda Kurdî bi Kurmancî nabîne, ango ewa-tuneye-!

Di vê derbarê de dixwazim ji berêz Berzo re bêjim: Te xwe zor şaş kiriye, ji ber

ku ÇANDA KURDÎ BI ZARAVA KURMANCÎ HEYE lê ewa niha ne di asta pêşketina zaravê Soranî de ye, bi ya min be, ev nirîna pirtir cihê xwe di warê zanistiyê de digre.

Ez gelek bawer im ku nivîskarê me Berzo navên van mezinan rind zane û berhemên wan pir baş xwedine, ew gelek çak zane ku evanan di çand û wêja Kurdî de gelek gernas û payebilind in; tenê ezê li vir navên çendekan hûnim bîra dostê xwe yê hêca, ewên ku raperînen wêjeyî di berhemên xwe de çê kirine ; Mele Ehmedê Cezîrî, Feqiyê Teyran, Eliyê Herîrî û paşê Mîrê helbesta Kurdî, pêşengê ramana netewî Ehmedê Xanî yê ku îro navê wî di nav wêjeya kevneşpoî ya cîhanî de hatiye naskirin.

Herweha Mile Mehmud Bayezîdî bi berhemên xwe di nav rojhilatnasan de jî dîsan pir navdar e

Nivîskar Erebê Şemo damezrênerê ramana Kurdî bi berhemên xwe ( Kela Dimdim).û Şivanê Kurd li seranserî Kurdistanê nasraw e û bi dehan pisporên wêje û zimanê Kurdî li Sovyetistana berê mîna Prof.Dr.Qenatê Kurdo, Prof.Dr. Hacıyê Cindî, prof. Dr.Ordîxanê Celîl, Prof.Dr. Zerê Yosif, prof..Dr Celilê Celîl, wêjevan Elî Ebilrehman, lêkolîner û helbestvan Çerkesê Reş, helbestvan, ramannivîs û lêkolîner Tosinê Reşît. û bi dehan û dehan berhemên xwe (Raman, helbest , çîrok, lêkolînên zimanewanî, rexneyî)bi KURMANCÎ nivîsîne

Eger li nik mamostê rêzdar rojnamegeriyaKurdî beşek ji çanda Kurdî be, divê ez eshe Şahsîwarê rojnamegeriya Kurdî Miqdat Medehet Bedirxan û yekemîn rojnama ( Kurdistan)- ( 1898 )bi bîra wî hûnim.

Ma ne tişteki matmayî ye ku lêkolîner û zimanzanê me naxwaze mamosteyên xwe û yên me hemûyan di warê rêzimana Kurmancî de mîna Celadet Bedirxan, Reşîte Kurd, Qenatê Kurdo û bi dehan yên nû jî bibîne ?

Ez naxwazim navên hemû kovar û rojnamên Kurdî bi zaravê Kurmancî li vir bi nav bikim, lê ez neçar im bi kêmasî dîsan navên van kovaran mîna (Hawarê), (Ronahî), (Gulistan), (Stêr), (Gelewêj), (Pirs), (Gurzek Gul), (Newroz), (Pênûs) û h.d.hûnim zimên .

Lê dîsan ez ténaghînim ku ji bo çî berêz Berzo nexwastiye berhemên seydayên me Cegerxwîn, Osman Sebrî, Hesen Şiyar, Ehmed Namî Tîrêj yên wêjeyî û dîrokî û zimanewanî bibîne?

Îro gelek nivîskar û rewşenbîrên navdar li Kurdistana Rojava peyda bûne, û ewanan bi berhemên xwe çanda

Kurdî bi zaravê Kurmancî dewlemend kirine, navên mîna bavê Nazê, Dr. Husên Hebeş, Heyder Omer, MuhemedOsman (Hemdo), Hêmin Kurdaxî, Nezîr Palo, Diya Ciwan, Helîm Yosif, Can Dost, Pîr Rustem, Şahîn Soreklî, Can Kurd, Mistefa Reşît, Dr.M.Ebdo Gundî, Awazê Kalo, Dîlawerê Zengî, Rûxwaş Zîvar, Bextreş, Rizo Osê, Berzo Mehmud, Elî Cefer, Şêx Alî, Deham Ebulfetah, Keça Kurd, Konê Reş, û yên mayîn di ezmana çanda Kurdî de bi kêmasî li Rojavayê Kurdistanê pir geş in, lê dîsan berêz Berzo nexwestiye wan jî bibîne, ji bo çî ez nizanim ??? Mebesta wî çî ye ? Ez dîsan nizanim. !!??..

Eger ez vegerim Kurdistanê Başur, bê guman li wir jî bi sedan lêkolîner, helbestvan, rojnamevan wêjevan bi zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî pirtûkên xwe pêşkeşî pirtûkxana Kurdî kirine, mîna ku ez zanim (Yekitiya Nivîskarên Kurdistanê) taya Dohukê nîzîkî sed pirtûkî bi zimanê Kurdî zaravê Kurmancî çap kirine, yanê ez dîsan tînaghînim ku çawa mamostê hêca nexwestiye navên mîna Sadiq Beha eldîn, Noredîn Brîfkanî, Ehmed Nalbend, Ebdirehman Mizurî, Muhsin Qoçan, Hesen Silêvanî, Selah Sedelela, Dr.Fadil Omer, Seîd Dêreşî, Dr. Mesud Kîtanî, Tehsîn Doskî, Mihemed Emîn Doskî, Xelîl Dohokî, Necîb balayî, Hêvîn Berwarî, Bayiz Omer, Dr. Kamîran Berwarî û bi sedan navdarên din û berhemên wan jî bibîne ?

Eger ez navên hemû nivîskar û lêkolînavên Kurdistanê Bakur jî li vir hûnim zimên, dê gotara me tenê bi navên nivîsevanên zimanê Kurdî, zaravê Kurmancî mişt bibe.

lewra jî ez hêvî dikim ku evan navên jorîn û hîn bi sedan, navên mayîn bala nivîskarê me Berzo ber xwe de bikşînin, ta ku ewanan ji aliyê tu kesan de, ne îro û sibe netên setemkarkirin.

Ez dixwazim di vê sebarete de ji berêz Berzo û ji xwendevanên rêzdar carek din xalek yan diyardeyeke zanistî di warê pêşketina şaristaniyê, çand û wêje de li nik gelan yan li cem mirovan biçespînim, Yanê eger em bêjin, wêja Êngilîzî ji wêja Almanî pêşdatir e, eva qet netê vê wateyê ku em wêja Almanî nebînin, yan eger em bêjin, wêja Almanî ji ya gelê Alban pêşdatir e, dîsan eva netê vê wateyê ku em çand û wêja gelê Alban ne bînin .

Dîsan eger ez niha bêjim çand û wêja gelê Rus pir ji ya gelê Daxistanê pêşdatir e, careke din ne ji mafê min e ku ez Resul Hemzatov ne bînim û .h. w. û nimûneya min ya herî dawiyê ev e, eger ez bêjim Kurdistan Mukriyanî zimanzaneke pêşketî ye, dîsan eva netê vê wateyê ku ez Berzo Mehmud, Selîmê Biçûk, Keça Kurd, Dr.Muhemed Ebdo, Mistefa Reşit, Dr.Zeredeşt Haco, Deham Ebdil Fetah ne bînim!!

Eger seyda Berzo dibîne ku çanda Kurdî bi zaravê Soranî li gor zaravên din li pêş e, ez zû kanim ji wî re serê xwe bihejînim, lê eger ew dibêje: Ez çanda Kurdî bi zaravê Kurmancî nabînim!!!, ez bawer dikim ku tu kes ji nivîsevanên me nikane vê nirîna hişk bipejîrîne, lê ez pir bawer dikim ku hin zimanzanên zaravê Soranî mîna Kurdistan Mukriyanî yan Ferhad Şakilî û hin rewşenbîrên mîna Muhsên Ciwanmêr, dê pir zû ji mamoste Berzo bawer bikin û nîrîna wî mîna çekekê li hember zaravê Kurmancî bi kar hûnin û ji me hemûyan re bêjin: De

werin Kurmancino ! Vaye zimanzanekî we bi xwe dibêje: Çanda me bi Kurmancî tu neye !! Vêca ji bo çî hûn dev ji tîpên Latînî bernadin? Hûn ji bo çî dev ji zaravê Kurmancî bernadin ... De bila hemû kurmancaxêv tenê bi zaravê Soranî bixwînin û binivîsînin . ...

Lê bi ya min be mamoste Berzo ta radeyeke bilind bi dadmendî rexna xwe di derbarê qelsiya partiyên Kurdî di warê zimanê Kurdî de arast dike, ew dibêje: Faktorên obyektîv rolên xwe di şûndamayîna zimanê Kurdî de dilîzin, lê faktora subyektîv ango Partiyên Kurdî ne hêzeke karîger e ku bikanibe zimanê netewa xwe pêşda bibe. Herweha jî ew rexna hin rewşenbîrên Kurd dike, ewên ku rêzê li zimanê dayîka xwe nakin û xwe bi zanîna zimanê Erebbî serbilind dibînin.

Ez li vir pir dixwazim piştvaniya nirîna Berêz Berzo bikim, û ez jî dengê xwe bi wî re bilind radikim û dibêjim: Belê; piraniya partiyên tevgera me li Kurdistana Rojava di warê zimanê Kurdî de qels in, ewanan xwe ji bo zimanê Kurdî nawestînin, ez li vir tenê hez dikim nimûneke zindî ji xwendevanan re binivîsînim. Di êvarekê de, di sala 1998-99 an de, sekretêrek ji sekretêrên partiyên me li Helebê sêminarek ji rewşenbîrên Kurd re lidarxist, piştî ku ewî axivtina xwe bi dawî anî, rewşenbîrekî nirîn û baweriyên xwe li ser kêş û aloziyên tevgera Kurdî derbirî, mîvanê me, sekretêrê rêzdar pir eşkere gote beşdarên: (Bi rastî min ji axivtinên vî mamosteyî tişteke fêhm nekir. Ji ber ku ewî gelek bi zimanekî Kurdî paqij peyvî, lê mixabin ez jî hîn ne di wê asteyê de me .... )

Eva kêmasiya ne tenê li nik ewî heye, gelek mixabin ewa li nik piraniyên serok, pêşeng û mêşengên tevgera

me heye, lewra jî em dibînin zaravê Kurmancî bi piranî bi pêûsên rewşenbîr û nivîskarên zaravê Kurmancî pêşda diçe.

Lê divê ez vê rastiya dîrokî jî berçav bikim; mîna ku ez zanim hin partî ji zû de û hin dezgehên nûh jî koreyên zimanê Kurdî vekirine û niha bi sedan li seranserê Kurdistana Rojava şagirt û mamosteyên nûh çê bûne, eva rastiya jî cihê pesnê ye, ez lava dikim hemû partiyên din jî di vî warî de çalak bin, pêşketina zimanê Kurdî erka hemû partî û rewşenbîran e, bi nirîna min têkoşîna netewî bê zanîna zimanê Kurdî, bê weşandina kovar û rojnamên Kurdî di pileyeke bilinde, ewa dibe têkoşîneke nexwaş û kulek ..

Di dema niha de li Kurdistana Bakur jî, rewşa zimanê Kurdî pêşda diçe, kongire û konfiransên zimanê Kurdî û wêja Kurdî li dardikevin, dîsan eva nîşana pêşketina zimanê me (zaravê Kurmancî) ye .

Ji ber van hemû rastiyan pêlandî, divê em çanda xwe bi zimanê xwe (Zaravê Kurmancî) bibînin û em zû, zû hemû samanên xwe yên wêjeyî, çandî, zimanewanî, rojnamegerî bi destên xwe wenda nekin.

Li dawiyê ez hêvîdar im ku min bi van du, sê rûpelan zengileke biçûk ji xwendevanan re lîxistibe, ta ku ewanan jî baweriyên min dewlemend bikin yan kêûkurtiyên min zelal bikin .

.....

Almaniya 25.06. 2007.Welatî.net

## **Nivîskar Ferhad Şakilî dîsan hêrişan dibe ser Bedirxaniyan**

**lê nivîskar, siyasetmedar û dîrokzanên me  
çi dibêjin ??????????????????????**

Nivîskarê nasdar ji Kurdistana azad Hesên Silêvanî kurtegotarek rexneyî bi navnîşana (Çima ev hêrişên hovane li ser Bedirxaniyan??) derbarê zimanê Kurdî de di malpera (Rojava.net) de, di vê mehê de weşandiye.

Rêzdar Hesên Silêvanî dinivîse: (Mixabin di kongira perwerdeyî de li Hewlêrê di rojên 22-24 gulanê 2007 an de hêrişek dijwar bi rengekî jehrawî û plankirî ser malbeta Bedirxaniyan ji nû ve hate kirin .. , û ew hîn dinivîse: Bi çi mafî wezareta perwerdeya Kurdistanê qebul kiriye, ku ew komek nivisînên bi cehrê reşandî li jêr navê zimanê standarda Kurdî û Alfabaya standarda Kurdî, komelek gotar li dijî Kurmanciyê û malbeta Bedirxaniyan werin xwendin?? Berêz Hesên Silêvanî ji xwendevanên xwe re hin peyvên rêzdar Ferhad Şakilî bi kurtebirî dibelgîne: (Li nav Kurd e, kes bi qaserî binemala Bedirxaniyan dilsozî bîrûbawer û îdyolokîyê Ataturk nebû..., ewan eger çi bi rewalet li dijî Turkiyê bûn, lê belam di rastiye de nakokiyên wan tenê li ser destlatê bû.

Celadet û Kamîran Bedirxan li hemî jiyane xwe de hewlî eweyan de da lasayî yî Ataturk bikene we û zorîş le dilewe sersamî kesayetî bîrkirdinewey Ataturk bûn....).

Di rastiye de, helbestvan û lêkolînerê wêjeya Kurdî ne cara yekem e ku hêrişên ne rewa dibe ser binemala Bedirxaniyan û bi taybetî li dijî mîr Celadet Bedirxan.

Ewî hîn di 27.10.2005 an de , di hevpeyvînekê, di malpera(Dimane.com )de gotiye: ( Ew Alfabaya ku Celadet Bedirxan çê kiriye û Kurmanc pê dinivîsîn, xebata Împiryalîstan e û ji bo perçekirina Kurdistanê ye, lewra jî ew Alfabaya jî seqet e, ne zanistî û ne Kurdî ye û bi kêrî zaravê Kurmancî jî nahêt .., herweha jî ewî gotibû: Tkukes bi qasî malbeta Bedirxaniyan dilzozê raman û îdyolociya Ataturk nebû, ew malbeta ji dil heyranê kesayetiya û hizrên wî bû...)

Dr.Haşim Ehmed Zade, zimanzaneke ji Kurdistana Rojhilat e, di bersiveke xwe de ji berêz Ferhad Şakilî re dinivîse(Bi baweriya wî (F.Şakilî ) Bedirxanî casosên Împiryalîstan bûn...."lê Dr. H.E.Zadebi bi vê wateyê jî, nirînên wî pûç dike û dibêje: (Ew(F.Şakilî)ji danûstandinên belgeyî, aqilane û objêktîva akadêmîk dûr e...).

Mebesta min ji vê gotarê ne ew e ku ez ji xwendevanên rêzdar re peyv û nirînên Ferhad Şakilî li ser Bedirxaniyan û tîpên lafînî çewt derxînim, çimkî di nirîna min de, eger ez, yan hevalekî dîtir niha berevaniya têkoşînên binemala Bedirxaniyan ji bo mafê netewa Kurd bike, yan jî xebatên wan yên ronakbîrî û zimanewanî, yan çapemenî dîsan di berçavan re derbaz bike, yanê em ji nirxa Mîr Bedirxan, Meqdad Medehet Bedirxan, Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, kêrî dikin, ji ber ku ta roja îro pisporên dîroka Kurdî, pisporên zimanê Kurdî, pisporên dîroka weşanên Kurdî û bê awerte herdem

nirxeke pir buha dane û hîn jî didin berhem û têkoşînên binemala Bedirxaniyan.

Vêca li vir, ne ez û ne jî bi sedan rewşenbîrên Kurdistanê hîn nikanin bawer bikin ku niha kesek mîna Ferhad Şakilî û hin layîngirên wî berxwe didin ku raperînên netewî û çanda Kurdî yê Bedirxaniyan bi nirînên xwe yê navçeperestî û yê pir tirsdar bişewitînin.

Lê pirsgirêka pir alozber ew e; ku hin pisporên zimanewanî û wêje bi navê konfiranseke fermî û di bin sîbera dezgeya perwerdeyî de li Hewlêrê, paytexta Kurdistana azad, dîroka Bedirxaniyan bi mebest reş bikin.

Ferhad Şakilî mebesta xwe pir zelal kirîye; ew li dijî Alfabaya latînî ye, ewî bê bingeş û şîrovekirinên zanistî li dijî tîpên latînî derdikeve, ne ewî û ne kesekî dîtir ta niha nikanîbû ji xwendevanên Kurdistanê re, yan ji zimanzanên Ewropî re mêlag bikirana ku tîpên latînî ji bo Kurdan, astengiyên zimên çê dikin !! lê li aliyê din pir zimanzanên Kurdî, (Zaravê Kurmancî) bi dehan û dehan lêkolînên zanistî terxandine zimanê Kurdî û pêşniyar kirine ku tîpên latînî ji bo zimanê Kurdî baştirîn û rastirîn tîp in. Lê tucarî nivîskarekî yan zimanzanekî zimanê Kurdî (Zaravê Kurmancî) ne gotiye ku danerê tîpên Erebi ji bo zimanê Kurdî Împiryalist in yan jî, ewanan nokerên regezperestên Ereban ne ..!!!! danûstandinên bi vî rengî, nîrxên alavên zanistiyê nizim dikin.

Dîsan pêwîst e ez vepirsîneke giring bavêjim gorepana hişmendiyê; ma gelo ji bo çî di vê mawa dawiyê de dijayetiya tîpên Latînî -Kurmancî, û zaravê Kurmancî pir dibe?

Ma gelo ji bo çi hin kesayetiyên siyasî û karmendên wezaretê perwerdeyî li Kurdistanê piştvanîya vê rêbaza çewt û ne zanistî dikin ?

Ma gelo kî ji siyasetmedar, nivîskar, dîrokan, zimanzan, wêjevan û rojnamevan li Kurdistanê yan li dervayî welêt nizane ku Mîr Bedirxan kî ye? Kî ji van nizane ku Mîr Meqdad Bedirxan kî ye ? Kî ji van nizane ku Mîr Celadet Bedirxan kî ye? Kî nizane ku Prof.Kamîran Bedirxan Kî ye? ? Ji bo çi evanan niha bûne noker û casos?

Welatparêziya binemala Bedirxaniyan li seranserê Kurdistanê naskirî ye, hemû siyasetmedar, şoreşvan, nivîskarên Kurdistanê nirxeke buha didin têkoşîn û berhemên vê binemala netewperest û şoreşger. Ez dixwim li vir mînakekê tenê ji kesên mîna kek Ferhad re hûnim zimên;gava Prof.Dr.Kamîran Bedirxan ji Ewropa diçû Kurdistana Başur, serokê nemir, pêşengê gelê Kurdistanê, Mila Mistefa Berzanî pêşwaziya rêzdarê nemir Kamîran Bedirxan dikir û li gor hin çavkaniyên devkî dihate gotin, ku serokê nemir çentê Dr.Kamîran Bedirxan radikir !!!!

Ma gelo eger kesayetiyek mîna serok Berzanî , çentê Dr.K.Bedirxan radike! Yanê eva li nik kek Ferhad û yên mîna wî çi wate ye ??

Dîsan nimûneke din, gava şoreşa Kurdistana Îraqê di sala 1975 an de têkçû, û nelihevî di nav tevgera siyasî û nav tevgera xwendekarên Kurd li Europa de destpêkir, Têkoşer û rêzdar Mam Celal Talbanî û têkoşerê nemir Norî Şawîs li kongira me ya xwendekaran KSSE li Berlîna Rojava beşdar bûn. Em mîna endamên komelê di kongirê

de amedebûn, me ji nişkava dît ku rêzdarên têkoşer Mam Celal Talbanî û nemir Norî Şawîs rabûn ser xwe û li piya mîna leşgeran rewestiyan, lê me li pişt xwe temaş kir, me dît ku nemirên mîna Prof..Kamîran Bedirxan, Dr. Noredîn Zaza û Hemreşê Reşo derbazî hundirê kongira me dibin, yekser em hemû li serpiyan rawestiyan û me li gel berêzan Mam Celal Talbanî û Norî Sawîş didan çepkan ta ku ewanan cihên xwe li rex têkoşer Mam Celal Talbanî girtin.

Bê guman kek Ferhad baş zane ku 22.Nîsanê cejna rojnamegeriya Kurd e, û di vê rojê de li Kurdistana azad jî, li seranserî Kurdistanê û li dervayî welêt wêneya mîrê rojnameya Kurdî Miqdad Medeht BEDIRXAN bi dîwaran ve tête daliqandin. Ma gelo kek Ferhad qet ji hukumeta herêma Kurdistanê ne pirsî, ku ji bo çi ev –Nokerê gewre -li nik Kurdistanîyan cihê rêzdariyê ye ?

Eger em vegerin ser mijara zimanê Kurdî û tîpên latînî, tu kes nikane ji me tu kesî dîtir qedexe bike ku ewa nirînên xwe di derbarê zimanê yekgirtî de bipeyive yan binivîse;lê divê em hemû rêzê li nirînên hev yên zanistî bigrin, divê kesên mîna rêzdar Ferhad bi awakî zanistî pêşniyarên xwe bike û divê ew bi rêzdarî jî li lêkolînên zanistî yên birayên xwe Kurmanaxêv jî temaşe bike, yekgirtina zimanê Kurdî, aloziyên zimanê me bi bêbextiyên erzan çareser nabe. Pirsgirêka yekitiya zaravên Kurdî ne hêsan e, ji bo wê xebat û pir lêkolînên zanistî, konfirans û kongirên Kurdistanî pêwîst in. Bi ser vê de jî niha hukumeta herêma Kurdistanê û gelê Kurd xerîkî hin pirsên din yên rojan ne, siyasetmedar, rewşenbîr û nivîskarên şehreza rewşa Kurdistanê û Îraqê baş dibînin û ewanan dizanin kînga yekitiya zimanê Kurdî destpêdike. Di vê derbarê de jî serokê herêma Kurdistanê kek Mesud

Berzanî bi zanistî û hişmendî gotiye: (NIHA NE DEMA  
ZIMANÊ YEKBÛYÎ YE ).

Malpera welatî net û malpera Pena Kurd ( Almaniya)

**Rapora Bêkir û Hamilton ne tenê li dijî gelê  
Kurd de, lê ewa li dijî  
bayê dêmokratîyê li Rojhilatanavîn e jî**

Pir caran di dîrokê de şer û borandinên cîhanê mezin ji bo rizgarkirina gelên bindest dibin fersendên kêrhatî, ew gelan sudên mezin ji wan heyamên awerte dibînin û dewletên serbixwe yan nîv serbixwe ava dikin. Şerê yekemîn di salên (1914-1918) de, rûxandina Împiratora Osmanî û avakirina hin dewletên nîvserbixwe li ser xaka welatê Erebi nimûneyên diyar in. Dîsan rûxandina destlata Sovyetistanê û Yogislafiya berê ji sala 1990 î û vir de bûne sedema serxwebûna pir komarên Sovyetistana berê û piştî cengeke mezin navxweyî di salên 1992-1995 de hin dewletên serbixwe li şûn Yogislafiya yekgirtî li gor hevpeyman (Datîyon) di sala 1995 an de bi alîkariya Emêrêka hatin damezrandin û herweha jî di encama hilweşandina sêstêma sosyalistiyê , Almaniya Rojava û Almaniya Rojhilat jî bûne yek dewlet.

Girêdayî van axivtinên jorîn jî, mirov dikane dîsan hevpeyman (Sêverê) ya ku di piştî cenga cîhanê ya yekem de, di sala 1920 ê de pêkhatiye, bi bîrhûne.

Li gorî peyman (Sayiks-Pîko) di sala 1916 an de, dewletên hevpeyman pir gel û axên wan gelan ji bin nîrê Osmanîyan rizgar kirin û dewletên nîvserbixwe di bin siyên koleddarên nû mîna Firansa, Birêtaniya, Îtaliya de avbûn.

Di wê demê de nûnerên gelê Kurd mîna Cenêral Şerîf Paşa daxwaza avakirina dewletek Kurdî ji kongira aştîyê (Hevpeymanî Sêverê) kir, lê dewletên hevpeyman li gorî berjewendiyên xwe hinek giringî dane gelê Kurd û biryara pênasîna mafê gelê Kurd û damezrandina dewletek autonomî li ser (sedî 40) ji axa Kurdistanê Bakur istandibûn.

Ev hevpeymanî û pênasîna mafê netewî ji aliyên dewletên navnetewî de di dîroka Kurdistanê de cihêkî nixbuha istandibûn, lê mixabin dewletên hevpeyman li ser sozên xwe neman, her dewletek ji wan li gorî kêrhatiyên xwe têkelî bi Mistefa Kemal Atatürk re kirin, li gorî sudên xwe li doza gelê Kurd temaşe kirin û ne dixwastin biryara (Sêverê) dermafê gelê Kurd zû, zû pêk hûnin. M. Atatürk pêwendiyên xwe bi dewletên hevpeyman re rind dikir û li dawiyê di sala 1923 an de peymanî (lozanê) derket hola siyasî. Dewletên hevpeyman di vê peymanê de gelê Kurd yekcarî ne anîn ser zimanên xwe, û ne jî çêra hevpeymanî (Sêverê) bûn. Bi vî rengî gelê Kurd bûye qurbana berjewendiyên dewletên sermiyandar û koledar.

Lê dîsan gelê Kurd xwe ne spart qedera siyasî, ewî raperîn û şoreşên Kurdî berdewam kir. Di sala 1946 an de li Îranê komara Kurdistan bi seroketiya nemir Qazî Muhemed û bi alîkariya hin dewletên navnetewî avabû û bi alîkariya van dewletên navnetewî bi xwe jî komara Kurdistan hate rûxandin û serokê komara Kurdistanê jî hate darvekirin. Ev jî dîsan di dîroka siyaseta dewletên navnetewî de mîna Emêrika, Firansa, Birêtaniya, Sovyetistana berê mîna keke geş e, armancên van dewletan berî her tiştî berjewendî ne û ne pêkanîna dêmokratîyê ye.

Dîsan wek nimûne: Şoreşa Kurdistana Îraqê ya dawiyê bi seroketiya nemir M.M.Berzanî di sala 1975 an de bi alîkariya Emêrîka hate rûxandin, Emêrîka sozên xwe bi nûnerên gelê Kurd re bi cih ne anîn û şalyarê derve yê Emêrîka Hinrî Kêsingir gote raya giştî ku di siyasetê de sincî nîne.

Di sala 1991 ê de raperîn li herêma Kurdistana Îraqê çêbûn, bi milyonan Kurd penaber bûn. Di 5. 04.1991 ê de (Encumena Parastinê ya Navnetewî) biryara parastina herêma Kurdistanê derxist, di 19.05.1992 an de yekemîn perlemana Kurdî hate hilibjartin û di 5.07.1992 an de yekemîn hukumeta Kurdî jî hate ragîhandin .

Di van serbûyerên jorîn de rola Emêrîka di piştvanîya gelê Kurd de pir bilind bû, Kurdan gotin: Hêdî Emêrîka li xwe vegeriyaye, ewa dixwaze alîkariya gelê Kurd bi kêmasî li Kurdistana Îraqê bike, lewra jî piraniya partiyên Kurdistanê xwestin helwestên Emêrîka yên berê, û helwestên dewletên hevpeyman yên neyênî dermafê gelê Kurd di hevpeyman (Lozanê )de û rola Emêrîka di rûxandina şoreşa 1975 an de jibîr bikin û bi hişeke nû, bûyerên nû li cîhanê û bi taybetî li Rojhilatanavîn bixûnin.

Li aliyê din bi rastî Emêrîka û dewletên din mîna Birêtaniya, herêma Kurdistanê ji hêrişên Sedamê dîktetur parastin û gelê Kurd herêma xwe Kurdistan bi xwe û bi rêbertiyên du partiyên sereke, P.D.K (kek Mesud Berzanî ), Y.N.K(Mam Celal Talbanî bi rêvebirin.Pêwendiyên pêşengên Kurdistanê bi partiyên Ereben Îraqê û ji bo rûxandina rêjîma Sedam xurtir dibûn.Herweha jî hemû partiyên Kurdistanî û yên Îraqî bi karên hevbeş ji bo têkçûna rêjîma partiya (Bes) têkeliyên xwe bi Emêrîka û

Birêtaniya re pir baş kirin, û evan herdu dewletên hêzdar bi razîbûna hêzên Îraqî û Kurdistanî destlata (Bes) di 9.04.2003 an de bi hêrişeke leşgerî rûxandin. Heyameke siyasî nû li Îraqê peydabû, di cîhana siyasî de hate gotin, ku Emêrika pirojeya xwe ya bi Rojhilatanavîn ya nû ji Îraqê de destpê kir, hemû hêzên dêmokrat û bi taybetî li Rojhilatanavîn bi rûxandina rêjîma dîktetur dilşad bûn, ewanan bi hêviyên mezin li pêşerojên xwe temaşe kirin. Du hukumetên Îraqê yên katî bi lihevhatinên partiyên Kurdî û Erebi û bi serdariyên van herdu berêzan 1- Îyad Elawaî 2- û Îbrahîm Elceferî hatin damezrandin

Di pişt re hukumeta Norî Elmalikî hate avakirin û berêz Mam Celal Talbanî mîna serokê Îraqa fêderal cara duhem hate vebjartin.

Bê guman di vê heyamê de jî, destura Îraqa fêderal di perlemana Îraqê de hatiye pejrandin, û di desturê de hatiye; ku divê li gorî xala 140 î pirsra Kerkuka Kurdistanî ta sala 2007 an çareser bibe.

Lê weke ji hemû cîhanê re rind diyar bûye ku ji roja rûxandina rêjîma (Bes) de û ta roja îro rêxistina (Elqaîde) ya têror, rêxistinên Erebi Sinî û hin caran yên Şî-î û bermayên partiya (Bes) bi alîkariyên hin dewletên cîran û bi taybetî mîna dewleta Sûriyê şerê hukumeta Îraqa fêderal bi hemû alavên ne rewa dikin û ta niha bi hezaran hemwelatîyên Îraqî bi karên têrorî û xwekujtinî hatine şehîdkirin.

Hêzên dewletên hevpeyman bi seroketiya leşgerên Emêrika û leşgerên komara fêderal gelek aloziyên dijwar dîtine û hîn jî dibînin, ewanan mixabin nikanîbûn û hîn jî nikanin gelê Îraqê ji hêrişên têrorist, hêzên netewperest û

kevneperest biparêzin, ango gelê Îraqê di bê aramiyeke mezin de dijî. Di van mehên dawiyê de pir êşkere bû ku dewletên hevpeyman bi serdariya Emêrika ji xwe re li hin berdêlên çareseriyê digerin, lê bê guman ewanan dizanin ku çare li nik hêzên Erebên Sinî, partiya (Bes) û dewletên dirawsê ye. Lewra jî destlata Emêrika hîn beriya 9 mehan du kesayetiyên nasdar 1-Bêkir ji partiya Komarî (Elcomhorî ). 2-Hamilton ji partiya Eldemokratî ji bo amedekirina raporeke giştî şandin Bexdadê, û evan herduyan rapora xwe bi 160 rûpelan û bi 79 xalan di 1.02.2006 an de pêşkêşî raya giştî kirin. Çima ev rapora hate holê?

Her mirovek hêdî zane ku dewletên hevpeyman bi seroketiya Emêrika hêdî nikane berevaniya gelê Îraqê bike, gelên wan dewletên hevpeyman û pir partiyên wan dewletan, rexnên xwe arastî destlatên xwe dikin, ewanan dibînin ku Emêrika, Birêtaniya li Îraqê binketî ne û hêdî ewanan naxwezî hemwelatiyên xwe li Îraqê bimirin. Ev her du partî naxwazî cemawer ji xwe dilsarî bikin û naxwazî jî berjewendiyên xwe li Rojhilatanavîn wînda bikin, ji ber vê jî ewanan xwe neçar dibînin, ku nameyekê bi 160 rûpelan ji van hêzên karîger û dewletên dirawsê re bişînin. Bi ser vê de jî, balyozê dewleta Emêrika Xelîl Zade hîn berîya derketina vê raporê bi dizî diyalogên lihevhatinê bi rêberên partiya (Bes) re li Urdonê pêkanîbûn. Diyar e mercên pêşengên Besiyân li ser Xelîl Zade pir giran bûn, çimkî ewanan ji wî re gotibûn û ji wî xwestibûn; ta ku diyalog di navbera me de berdewam bibin, divê hûn di gava yekem de Sedam Husên ji zîndanê serbest bikin. Dêmek pir ji me re zelal

dibe, ku çiqas Emêrîka li Îraqê serketî ye û ewa çiqas binketî ye.

Wek me got; rapora Bêkir-Hamilton nameyek pir zelal e, Emêrîka dixwaze li ser navên van herdu siyasetvanên navdar Bêkir û Hamêlton ji dewletên cîranên Îraqê bi belge bêje: Va ye tiştên ku hûn ji wan ditirsîn, emê wan tirsan ji dilên we derxînin. Dewletên dirawsê pir bi dilxweşî li vê rapora bêzar temaşe kirin ji ber ku, ewanan û hemî hêzên dijî dêmokratiya Îraqê baş dîtî; ku Emêrîka li Îraqê westîya ye û ewa hêdî nikane pêdariyê baş li Îraqê bike .2-Ewa hêdî nikane pêbendiyê bi destura Îraqê ya rewa bike, ango ewa niyaz dike ku destura Îraqê li gor hin berjewndiyên wan dewletan û wan hêzên regezperst bi karhûnin.3-Ya herî giring ew e ku Emêrîka dixwaze bi çavên din li gelê Kurd û Kurdistanê temaşe bike, yanê Emêrîka (Bêkir –Hamilton) navê Kurd û Kurdistanê di rapora xwe de bi mebestek neyênî ne anîne zimên, lewra ne dûr e ku ewa dixwaze ne rasterast dîsan hevpeymanî (Lozanê) hûne bîra van dewletên dirawsê û hevkarên wan.4-Ewan di rapora xwe de pîrsa çareserkirina Kerkukê rawestandin.5- Ewanan dixwazin fêderaliya Kurdistanê Îraqê jar bibe û destlatiya dewleta navbendî li Bexdadê li ser Kurdistanê hêztir bikin, ango ewanan dixwazin hukumeta herêma Kurdistanê qelstir bikin, ta ku rola gelê Kurd li Kurdistanê jartir û qelstir bibe û nikanibin di pêşerojê de bi hêz berevaniya mafên gelê Kurd yê dadmend bike û ta ku hukumeta herêma Kurdistanê nikanibe sudan li gelê Kurd li beşên din jî bike 6- Bêkir û Hamilton bi awayeke vekirî diyalogan bi dewletên cîran re dixwazin .

Lê dewletên cîran jî bi tektîkên jêhatî û li gorî berjewendiyên xwe bazarê bi Emêrîka re li ser hin pirsan vekirî û li ser hin pirsên din bi nehênî dikin wek nimûne: Îran ji Emêrîka dixweze ku ewa pirojeya wê ya atomî rewya bibîne û hêdî şerê wê neke û Sûriyê jî dixwaze ku Îsraîl (Gira Colanê) li wê vegevine. Turkiyê jî yekcarî naxweze ku Erebên şî î li Îraqê xawên roleke mezinbin, yan fêderalî li herêma Başurê Îraqê ji bo Şîyan jî ava bibe. Lewra jî me dît ku di vê mehê de, çawa Turkiyê kongira Erebên Sinî li Istenbolê hembêz kir.

Li aliyê din Sûriyê bi dizî ji Emêrîka dixwaze ku ewa çavên xwe li ser dadgeha navnetewî derbarê kuştina Refîq Elherîrî û şalyar Bîr Cemîl damrînin .

Em nikanin bawer bikin ku Sûriyê bi van daxwazên xwe re rastgo ye, ewa jî weke Emêrîka bazirganiya xwe dike, yanê ewa pir qezencan ji Emêrîka û ji Îsraîl dixwaze, lê bi ya me be, Sûriyê di rewşa niha de, dê tenê li ser du daxwazan raweste; 1-Divê ku Emêrika û hevalbendên wê rasterast bi rûxandina rêjîma partiya (Bes) li Sûriyê neramin. 2- Divê evan dewletan rastiya rapora dadgeha navdewletî dermafê Refîq Elherîrî û Pîr Cemîl bincil bikin. 3-Divê evan dewletan piştvanîya sazî û rêxistinên rikber li hundir û li dervayê welêt nekin.

Lê bi ya me be, hemû daxwaziyên din ji Sûriyê re ne pir girîng in, ewa bi van daxwaziyên xwe mîna vegevandina Gira Colanê, ji xwe re dike mîna ciwankirina rûya xwe ya netewî .

Li aliyê din jî Kundelîza Rayis şalyara derve ya Emêrîka hin caran di ragihandinê de dibêje: Em diyalogan bi Sûriyê û Îranê re napejînin. Bi vî rengî nirîna wê tersî

banga Bêkir û Hamilton ji Sûriyê û Îranê re ji bo diyalogê ye. Ev du nirînên bervajî hev ji dewleta Emêrika cihê gumanên mezin in. Em dibêjin herdu dewlet pir tiştan ji hev dixwazin, lê herdu jî dixwazin li dawiya bazarê de li ser van du xalên niha zor giring û metirsî rawestin .!- Sûriyê alîkariya komara Îraqê ya fêderal bike, û alîkariya rêxistinên rikber û têrorîstan neke. Ev niha ji bo Emêrika zor giring e. 2- Li hember wê Emêrika hukemeta Sûriyê ji rûxandinê û rikberan biparêze .

Bê guman eger di rastiyê de ev herdu dewlet li ser van herdu xalan bi tenê û bi dizî li hev bikin, di nirîna me de ewa ne tenê lêdaneke neyînî mezin ji Kurdan re ye, lê ewa wek tîreke din arastî hemû hêzên dêmokratîxwez li herêma Rojhilatanavîn dibe .

Hêzên dêmokratîxwz li van welatan berê qels û jar in, ew û mixabin nikanin li ser lingên xwe li hember destlaên welatên xwe rawestin. Vê carê ew dê her qelstir bibin û dê carek din cîhana dêmokratîxwezan bibe qurbana qezencên dewletên keysebaz û berjewendparêz.

Belkî ji ber van siyasetên Emêrika yên çewt, Turkiyê wêrîbû, komgira Erebên Sinî li Istenbulê hambêz bikira, ta ku Emêrika hîn pirtir kompîrîmîsan bi dewletên cîran re bike, hin daxwazên wan yên giring mîna pîrsa Kerkukê û fêderaliya Kurdistanê li Îraqê bibihîsin, û destkewtiyên gelê Kurdistanê dîsan beravêtî bikin .

Derçûna rapora Bêkir-Hamilton bê aramiyek mezin li nik serkirdayetiya hikumeta Kurdistanê û gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê peyda kir, serokê herêma Kurdistanê gelek bi lez helwesta xwe bi neyînî li diji vê raporê derbirî, hemû partiyên Kurdistanê û bi hezaran

rewşenbîr û siyasetmedarên serbixwe eva rapora rexnekirin.

Tevî em dizanin ku serok Corc Boş bi telîfonê bi serokê Kurdistanê kek Mesud Berzanî re û bi serokê Îraqê Mam Celal Talbanî re gotibû: Divê hûn xwe bê aram nekin, emê her tiştî li gor sudên Îraqê bikin, û em destkewtiyên xwe û we li Îraqê têknadin..., serok Corc Boş bi van gotinên gelemper bersiva herdu serokan û bersiva gelê Kurdistanê û Îraqê anîn zimên. Lê mixabin em dibînin ku bersiva serokê Emêrîka bersiveke ne zela e, di wê de tu çespendin li ser destkewtiyên gelê Kurdistanê û li ser Kerkukê û hêzkirina Kurdistanê fêdral ranewestiyaye, lewra jî gelê Kurdistanê di ne hêminiyê de dijî û em hemî naxwazin bawer bikin ku Emêrîka carek din sozên xwe bi pêşengên Kurdistanê û gelê Kurd re bi chi nîne

Di encama van gotinên xwe de em dixwazin bêjin ku niha Emêrîka cihê rexneyeke mezin e 1-Ji ber ku ewê nikanîbû rewşa Îraqê berî rûxandina rêjîma dîktetur baş bixwenda.

2- Ewê nikanîbû pêşde rastiya hundir Îraqê bidîta.3- Ewê pêşda lîskên xwe yên siyasî bi dewletên dirawsê re nekiribûn. 4-Emêrîka zora xwe tenê dabû hêza xwe ya leşgerî.5-Emêrîka û hevalbendên wê piştî rûxandina rêjîma Sedem dîsan pir caran bi serê xwe biryar istandine û li gor nirînên xwe û bê qedirdayîn ji nirînên partî û rêxstînan Îraqî re, bi taybetî di warê asayêşê de gavên xwe şaş avêtine.

Em bawer dikin hîn pir xalên din li pişt perdan hene ku em niha nikanin wan bibînin, bê guman di rojên duhatî de dê hîn gelek pirsên din zelal bibin .

Lê eger sedemên Emêrika çi dibin, bila bibin , ewa û hevalbendên xwe ve bi pêkanîna vê raporê dîsan birîneke gewre di terma tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê de vedikin û ziyaneke bê sînor dighînin bizava dêmokratîyê li Rojhilatanavîn.

Lewra, divê ne tenê gelê Kurd li Kurdistana Başur ne razîbûna xwe ji rapora van herdu siyasetmedaran derbibirin, lê pêwîst e gelê Kurd li her sê beşên din jî, hemû rêxistin û partiyên dêmokratîxwez, aşîxwaz û bi kêmasî li Rojhilatanavîn bi awayên şarastanî helwestên xwe li dijî xalên neyênî di raporê de hûnin zimên .

## Roviyên kîndar nayên gazinckirin

Dîroka Osmanliyan û ya Kemalîstên Toranîst di eniya cîhana dêmokrat û pêşverû de pir bi xêzên hovane hatiye naskirin, çerx û dem li Turkiyê rawestî ya ye, ne destladarên sîvîl, ne destlatdarên leşgerî û ne jî destladarên bi navê ola Îslamî kanîbûn zikreşîya xwe bi bayê pêşketina cîhanê bişoîn, yan mêjîyên serên xwe bi guhertinên şarastanî hinekî avdin.

Bi karanîna şêweyên ne mirovane ji aliyê roviyên gewr de li dijî milletên bindest mîna gelê Ermen û gelê Kurd pir sanahî û xweserî ye. Eger em tenê hinekî li rûpelên mêjûya nû li Turkiyê û li Kurdistana Turkiyê vegerin, gelek bi lez pir bûyerên hovane têtin bîra mirov. Kuştin, serjêkirin, şewtandin, talandina namusên jinên Kurd, qelaştina zikên jinan û zaroyên Kurdan di hemû raperîn û şoreşên Kurdistana Turkiyê de, ( şoreşa Şêx şêid Pîranî, şoreşa Dêrsim, şoreşa Araratê ) li nikTurkên regezperest û kîndar zor rûdawek e xwezayî ye.

Gelê Kurd li her çar beşên Kurdistana pirtîrî çar hezar sal li dijî dijminên xwe bi mêrane berxwe dide, gelê me ji bo azadiya xwe bi milyonan pakrewan dane, eniya dîroka bizava azadîxwaza Kurdistana li herderê mîna stêrkan geş e. Pakrewanên mîna Şêx Seîd Pîranî, Qazî Muhemed, M.M.Berzanî, Dr. Ebdilrehman Qasimlo, Leyle Qasim û Zekiye Alkan û h.d Vîna gelê me hîn hêztir kirine.

Em dixwazin di vê kurtegotara xwe ya nerazîbûnê de ji raya giştî li cîhanê û ji raya giştî ya Kurdistana re bêjin: Dijminên me karên xwe li dijî dêmokratîyê, li dijî

mirovperweriyê, li dijî azadiya gelan dikin, ewanan tucarî ji ber karên xwe yên ne bajaravanî û ne mirovane şerm nekirine, û ne jî niha ji ber jehirkirina serokê rêzdar Ebdela Ocelan şerm dikin, di ferhenga siyaseta Toraniyan û şovîniyên Erebb û Faris de her tiştêk li dijî Kurdan rewa ye.

Ji ber ku dijminên me bê rawestan, li me xistine, em kuştine, serokên me darvekirine, lewra jî em hêdî çî ji wan bibhîsin, bi rastî, em matmayî namînin, û yekser em dibêjin: Dijmin, dijmin e, û pendeke Kurdî dibêje: (Rî bûye bost, lê dijmin ne bûye dost) . Lê tiştê herî matmayî û ne xweserî ew e, ku îro dengên dêmokra û azadîxwazên Kurdistanê û dengên hêzên dêmokrat li Rojhilatanavîn, li Ewropa û li hemû cîhanê li dijî cehirkirina berêz E. Ocelan bilnd nabin, û deriya dadgeheke mezin ji bo tawanên MÎT yên Turkiyê venakin !!!

Em bi tundî hukumeta R.Ordeyan ji ber vî karî tirsonekî, rûreş û şermezar dikin, em dibêjin: Bijî hevkarîya hêzên Kurdistanî, bijî hevkarîya hêzên dêmokrat û rizgarîxwaz li Rojhilatanavîn û li Cîhanê û azadî ji rêzdar E. Ocelan re !!!!

10.03.2007..Malaperawelatî.net-

.....

## **Serxweşiyek vekirî ji malbeta apê Adîk û gelê Kurd re**

Ez jî mîna hemû kurdperweran bi koçkirina şahê tembura Kurdî, şahê sazên Kurdî yên kevneşopî apê me, apê Adîk pir xemgîn û bê zar bûm.

Cara yekem min hunermendê kurdperwer û rûmetdar di sala 1993 an de di yekemîn mîhrecana (Roja Helbesta Kurdî) de li (Kela Horî) li herêma( Çiyayê Kurmênc) nas kir. Temenê wî di ser 80 salî re bû, gava me ew bi navê komîta amedekar û bi riyê hevlekî me vexwendî mîhrecanê kir, ewî gotibû, ez mirovekî kal im, ez naçim şahiyên û zemawendan, lê eger eva (Mîhrecana Helbesta Kurdî) ye, ezê ji bo xatirê kurdweriyê û ji bo xatirên hevalên welatperwer li mîhrecanê beşdar bim. Di rastiyê de jî apê me, sazbandê mezin bi rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên gelê xwe re li ( Kela "Horî) tev tembura xweamede bû, ewî bi sazên xwe dilên me vejand, ewî li ber sazên tembura xwe hestên helbestvanan germ kirin, ewî bi sazên xwe lat û nerdewanên (Kela Horî) yên bêzar, sernûve rûgeş kirin, ewî tev dengên helbestvanên xwe mizgînî ji bavpîrên Kurdan re dişandin. Ew roja hîn di bîra min de ye ku çawa dîmenên derdora me, çûk û balindên li ser daran bi sazên hunermendê me re dikenyan.

Ez dixwazim dilşadiya xwe jî hûnim zimên, gava min keç û lawên gelê Kurd li ser rûpelên malperên Kurdî li derdora terma apê nemir Adîk dîtin, eva dîsan tête vê

wateyê ku gelê me û rêxistinên tevgera me ya dadmend tucarî hunermendên niştimanperwer jibîrnakin, bi ya min be jî, ewa rudaweke şaristanî ye û nîşana pêşketina tevgera me û gelê me ye .

Ez bi boneya vê bûyera reş serxweşiya malbeta hunermendê gernas û gelê Kurd dikim, û dibêjim: Bila dilên we hemûyan hêmin bin, apê me jî niha tev karwana pakrewanên Kurdistanê di buheştê de ye, ew niha li gel hevalên xwe, dengbêj û sazbandên nemir ahengan ji bo pêşerojê geş ji gelê Kurd re li dardixin.

Careke din serên we hemûyan xweş bin !

Bila sed gurzegul li ser gorna nemir apê ADÎK bin.

Almaniya

8.06.2007 Malpera welatî.net.

**Têkoşîna nîvsedsalî li Kurdistana Rojava**  
**li gelê Kurd**  
**û li hêzên dêmokratîxwaz**  
**pîroz be**

Di destpêka sedsala 20 ê de rûdawa koledaran mîna Firansa û Birêtaniya hate holê, ewa ji bo gelên cîhanê seretayêke bêzar bû, şerê cîhanê yê yekem 1914-1918 ji bo bidestxistina berjewendiyên koledaran pêkhat. Di encama vî şerî de, Kurdistan cara duhem li gor Peymana Saykis-Pîko(1916) parve dibe û Kurdistana Rojava (Cezîrê, Ciyayê Kurmênc û Kobaniyê) li gor peymanên Turkiyê û Firansa di 20.10.1921ê de bi Sûriyê re dikeve bin nîrê Firansa .

Dîroka Firansa li Sûriyê reş e, ewê cidabûn ne dikir navbera gelên Erebi û Kurd, lewra gelê Kurd jî mîna azadîxwazên Erebi bi hemû tiwanên xwe li dijî koledra Firansa têkoşîn dikir û ji jo azadiya Sûriyê bi camêrî qurbanî pêşkş kir. Lê piştî ku Sûriyê bi saya têkoşîna gelê Kurd jî di 17. 04.1947 an de ji koledarên Firansa rizgarbû, destladarên Sûriyê pir zû heval û dirawsiyê xwe(gelê Kurd) jibîr kir, ewanan tucarî nikanîbûn nasnama netewî ya gelê Kurd nas bikirina, bi ser vê de jî, ewanan zor û setemkarî li gelê me dikirin.

Ronakbîrên gelê me nikanîbûn rewşa awerte li ser gelê xwe bipejrandana, lewra jî hin komele, rêxistinên civakî, û klup bi destên wan li Kurdistana Sûriyê hatin

avakirin û paşê di roja 14.06.1957 an de hin têkoşreên rêzdar mîna nemir Osman Sebrî, nemir Dr .Noredîn Zaza, Reşît Hemo, nemir Mihemed Elî Xoce, Ebdilhemîd Derwîş, Şewket Henan û hin din yekemîn rêxistineke siyasî û bi armancên netewî zelal bi navê (Partiya Dêmkokrat ya Kurdistanê) (Sûriyê) damezrandin.

Di roja 14.06.2007 an de nîvsedsal tomî di ser avakirina yekemîn partî li Kurdistana Sûriyê re derbaz dibe, eva roja, roja destpêkirina tevgera azadîxwaza gelê Kurd li Kurdistana Rojava ye, hemû partiyên me, hemû rewşenbîr û kesayetiyên welatparêz xwe bi bîranîna vê roja pîroz şehnaz dibînin.

Di rastiyê de, ji sala 1957 an û ta sala 2007 an de pir mixabin gelek partiyên me hatine damezrandin, li gor ku ez zanim hejmara wan bi yê mezî û bi yê pir biçûk ve, nimra 14 an derbas kiriye, lê li gor yasayên siyasî û rêxistinî, bizava me ya dadmend van hemû partiyên diçerçewîne, lewra jî gava ez niha bêjim: Tevgera me li Kurdistana Sûriyê, û bê ku ez bêjim eva partiya jîr e û ya dîn qels e, yanê ez hemû partiyên û kesayetiyên siyasî serbixwe jî bi nav dikim.

Di bin siya van çend rêzikên jorîn de dixwazim li vir hin rastiyên siyasî û rêxistinî pir bi lez li Sûriyê biçespînim. 1-Tevgera me ji roja damezrandina xwe de û ta roja îro têkoşîneke dadmend û aştiyane ji bo pêkanîna dêmkratiyê û bi destxistina mafên netewî li dijî hukûmetên regezperest û ne dêmkokrat dike.2-Tevgera me ji roja rojê de ji bo biratiya gelê Ereb û gelê Kurd dixebite .3-Tevgera me tu carî ne gotiye: Emê Kurdistana Rojava ji Sûriyê veqetînin.4- Tevgera me baweriya xwe bi karên

hevbeş bi rêxistinên dêmokratîxwaz re li seranserî Sûriyê tîne.5- Tevgera me xwe beşek ji bizava dêmokratîxwez û aştîyane li Sûriyê û li Cîhanê dibîne.6- Tevgera me di xebata xwe de, xwe naspêre ser dewlet û hêzên keysebaz û xwaên dîrokên ne paqij.7- Tevgera me tucarî li dijî berjewendiyên gelê Sûriyê ne xebitiye.8-Tevgera me herdem berevaniya gelê Sûriyê û axa Sûriye kiriye û gelek diyardeyên din erênî ji surûşt û riweştta tevgera me ne .

Li aliyê din destladarên Sûriyê ta roja îro qenciyekek bi gelê Kurd ne kirine, ewanan tenê zordestî, setemkarî, arebkirina navên gund û bajarên Kurdan, hejmara awerte(angoy vekşandina nasnamên hemwelatiya Sûriyê ji sêsed hezar Kurd), zepkirina erdên Kurdan û erebkirina wan (Kembera Erebi) kirine .

Herweha jî destlatên Sûriyê naxwastine gelê Kurd mîna neteweke serbixwe xawên dîrok, şaristan, çand û ziman bibîne, lewra jî ewanan ta niha rêdan ne didan û nadin zarên me ku bi zimanê dayikên xwe bixwînin, çand û wêja xwe nasbikin, û gelê me kovar û rojnamên xwe serbest biweşîne.

Bi ser van hemû zordestiyan de, ewanan bi sedan têkoşerên gelê me derbend dikirin û hîn jî dikin, û wan bi pir awayên derûnî û laşî dêşandin û hîn jî dêşînin.

Eger çiqas tevgera me niha ne li hev be jî, angoy ewa ne di tenderustîyeke baş de dijî, lê dîsan ewa li gor gengaz û hêzên xwe, li gor mercên siyasî li Sûriyê û li gor heyama siyasî ya cîhanî têkoşîna xwe didomîne û berxwe dide ku vîna gelê Kurd derbibire .

Em çiqas xalên erênî yên tevgera xwe dibînin, lê em ji ber pir xalên neyînî jî di bizava xwe de dinalin, bi ya min be û bi kurtî, divê ne tendurustiya tevgera me, bandura neyînî li wireyên me yên netewî, siyasî neke, û nehêle ku em bi reşbînî li tevgera xwe temaşe bikin, ji ber ku reşbînî jî bi xwe nexweşiyek hîn girantir e, bervajiya wê, pêwîst e em nexweşiyên tevgera xwe bi geşbîniyê çareser bikin, çimkî dîroka gelek tevgerên siyasî, şoreşên azadiyê ji aloziyên siyasî û rêxistinî ne rizgar bûn, lê li dawiyê ewanan bi geşbînî û bi berxwedanên pîdar armancên xwe pêkanîne .

Ez jî di vê baweriyê de me ku tevgera me dê pêşkeve, dê di pêşerojê de xwe ji pir kêmaniyên rêxistinî û siyasî azad bike, di vê sebarêtê de jî ez pir bi hêvî me ku rewşenbîrên siyasî, kesayetiyên siyasî serbixwe, nivîskar û rojnamevanên welatparêz destên xwe ji tevgera xwe venekşînin û bi herdem bi awayên hişmendî û zanistî li gel tevgera xwe aloziyên ramanî , siyasî , çandî, rêxistinî bi nirîn û pêşniyarên xwe çareser bikin.

Bi boneya vê cejna mezin ya tevgera me, ez gelê me, hemû partiyên bizava me, hemû rewşenbîr û nivîskarên welatparêz li Kurdistana Sûriyê pîroz dikim.

-Bila bi sedan çepkegul li ser gornên damezrênerên mîna nemir apo Osman Sebrî , nemir Şewket Henan , û nemir Muhemed Elî Xoce û yên mayîn bin !

-Hezar silav li damezrênerên mîna Mamoste Reşît Hemo û mamoste Ebdilhemîd Derwîş û yên mayî bin.

-Bila bi sedan gurzên gulên li ser gornên pakrewanên tevgera me bin.

-Bila bimre zordestî û şovînîstî !

-Bijî dêmokratî li Sûriyê !

- Bijî tevgera me ya azadîxwaz li beşên din jî !

.....

13.06.2007 Malper:Welatî.net

## **Turkiyê û (partiya Îxwan Elmuslîmîn) û partiyên Erebeperest li Sûriyê nabin dostên gelê Kurd !**

Partiya Îxwan Elmuslîmîn ji berî çend salan;ango hîn piştî raperîna Avdara 2004 an de, ya ku li seranserî bajarên Rojavayê Kurdistanê bûye, dixwast pêwendiyên xwe bi partiyên Tvgera Kurdî û kesayetiyên Kurdperwer re girêde;vê partiyê li Ewropa hevdîtin bi hin siyasetmedarên Kurd re kirin, serokê wê, yê berê Elî Sedir Elbiyanonî hinekî zimanê xwe nermkiribû, ewî li ber têlvîziyonan(kenalên Cezîrê û Elerebiyê) pir caran li ser gelê Kurd radiwestiya û helwesta xwe ya erênî ta radeyekê ji gelê Kurd re dida diyarkirin.

Lê hîn di wê demê de jî, partiyên tevgera azadîxwaza gelê Kurd bi peyvên wî ne dihatin xopandin, ji ber ku ewanan dizanîn ku ramana( Îxwan Elmuslîmîn) ji rikberiya netewayetiya erebî ne hatiye rizgarkirin.Lê piştî şoreşa gelê Sûriyê di 15.3.2011 an de( Îxwan Elmuslîmîn) bi alîkariya Turkiyê xwe pirtir livand û bizava xwe xwe ya siyasî kir û di bin sîbera dewleta Turkiyê de li gel hin partî û rêxistinên din Sûrî û pir kesayetiyên din yê serbixwe Encûmena Niştimanî ya Sûriyê ji 350 mirovî, ji wan 270 Îslamperest bûn li Turkiyê bi seroketiyê akadêmiyekî serbixwe Dr.Burhan Xelyon damezrandin.

Encûmena Niştîmanî ya Sûrî ji roja rojê de li gor texmîna me li gor şîret û fermanên hukumeta Receb Ordexan giringî ne daye (Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê) ya ku niha ji 16 partiyên Kurd û 160-170 welatparêzên serbixwe û ji gelek hevrêzên Xortên kurd pêkhatiye. Lê pêwîst e em bêjin jî, tenê çend kesayetiyên serbixwe û nûnerên du, sê partiyên Kurd cihên xwe di Encûmena Niştîmanî ya Sûrî de girtine, lê mixabin ta niha jî ewanan nikanin hikariyên xwe di wir de li rêxistinên Îslamî û netewperestan bikin.

Encûmena Niştîmanî ya Sûrî di helwesta xwe de li hember doza gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê hezhezokî, keysebazî û neyênî ye; dengên partiya Îxwan Elmulîmîn, kesayetiyên olperest û hêzên Ereberperest di wird de pir bilind in û dengên Ereben pêşverû mîna Dr. Mihye Dîn Latqanî û Dr. Kemal libwanî pir nizm in, xuya ye ji ber vê rûdawa neyênî jî Dr. Kemal Libwanî xwe ji Encûmena Niştîmanî ya Sûriyê vekişand.

Di rastiyê de; di navbera Encûmena Kurdî û Encûmena Sûrî de hevdiîtinên rasterast li Qahîrê, li Tunisê û paşê li herêma Kurdistanê çê bûn, nûnerên Encûmena Niştîmanî ya Kurd li ber ronahiya biryarên kongira xwe danûstandin bi Encûmena Sûrî re kirin. Lê mixabin Îxwan Elmuslîmîn û hevalên xwe Ereberperest naxwazin taybetmendiya gelê Kurd li Sûriyê nas bikin, bi ya me be; ewanan bi tektîk û di bin bandore hin şîretên dewletên ewropî di kongira Tunisê de (17-18). 12.2011 ê de li ser vê deqê duhatî biryar wergirtin. (Encûmena Niştîmanî ya Sûriyê nasnama

netewî ya gelê Kurd Li Sûriyê dupat dike, divê pirsra Kurdî mîna beşek ji kêşa niştimanperweriya giştî li welêt were dîtin, herweha jî Encûmena Niştimanî ya Sûriyê dixwaze pirsgirêka kurdî çareser bike, setemkariyê ser Kurdan rake, ew Kurdên ku ziyan dîtine, divê ewanan şunziyanê wergirin, divê pênasîna mafên netewî yên gelê Kurd di çarçewa yekitiya axê û gel de were çespendin.) Encûmena Niştimanî ya Kurd biryara kongira Encûmena Niştimanî ya Sûrî li Tunisê ne pejirand, ji ber ku biryara wê ne l gor biryara gongira Encûmena Niştimanî ya kurd bû, herweha jî biryara kongiraTunisê nikanî bû vîn û daxwazên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê derbibirya.

Tevî helwesta neyênî ya Encûmena Niştimanî ya Sûrî dermafê gelê me, dîsan nûnerên Encûmena Kurd di kongira Encûmena Niştimanî ya Sûrî de li Istenbulê (26-27) 03.2012 beşdar bûn; nûnerên me bi hêvî bûn ku Encûmena Niştimanî ya Sûrî yekbûna gelê Sûriyê û hêzên dijber biparêze, lêvegerê li helwesta xwe bike û daxwazên gelê Kurd yên dadmend di pirojeya (Hevpeymana Niştimanî) ya di Sûriya pêşeroj de di vê kongirê de bipejrînin.lê pir cihê mixabîniyê ye ku vê carê helwesta Encûmena Niştimanî ya Sûrî dermafê gelê me de hîn pirtir neyênî bû, ewê di vê kongirê de biryara kongira Tunisê derbarê milletê Kurd de beravêtî kir û biryarek nûh, bejin kin, birîndar û bê herdu ling pêşkeşî dîroka Sûriya nûh kirin û gotin: (Destura Sûriyê dupat dike ku cidabûn di navbera pêkhatiyên civaka Sûriyê di warên olî, rêolî û netaweyetî de (Ereb, Kurd, Asorî, Suryan, Turkman û hin din de tune ye û destur bi wekheviya mafên wan di

çarçewa yekitiya axê û gel de li Sûriyê dipejrîne...) Vaye me dît çawa ÎxwanElmuslîmîn, partiyên regezperest naxwazin gelê Kurd mîna miletekî serbixwe û li ser erdê xwe dijî, bibînin; ewanan dixwazin bêjin ku Kurd mîna kêmetewên din Turkman , Ermenî , Asurî-Suriyan kêmetew e, ewa jî mîna wan li ser axa Ereban dijîn;ango ew jî penaber in. yanê Ereberperest jî dixwazin mîna kevneperest û riçperestên Turkan, Farisan, beşên ji welatê me û samanên Kurdistanê ji xwe re zep bikin.Lê pêwîst e em bêjin jî ku nûnerên Encûmena me di vê kongira îslamperest û ereberperst de bédeng neman;Dr.Ebdil Hekîm Beşar bi navê Encûmena Niştimanî ya Kurd di vê kongira îslamperest, ereberperest de got: (Ji ber ku Encûmena Niştimanî ya Sûriyê bi tenha xwe (Pirojeya belgeya peymanê niştimanî)nivîsiye, û em jî bi wê re di nivîsandinê de ne hevpar bûn û bi ser de jî, Encûmena Niştimanî ya Sûrî çareseriyek dêmokrat ji doza gelê Kurd re ne kiriye....., û her dîsan jî ewê pêşniyarên me yê giring ne pejrandinê, lewra em jî pirojeya vê belgeyê napejrin û di vê kongirê de jî beşdar nabin ..)

Wek hemû hemwelatiyên Sûriyê û hemû cîhan dizanin ku gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê ji roja destpêka şoreşa Sûriyê de(15.03.2011) bédeng nemaye, miletê me bi deh hezaran derketine û hîn jî derdikevin kolanên bajarên xwe û daxwaza rûxandina rêcîma Sûriyê dikin, û gelê Kurd di vê şoreşa azadiyê de qurbanî dane, em ji hemwelatiyên Sûriyê û ji Encûmena Niştimanî ya Sûrî dipirsin, gelo çima hûn dixwazin em bi we re di xxûnrêtinê de heval bin, lê em bi we re di parvekirina mafên netwî û bi wekhevî ne

heval in ????? Ma gelo eva di kîjan olî û desturî de heye  
??? lê hûn dixwazin em ji raya giştî re dîsan bêjin: ( Rîh  
bûne bust, lê dijmin ne bûne dost).

Efrîn.1.04.2012.Malpera welatî .net

X:Endamê komîta parêzwer(Emanê) ya Encûmena  
Niştimanî ya Kurd li Sûriyê.

**Dr.Ebdilmecît Şêxo jiyanêke dagirtî**  
**Siyasetmedar - Rojnamevan - Lêkolîner**

**Xwendevanên hêja rojnameya pêşverû li  
kulîlkeke din ji kulîlkên vê axa pîroz, herêma  
Şêrîn li Efrîna rengîn dibe mêvan ew jî  
Dr.Ebdilmecît Şêxo ye**  
**Hevpeyvîn:Hişmend Şêxo**

**Pêşverû:**Di destpêkê de tu dikarî ji xwendevanên rojnameya me re xwe bidî nasîn?

**Dr. Mecît:** Ez di sala 1951ê de li Efrînê ji dayik bûme, min xwendina xwe li vî bajarî jî kuta kiriye,di sala 1973an de ez çûm Almaniya Rojava,min li wir du salan li Akadêmiya zimanê Almanî xwendiyê.

Di sala 1978 an de ez çûm Mosko û di pişt re ez çûm Lênîndgrada berê,li wir min (Doktora di Felsefa Wêje), beşê rojnemegeriyê, di sala 1988 an de istand .

Herweha jî,di ber wê re, min bawernema fêrkirina zimanê Rusî ji zanîngehê di sala 1984 an de wergirtiye û di sala

Di sala 1988an de, ez vegerîm Efrînê.

Ji ber ku min nexwest ez bibim endamê (Partiya Bes), lewra jî ez ta niha bê kar im.

Di sala 1993an de, ez bi dilxwaziya xwe tev hevjinê xwe çûm Hewlêrê û li wir ez di zanîngehê de bûm mamosteyê zimanewaniyê.

Lê mixabin em li wir jî hinekî di warê diravî û jînê de bîndest bûn, lewra em li dawiya salê jî vegeerîn Helebê.

Di sala 1999 an de em çûn Almaniya û di sala 2008an de em dîsan vegeerîn Efrînê

**pêşverû:** Dr. Ez dixwazim tu ji xwendevanên rojnameya pêşverû re xuya bikî, guhdana te bi xebata rêzanî çawa bû ,tu kengî derbas nav yekem partiya Kurdî bû, û heya kengî tu di karên rêxistinî de maye?

**Dr.Mecîr :** Di sala 1969an de ez endamê (Partî Dêmkрата Kurd) bûm,di sala 1972an de ez mîna nûnerê xwendekarên Efrînê li kongira (Partî Dêmkрата Kurd) beşdar bûm, kongira me jî li Kurdistana Îraqê lidarket .

Ez li Ewropa jî,ta rûxandina şoreşa Kurdistana Îraqê, endamê (Partiya Dêmkрата Kurdistanê li Berlîn) bûm.

piştî wê ez bûm endamê (Girêdana Markisîstên Kurd) li Sûriyê (beşê Ewropa) û ta demeke dirêj min nûnertiya vê rêxistinê li Sovyetistanê dikir, lê di ber karên partîtiyê re, ez jî mîna pir heval û dostan endamê (Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa) û paşê endamê(Komela Xwendekarên Kurdistanê) bûm,û min hin salan jî di komîtên berpirsiyar de mîna berpirsiyarê pêwendiyên derve kar dikir.

piştî ez vegerîm Rojavayê Kurdistanê, min di partiyan de kar nekir, lê ez bi giştî li rex tevgera azadîxwaza Kurd radiwestîm û min di hin rêdeksiyonên weşanên Kurdî de kar dikir.

Di sala 1999an de, careke din ez çûm Almaniya, li wir min di (Partiya Yekîtiya Dêmkokrata Kurd) de kar dikir, ez endamê komîta rêxistina Ewropa, û berpirsiyarê ragîhandinê û sernivîserê kovara (Pênûsê) bûm.

Beriya ku ez vegerim Efrînê bi sê çar salan astengiyek rêxistinî ji aliya (Yekîti) de bi min re peydabû, ji wê demê de, ez ne di rêxistinekê de me, lê wek hûn zanin, niha ez mîna kesayetiyekî serbixwe endamê Encûmena Niştîmanî Kurdî me .

**Pêşverû:** Nêrîna te li ser tevgera rêzaniya Kurdî li Kurdistana Sûriyê çiyê?

**Dr. Mecîf:** pirsê te pir rewşa ye, lê bersiva wê pir dirêj e, bi rastî pir lêkolîn li ser vê yekê pêwîst in, lê pir bi kurtî min berê jî gotarek dirêj bi navnîşana (Tevgera Kurdî li Rojavayê Kurdistanê nexweş e) nivîsiye. Lewra ez hîn dibêjim û pir mixabin tendurustiya tevgera me hîn pir û pir ne baş e .

Erê tevgera me rewşa ye, dadmend e, ji bo azadiyê û pêkanîna mafên netewî têkoşînê dike, lê ewa ji ber nexweşiya xwe nikane gavên xwe baş û li gor demê bavêje, em bi hêvî ne, em dilsar ne bin û divê em pir berxwedanê bikin, xwe ji van nexweşiyên mîna ezeziyê û nezantiyê rizgar bikin.

Binêre kek Hişmend ! Çend partiyên me hene !

Binêre! Çend Encûmenên me hene !

Erê!Jerkî şoreşa Sûriyê destpêkiriye,partiyên me û Encûmenên me berxwedidin ku hemû bi hev re karekî hevbeş bikin, lê mixabin ta niha tevgera me di vî warî de serneketiye, tevî vê, divê em berxwedana xwe ji bo yekîtiya gelê Kurd berdewam bikin....

**Pêşverû:** Tu li rikberiya Sûrî çawa dinêrî û bi taybetî helwesta wan ji doza Kurdî re?

**Dr.Mecît :** Eger ez dîsan gelek bi kurtî bêjim:Bi giştî helwestên siyasetmedar û rewşenbîrên Ereb li hember gelê Kurd bi sê beşan parve dibe.

1 -Helwestên neyênî: Xawêna vê helwestê Satih el Huserî ye, ew ramangîrekî Ereb, Sûrî, netewperest û şovînîst bû, ewî du beşên Kurdistanê, beşê Sûriyê û beşê Îraqê wek xakên Erebî dizanîbû,ewî bi berhemê xwe yên nijadperest zor têkariyên ne mirovane û ne bajarvanî li mêjoyên piraniya gelê Ereb kiribû,lewra ta niha, helwestên pir şovînî ji pir partiyên Ereb li Sûriyê û li Îraqê jî derdikevin holê û ew pir bi tundî li dijî avakirina pêwendiyên Kurdî – Erebî radiwestin.

2-Helwestên erneyênî:

Ango hin caran, hin kesayetiyên Ereb nêrînên xwe der mafê gelê Kurd bi erênî derdibirin û hin caran jî bi neyênî derdibirin, lewra em dibêjin: Helwestên erneyênî.

Baş e, eger ez mînakekê ji dîroka hevdem berçav bikim.

Yasir Erefat carna dixwest di navbera tevgera Kurdî li Kurdistanê Îraqê û pêşmergeşên şoreşa Kurdistanê Îraqê bibe navbêncî û helwesta xwe bi erênî li hember Kurda dida diyar kirin, li aciyê din; çekdarên tevgera azadîxwaza Filestînî alîkariya Sedam Husên di lêdana raperîna Kurdan 1993an dikir, Yasir Erefat 50 hezar xortên Filestînî ji bo lêdana raperîna Kurdan şand.

Ez dixwazim nimûneke din hûnim bîra we; helwesta (Ragîhandina Şamê )ya ku ji hin rêxistin û ji kesayetiyên Ereben Sûriyê û ji hin partiyên Rojavayê Kurdistanê pêkhatbû, erneyên bû, ango ew ne li dijî hebûna gelê Kurd bûn, lê wan ne dixwastin jî gelê me li Rojavayê Kurdistanê mîna miletekî li ser axa xwe dijî bipejirandina. Hesên Ebdil-Ezîm serokê Partiya Hevgirtina Sosyalîs di vî warê de mînakek geş e. ....

Helwesta erênî:

Wek diyar e, dîroka gelê Kurd û Kurdistanê ji aliyên hin Ereban baş hatiye xwendin, agahiya wan li ser peymana Saykîs-Pîk baş e, lewra jî ew helwestên erênî dermafê gelê Kurd dibêjin wek nimûne: Serokê giştî yê (Komelgehên Dewletên Erebi) Ebdilrehman Ezam di sala 1943an de li ser Kurdan gotiye: Kurd netewek dilsoz e, ew ziyane nagihînin tu kesî...., divê netewa Erebi biryara çarenûsa Kurdan ji Kurdan re bihêle, Kurd dikanin bi xwe bêjin, eger ew dixwazin bi netewa Erebi re federaliyê ava bikin yan ew dixwazin kînga serbixwe bin, ew dikarin vê

daxwaza xwe bê ziyan bi cih hûnin,herweha jî serokê dewleta Cazaîrê Ehmed Bin Bila pir bi zelalî helwesta xwe bi erênî li hember kêşa Kurdî diyar kiriye.

Mixabin ta niha me helwesta erênî li Sûriyê ne dîtiye û helwesta neyênî pir e, lê helwesta erneyinî jî pir kême e, pir mixabin bizava hêzên rikberiyê ji du helwestan tenê hene- neyênî 2- erneyênî û ya erênî bi carekê tune, ango serêşiya pêşengên tevgera me hîn bi serdarên hêzên rikber re pir in,ji ber ku hemû hêzên rikber ta niha naxwazin dîroka me baş zanîbin, ew hîn ji kaniya çanda Satih-Elhuserî û Mîşêl Eflaq xwe perwerde dikin.Ez dixwazim hîn astengiyêke din giring bidim ber çavên Erebên Sûriyê;wek hîn jî zanin,me(Komîta Xelata Osman Sebrî ) di sala 1999 an de li Şamê damezrandiye, komîte her sê salan(Xelata Osman Sebrî) pêşkeşî dostekî gelê Kurd dike;xelata yekê,rêzdar Prof.Î.Bêşekcî wergirt, xelata duhem,xanim Daniyal Mêtran wergirt û xelata sêhem jî Prof.Munzir Elfedil wergirt.Vaye em ji sê û çar salan de li hemwelatîyekî Ereb li Sûriyê digerin, ku em vê xelata giranbuha pêşkeşî wî bikin ,lê pir mixabin em hîn wî nabînin,eger ew hebe jî, em çavênêrînê li helwestan dikin !!!!

**Pêşverû:**E.N.K.S ji miletê Kurd re daxwazek netewî bû, vêca çî dibe sedem li pêş yekîtiya helwesta Kurdî ?

**Dr. Mecîr :** Belê rast e, Encûmena Niştîmanî ya Kurd daxwazek netewî ye, lê wek têtê zanîn dabeşbûna tevgera me ji 1965an de destpêkiriye û ta niha partiyên me li Rojavayê Kurdistanê di ser bîst partiyan re ne, ev rewşa

me,ne tenê cihê mixabîniyê ye,lê belê ewa cihê şermezariyê ye, partiyên tevgera me berxwedane ku di çarçewekê de yan di du çarçewan de bighînin hev, lê ev daxwaz bi serneketiye.

Piştî şoreş li Sûriyê destpêkir,dîsan tevgera me bizava xwe kir, ku çarçeweke Kurdî giştî ava bike, lê mixabin, du çarçewên bingehîn hatin damezrandin E.N.K.S. û Encûmena Gel li Rojavayê Kurdistanê,Encûmena Niştîmanî ji 15 partiyên me û ji pir kesên serbixwe avabû, lê di rastiye de, ji roja rojê de sê sedemên bingehîn ji bo ne lihevkerinê hene.

1- Helwesta partiyên Encûmenê li hember şoreşa Sûriyê û li hember hêzên rikber ne wek hev in.

2-Şêweyên lihevkerinê bi Encûmena Gel re.

3-Tunebûna biryarên serbixwe.

Xala yekê di van çend mehên dawîn de bi hin hêzên rikber re berve çareseriyê dice,lê mixabin têkeliyên Encûmena Niştîmanî û Encûmena Gel bi hev re hîn çareser ne bûye ji ber ku piraniyên partiyên me biryarên xwe ji derveyî Rojavayê Kurdistanê werdigrin û ta niha ew nikanin bi xwe bibin xwedan biryar .

**Pêşverû:**Kolana Kurdî û birayên me di E.G.R.Kê de dibêjin:E.N.K.S laşekî mirî ye, pirsra min ew e, çima ewa laşekî mirî ye û di dema bê de çi ji Encûmenê tête xwestin.?

**Dr. Mecît :**Na! E.N.K.S hîn ne bûye laşe,ango hîn ewa ne miriye,lê ya rastir ewa pir nexweş e û dermanên vê nexweşyê ramanên hişmendî ne,serxwbûna partiyên e, hevdupejrandin e, xwerizgarkirin ji peyrewiyê ye.

**Pêşverû:**Di 29-7-2014an de sekretêrê partiya me heval Hemîd Derwîş bangewaziyek li tevgera Kurdî û Kurdistanî kir,nêrîna te li ser bangewaziya mamoste Hemîd çiyê?

**Dr.Mecît:** Belê rewşa Sûriyê bi giştî, helwestên dewletên herêmê û cîhanê,metirsiyên mezin li pêş Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê dibin sedemên giring,ku ne tenê partiyên Kurdî yan Encûmenên Kurdî hevdîtinên şewirdariyê lidarxînin,lê belê divê hemû partî û hêzên Sûriyê çi Kurd û çi Ereb bi hev re hîn pirtir û zûtir rûnin û bernameke giştî ji bo rûxandina rêjîma dîktator û azadkirina navçeyên Sûriyê ji hêzên Îslamiyên tundrew amede bikin.lewra banga rêzdar Hemîd Derwîş di cihê xwe da ye, divê hemû partiyên tevgera me bersiveke erênî bidin û şûnxistina hevdîtinê pir ziyanbar e, asteng û alozî hîn dê pirtir û diwartir bibin.

**Pêşverû:**Sûriyê bi ku ve diçe ?

**Dr.Mecît:**Eger bîrwerên Ereb û Kurd bi hev re karên hevbeş û bi awayekî azad nekin û hêzên çekdar xwe nekin yek û çarenûsa xwe bi xwe destnîşan nekin,dê Sûriyê berve perçbûn û dabeşbûnê de biçe û aramî dê nemîne...

**Pêşverû:**Rola milletê Kurd di Sûriya pêşerojê de çiyê ?

**Dr.Mecît:**Rola miletê Kurd berê jî û niha jî li Sûriyê erênî ye, gelê me di pêşeroja Sûriyê de, dê roleke erênî li rex gelê Ereb û hêzên dêmokrat û pêşverû bilîze.

**Pêşverû :**Tu rola dîplomasiya Kurdî çawa dibînî?

**Dr. Mecît :**Rola dîplomasiya Kurd di vê demê de pir baş e, Kurd, ango nûnerên gelê me li Sûriyê di vê demê de rolên erênî di nav dewletên cîhanî de dilîzin, ew li civat û kongirên navdewletî de beşdar dibin û doza Kurdî dîsan di nav qada navnetewî de geş dibe.

**Pêşverû:Tu çawa** li dewleta Kurdî ya serbixwe dinêrî?

**Dr. Mecît:**Bê gûman her miletek dixwaze dewleteke xwe serbixwe hebe.....,lê bi ya min be,mercên dewletek Kurdî serbixwe hîn pir kerik in,lewre ya baştir em niha bi fêderaliya Kurdan bi gelên cîran Tirk-Faris û Ereb re bigirin,lê dîsan her beşek ji Kurdistanê taybetmendiyek xwe heye,her perçek divê li gor rewşa xwe,biryara xwe bistîne.

**Pêşverû:** Gelek rewşenbîr hene, xebatkarên kevin hene, tu wek rewşenbîrekî Kurd bi nêrîna te,çima rewşenbîrên me dûrî tevgera rêzanî ya Kurdî dimînin?

**Dr.Mecît:**Eger ez vekirî bibêjim,sê sedemên bingehîn hene:

1- Hin rêber û pêşengên me yên siyasî pir çavtengiyan li rewşenbîrên me yên siyasî dikin,lewre jî pir rewşenbîr dilsar dibin.

2 Mixabin, gelek rewşenbîr jî hene, xwe di ser partiyan re dibînin, ew li mala xwe rûdinin û bîrdoziyên siyasî ji xwe re dibêjin, ji xwe re distirên û bi xwe jî guhdarî xwe dikin. Lewra ew nikanin rolên erênî di berxwedanê de bilîzin, ew welatparêzên qels in, û vîna wan di têkoşîna welatparêziyê de jar e.

3-Hin ronakbîrên Kurd keysebaz in, ew pirtir ziyane dighînin tevgera azadîxwaza Kurd.

**Pêşverû** :Dr. Dûrî siyasetê, partî û Encûmenên Kurdî li hev dikin û li hev nakin, ka jiyana te ya wêjeyî çawa bû, kengîbû û ji ku de destpêkir ?

**Dr.Mecît:** Berî ku ez wêja Kurdî nas bikim, ez bi xwe fêrî zimanê Kurdî bûm, min ji sala 1976an de li Berlîna Rojava ji xwe re kir meraq ku ez rojnameyan, daxuyaniyan bi Kurdî bixwînim, piştî wê min hemû dîwanên Cegerxwîn xwendin hêdî, hêdî ez jî mîna pir kesan, ketim bin bandora helbestên Cegerxwîn û paşê min berhemên Ehmedê Xanî ,Feqiyê Teyran,Ebdela Goran, Erebe Şemo û h.w.d xwendin.Helbesta min ya yekê di sala 1980 de hat weşandin, lê mixabin karên rêxistinî ne dihêşt ku ez herdem bi wêjeyê re heval bim, ji ber wê jî, ta roja îro dîwanek min tenê bi navê(Bi xwedêkê medêgirî) heye, helbestên wê di rojname û kovarên Kurdî de di bin navên ne rast de hatine weşandin. Ev berhevoka li ser riya çapê ye.Di ber wê re ez çîrokên jî dinivîsînim, niha berhevekek min ji çîrokên amede ye,ew jî wek çîrok di Enitirnetê, û kovaran de hatine weşandin, ev pirtûka jî ji bo çapê amede ye.Ji bilî van jî, (Serpêhatiyek) bi navê

(Dra zeytûnê dipeyive û çemê Efrînê dişewite) niha ez li ser serpêhatiyêke dirêj mijûl dibim, navê wê niha (Penaber e). Herwiha jî ez yek ji damezrênerê mîhrecana helbesta Kurdî li Sûriyê bûm, di rastiye de, ez xwediyê pêşniyara lidarxistina mîhrecana helbesta Kurdî bûm, lewra jî ez di mîhrecana helbesta Kurdî de, di sala 2008 an li Almaniya hatim xelatkirin..

**Pêşverû:** Dr. gelek berhemên te hene, li ser wêje hene, li ser lêkolînê hene, berhemên te yên çapkirî çi ne ?

**Dr.Mecît:**Berhema min ya yekê, nama min ya Diktora ye,ewa bi zimanê Rûsî ye, navnîşana wê(Rola Kovara Dengê Komkar di bizava azadîxwaza Kurdistanê de ye) ev ne hatiye wergerandin,yên din (Dîroka lêgerîna zimanê Kurdî û zaravên wê) ya Prof.Q. Kurdo ye,û ya din (Bi kurtî dîroka wêja Kurdî ya hevdem) ya Dr. Meruf Xeznedar e,min ev herdu ji zimanê Rusî wergerandine ser zimanê Erebi,ya yekê di 1991 ê de, û ya duhem di sala 1993 an de hatine weşandin,herwea jî min pirtûkek din bi navnîşana ( Gurzek helbestên Kurdî yên nûjen ) ji zimanê Kurdî wergerandiyê zimanê Erebi û ewa di sala 1994 an de hatiye weşandin,dîsan min pirtûkek(lêkolînek)bi navnîşana(Kovara Çiya awêna çanda Kurdî li Ewropa 1965-1970) di 2003 an de li Almaniya weşandiyê.

**Pêşverû :** pirtûkên te yên li ser rêya çapê çi ne?

**Dr.Mecît:**Niha min berhemên xwe,lêkolîn, gotarên siyasî û wêjeyî di hindir çend pirtûkan de amede kirine. 1-Gotar û lêkolîn –2-peyv û helwest 3–Gelê Kurd li Rojavayê

Kurdistanê, (Dîrok, Rêxistin , siyaset) , bi gelemperî pêwendiyên Kurdî û Erebi di dîrokê de.– 4-Berhem .5- Gurzek gotar.6- lêkolîn û hevpeyvîn.7-Stranên Kurdî.

**Pêşverû:** Xweştirîn roj di jiyana te ya siyasî û kesane de çi bû?

**Dr.Mecît:** Roja ku min xwe naskir, ez Kurd im.

**Pêşverû:**Di jiyana te de, tiştê herî zêde ku tu lê poşmam bûyî çi ye?

Dr.Mecît:

Bi rastî ez li hin tiştan poşmam bûme,1- Du rêxistinên Kurdî ji partiyên xwe veqetîn û dixwastin bi serên xwe kar bikin ,ez jî di wan herduyan de bûm endam,ez ta niha li xwe poşmam bûme,ez bi xwe re dibêjim:Xwaziya min bi wan rêxistinan re tu gav navêtina, li dewsa wê, diviya bû,min helwesteke erênî ji bo pêşxistin û parastina yekitiya partiyên bigirta.Di vê sebarete de,ez bang li siyasetmedarên welatparêz dikim ku ew di nav partiyên xwe de şaşiyên siyasî û rêxistinî serast bikin û rolên erênî ji bo yekitiya tevgera Kurdî bilîzin û eger ew ji tevgera xwe re nikanin bibin gul, lê bila ew mîna pir kesan nebin istrî. 2- Ez ya duhem newêrim bêjim.3 -Çuyina min, cara duhem li Almaniya.

**Pêşverû :** Piştî ev geşta jiyanê ya dirêj,

gelo xewn û hêviyên Dr.Edilmecît Şêxo çi ne?

**Dr. Mecît:**Hêviya min berî mirinê ev e:ku partî û rêxistinên tevgera me li çar beşên Kurdistanê lihev bikin. .

**Pêşverû:** Gotina te ya dawiyê ji xwendevanên rojnameya pêşverû re çi ye ?

**Dr.Mecît:**Xweziya pirsê te wiha bûya;ji xwendevanên weşanên Kurdî re û ne tenê ji rojname Pêşverû re. Rêzgirtin ji hemuyan re,bê guman weşanên Kurdî bi hev re roleke mezin di pêşketina çand, siyaset û wêjeya Kurdî de dilîzin. Hêviya min ji xwendevanan ew e, ku ew pirtir bala xwe bidin zimanê Kurdî û hêviya min ji xortên me ev e, ku ew zimanê xwe yê Kurdî xurt bikin û bi zimanê Kurdî jî binivîsînin û weşnên xwe bi zimanê Kurdî pêşxînin.

**Pêşverû:**Tu sax bî û ji ber vê yekê me jî li ser rojnameya xwe nivîsiye hezkirina zimên ji hezkirina welêt e, gelek spas ji bo agahiyan Dr. Ebdilmecît Şêxo û bi hêviya jîneke serkeftî û temenekî dirêj ji bo te û tu her bijî di evîna gelê xwe de.

**Dr . Mecît :** Spas û serkeftin ji karên we re.

Çavkanî:Rojname Pêşverû bi zimanê Kurdî û Erebi,hejmar,21.sal.2014.

## **Ji berhemên nivîskar**

1-Rola kovara (Dengê Komakar di tevgera azadîxwaza Kurdistanê de) ,nama Doktoriyê ,1988,Lênîngrada berê ,bi zimanê Rusî.

2- Bi kurtî dîroka lêgerîna ziman û zaravên Kurdî.Prof:Qenatê Kurdo,bi zimanê Rusî ,weger bi zimanê Erebî 1991.Sûriyê.

3-(Bi Kurtî dîroka wêja Kurdî ya hevdem)Dr.Merof Xeznedarbi zimanê Rusî,weger bi zimanê Erebî 1993,Sûriyê.

4-Gurzek ji helbestên Kurdî yên hevdem bi zimanê Kurdî,weger bi zimanê Erebî,1995,Sûriyê.

5-Kovara( Çiya )1965-1970 awêna çanda Kurdî li Ewropa bi zimanê Kurdî, lêkolîn , 2004, Almaniya.

6-Gotar û lêgerînên Kurdî (1999-2004) bi zimanê Erebî 2011,Sûriyê.

7-Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê(Dîrok, rêxistin ,siyaset , û bi gelemperî pêwendiyên Kurdî û Erebî di dîrokê de ) bi zimanê Kurdî(lêkolîn), 2014 ,Sûriyê.

8-Dara Zeytunê dipeyive ... ,û çemê Efrînê di ber re dişewite ,bi zimanê

Kurdî(Serpêhatiyek)2008,Almaniya .

9-Gurzek gotar(1980-1988),bi zimanê

Kurdî,2011,Sûriyê.

10-Stranên Kurdî ji amedekirina J.Museliyan bi

zimanê Kurdî,tîpên Erebi,Lênîngrada berê ,guhaztin bi tîpên Latîni,2011,Sûriyê.

11-Tu bi xwedêkê medîgrî(Helbest)1980-2011,bi

zimanê Kurdî,2011,Sûriyê.

12-Lêkolîn û hevpeyvîn bi zimanê Kurdî ,2011,Sûriyê.

13-(Berhem) bi zimanê Kurdî,2011,Sûriyê.

14-Peyv û helwest bi zimanê Kurdî,2014,Sûriyê

15-Çîrok bi zimanê Kurdî,2015,Sûriyê.

16-Dewletên Ewropî û Kurdistan, bi zimanê Kurdî,  
Kemal Henan,werger bi zimanê Erebi .2015 Sûriyê.

## Naverok

- 1-28 çepkegul li sergorna nemir M.M.Berzanî bin.
- 2-Armanca Turkiyê niha ne PKK ye, lê rûxandina hukumeta herêma Kurdistanê ye.
- 3-Bi giştî siyaseta Turkiyê ya derve . (Kurtelêkolîn)
- 4-Berêz Muhsin Ciwanmêr dixwaze bi navê serokê nemir M. M. Berzanî bi hestên netewî yên kurmançaxêvan blîze.
- 5-Çend gotin li ser( Eniya Rizgariya Niştimanî).
- 6-çirûskek ronahî li ser kongir û konfiransên penaberên Rojavayê Kurdistanê.
- 7- Dabeşbûna tevgera me li Rojavayê Kurdistanê bi destên me bû, lê hêzkirina bizava me jî bi destên me ye.
- 8-Dêموکراتiya dewletên sermiyandar zamdar e.
- 9-Destlatiya Sûriyê ji dilreşiya xwe danagere.
- 10-Ezdahî Kurdistanperest in û qehreman in .
- 11-Ezbenî M.Ciwanmêr! Bi dara zorê zimanê Kurdî nabe yek!
- 12-Gurên bersorî hûn çi dikin?
- 13-Jina Kurd di pêvajoka dîrokê de.( Lêkolîn).
- 14-Kek Edîb silavên min ji hemû pakrewanan re hene.
- 15-Leyla Zana ! Xwaziya tu xûşka min ji dê û bavê bûya !
- 16-Na !Na! Mamoste Berzo Mehmud çanda kurdî bi zimanê Kurmancî jî heye.
- 17-Nivîskar Ferhad Şaklî dîsan hêrişan dibe ser Berzaniyan.
- 18-Rapora Bêkir û Hamilton ne tenê li dijî gelê Kurd e, lê ewa li dijî bayê dêmokratiyê li Rojhilatanavîn e.
- 19-Roviyên kîndar nayên gazinkirin.
- 20-Serxweşiyek vekirî ji malbeta apê Adîk û glê Kurd re.
- 21-Têkoşîna nîvsedsalî li Rojavayê Kurdistanê pîroz be !
- 22-Turkiyê û Partiya Îxwan elmuslîmîn.....
- 23-Hevpeyvîn bi nivîskarê vê (Berhemê) re.